



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Masterê

**KURTEFÎLM WEKÎ CIH Î AMÛRÊ
BIKARANÎNA ZIMANÊ KURDÎ**

EKREM YILDIZ

16711022

Şêwirmend

Dr. YILMAZ ÖZDİL

Mêrdîn 2019



K.T.

Zanîngeha Mardîn Artukluyê

Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê

Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî

Teza Masterê

**KURTEFÎLM WEKÎ CIH Î AMÛRÊ
BIKARANÎNA ZIMANÊ KURDÎ**

EKREM YILDIZ

16711022

Şêwirmend

Dr. YILMAZ ÖZDİL

Mêrdîn 2019

Bo her du cefakêşên vê serzemîna bêdad û berbad,

babê min Nevrûz û dayîka min Besnayê



TAAHHÜTNAME

TÜRKİYE’DE YAŞAYAN DİLLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Mardin Artuklu Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum *Kurtefilm Wekî Cih û Amûrê Bikaranîna Zimanê Kurdî* adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi ve tez yazım kılavuzuna uygun olarak hazırladığımı taahhüt eder, tezimin/projemimin kağıt ve elektronik kopyalarının Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım. Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

- Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.
- Tezim sadece Mardin Artuklu Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.
- Tezimin ... yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

17/12/2019

Ekrem YILDIZ

KABUL VE ONAY


Ekrem Yıldız tarafından hazırlanan *Kurtefilm Wekî Cih û Amurê Bikaranîna Zimanê Kurdî* adındaki çalışma, 31 /12 /2019 tarihinde yapılan savunma sınavı sonucunda jürimiz tarafından Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalında **YÜKSEK LİSANS TEZİ** olarak oybirliği/oyçokluğu ile kabul edilmiştir.

İmza

Başkan: Doç. Dr. Ayhan Tek



ÜYE: Dr. Öğretim Üyesi Shahab VALİ



ÜYE: Dr. Öğretim Üyesi Yılmaz Özdil



SPASDARÎ

Hem serhatiya min a li Mêrdînê hem jî nivîsîna vê xebatê bûne wesîleya nasîna min a gelek dost û heval û mamosteyên qedirgiran ku pê keyfxweş im bi niyeta spasiyê navên wan bînim. Bêguman ew şîrikên vê xebatê ne. Di dewra xwendina min a lîsans û masterê da keda gelek mamosteyên Beşa Ziman û Edebiyata Kurdî li ser min çêbû, mala hemûyan ava be yek bi yek.

Di serî da min divê spasiyeka taybet li mamosteyê xwe Yılmaz Özdil bikim. Hem bi dersên xwe hem jî bi şêwirmendiya xwe bû wesîleya nasîna min a vê qadê û di her kêliya vê xebatê da bû alîkarê min. Ew nebûya bêguman ev xebat nediçû serî, minnetdarê wî û keda wî me. Hem di serdema lîsansê da hem jî ya masterê da mamosteyê min Shahab Valî ‘ilmên qedîm nîşa min dan, mala wî hezar car ava. Ayhan Tek ku bi rexne û pêşniyazên xwe hewl da ev xebat kamiltir bibe û serê xwe pê ve gelek êşand, mala wî sed caran ava be.

Cumhur Ölmez hem bi hevaltiya xwe ya bi salan hem jî di qonaxa zor û zehmet ya vê xebatê da wekî dost û birayekî qenc her dem li ber milê min bû û çend caran ev xebat xwend, mala wî ava. Hevalbendê rojên teng Şehmuz Kurt bi pêşniyazên xwe ev xebat şeklen kamiltir kir, Ergin Öpengin, Erol Şaybak û Betül Çobanê bi teşwîqên xwe ez motive kirim, mala wan ava. Spas bo Tehsîn Baravî, Vahab Eroğlu û Fatih Duman ku di peydakirina çavkaniyan da bûne alîkar. Spas bo Selim Yıldız, Selami Esen, Mensube Kartal, Mem Artemêt, Emine Birer, Havin Kiye, Serdar Canan, İrfan Yanar, Salih Tanrıverdi, Kübra Özek Bavli, Fırat Bavli, Sabih Özer, Abdullah İş, Receb Öpengin û Hêvî Çinarê ku di vê qonaxê da min hebûna wan jidil hîs kir. Helbet min divê spasiyê li Elif Yoltay Tarduş, İbrahim Tarduş, Setare Sarrafi, Lavîn Vali, Aysun Canan Özdil, Sevda Orak Reşitoğlu û Hamdullah Reşitoğlu bikim ku wan ji malbata xwe ya li Mêrdînê dihesibînim.

Spas bo hemû agahîder/derhêneran, bi taybet Aram Dildar û Bilal Korkut, ku di temambûna vê xebatê da bûne alîkar û filmên xwe li gel min parve kirin.

Herî dawî min divê spasiyeka taybet bo hemû malbata xwe -bi taybet bo dayîka xwe û babê xwe- bikim ku bi sebr û mêhrebaniyê bi salan e tehemmula xwendekariya min dikin.

KURTE

Di destpêka salên 1990î da rabûna qedexeyên qanûnî yên li pêşiya zimanê kurdî li Tirkîyeyê, rê vekir ku di van bîst salên dawî da zimanê kurdî wekî zimanê hunerê berbelav bibe. Ji destpêka salên 2000î heta îro di filmên hindêk derhênerên tirk û derhênerên kurd da, kurdî wekî zimanê yekem yan jî zimanê duyem hatiye bikaranîn. Her çiqas berî salên 2000î zimanê kurdî di çend filmên tirkî da hatibe bikaranîn jî, ji ber şert û mercên polîtîk, bi taybet piştî salên 2000î, filmên kurdîziman zêde bûne. Ji ber hindê di sînemaya tirkî û filmên derhênerên kurd yên li Tirkîyeyê da, şêwazên bikaranîna kurdî û proseya dîrokê ya vê babetê hêjayî lêkolînê ye.

Em di vê lêkolînê da bi perspektîfeka sosyo-polîtîk û tarîxî kurtefilmên kurdîziman yên li Tirkîyeyê hatine berhemînan analîz dikin û hewl didin ku bersiva pirsên jêrîn bidin: A) Di kurtefilmên kurdîziman da motîvasyona derhênerên kurd ya bikaranîna zimanê kurdî çi ye? B) Di wan kurtefilman da, di navbera derhênerên kurd û zimanê wan yê zikmakî da bi çi şêwaz û motîvasyonê peywendî durist dibe? C) Sînema wekî amûrekî ragihandinê dikare li ser berbelavbûna zimanê kurdî çi karîgeriyê bike?

Lêkolîna me ji sê beşan pêk tê. Di beşa yekem da me cih daye karîgeriya siyasetê li ser sînemayê li Tirkîyeyê. Me di çarçoveya lêkolîna xwe da bi armanca berhevkirina daneyan pirsyarnameyek sepan ku em di beşa duyem da behsa metodolojîya wê û awayê berhevkirina daneyan dikin. Di beşa sêyem da jî tehlîla encamên vê pirsyarnameyê tete kirin.

Peyvên Sereke: *Sînema, kurtefilm, zimanê kurdî, sosyo-polîtîk, tarîxî*

ÖZET

Türkiye’de 1990’lı yılların başında Kürt Dili önündeki yasal engellerin ortadan kalkması bu dilin son yirmi yılda sanatsal bir dil olarak yaygınlaşmasının önünü açmıştır. 2000’li yılların başından günümüze kadar bazı Türk ve Kürt yönetmenlerinin filmlerinde Kürtçe birincil ya da ikincil dil olarak kullanılmıştır. Her ne kadar 2000’li yılların öncesinde Kürtçe birkaç filmde kullanılmış olsa da, sosyo-politik şartlara bağlı olarak, özellikle 2000’li yıllardan sonra Kürtçe yapılan filmler artmıştır. Özellikle Türk Sineması ve Türkiye’deki Kürt yönetmenlerinin filmlerinde, Kürtçe’nin kullanılma biçimi ve konunun tarihsel seyri araştırılmaya değerdir.

Bu çalışmamızda tarihi, sosyo-politik bir perspektif ile Türkiye’deki Kürtçe kısa filmleri analiz edip aşağıdaki sorulara cevap bulmaya çalıştık: A) Kürt yönetmenlerinin Kürtçe kısa filmlerde Kürtçe’yi kullanma motivasyonu nedir? B) Söz konusu kısa filmlerde Kürt yönetmenler ile anadilleri arasındaki ilişki hangi yöntem ve motivasyon ile kurulmaktadır? C) Bir iletişim aygıtı olarak sinema Kürt Dili’nin yaygınlaşmasında nasıl bir rol üstlenmektedir?

Çalışmamız üç bölümden oluşmaktadır. Birinci bölümde, Türkiye’deki sinema üzerinde siyasetin etkisine yer vermekteyiz. Çalışmamız çerçevesinde gerekli verileri elde etmek amacıyla bir anket hazırladık ve ikinci bölümde söz konusu anketin metodu ve veri toplama yönteminden bahsettik. Üçüncü bölümde ise bu anketin sonuçlarının analizi yer almaktadır.

Anahtar sözcükler: *Sinema, kısa film, Kürtçe, sosyo-politik, tarihsel*

ABSTRACT

The lift of legal obstacles on Kurdish language in 1990s in Turkey has led Kurdish to be spread as a language of art in the last twenty years. Since the early 2000s, Kurdish language has been used as primary or secondary language in films of certain Turkish and Kurdish film makers. Although Kurdish was used in several films before 2000s, Kurdish films has increased especially after the 2000s depending on socio-political conditions. Hence it is worth to conduct researches on using Kurdish as well as on the historical process of this topic in Turkish cinema and in films by Kurdish film directors in Turkey

In this research we have tried to analyze short films in Kurdish made in Turkey from a socio-political and historical perspective and tried to answer the questions given below: A) What is the motivation of Kurdish film directors to use Kurdish language in Kurdish short films? B) In these short films, what is the method and motivation of establishing the relationship between Kurdish film directors and their mother tongue? C) What role does cinema play as a means of communication in the spread of Kurdish language?

This research consists of three parts. In the first part we give place to the influence of politics on cinema in Turkey. In the context of our study, we have conducted a questionnaire for data collection and in the second part we give information on survey method and collection method. In the third part, the analysis of the results of this survey is given.

Key Words: *Cinema, Short Film, Kurdish Language, Socio-politics, Historical*

NAVEROK

TAAHHÛTNAME	II
KABUL VE ONAY	III
SPASDARÎ	IV
KURTE	V
ÖZET	VI
ABSTRACT	VII
NAVEROK	VIII
LÎSTEYA GRAFÎKAN	XI
LÎSTEYA WÊNEVAN	XII
KURTEBÊJE	XIII
DESTPÊK	14
1. Problematîk.....	16
2. Metodolojiya Lêkolînê	16
3. Çarçoveya Teorîk	17
4. Armanc û Girîngiya Lêkolînê.....	19
5. Astengî û Rîskên Lêkolînê	19
6. Lîteratûr û Termînolojî	20
7. Cûreyên Çavkaniyan.....	21
BEŞA YEKEM: KARÎGERIYA SIYASETÊ LI SER SÎNEMAYÊ LI TIRKIYÊYÊ ...	23
1.1. Polîtîkayên Zimanî li Tirkiyeyê.....	23
1.1.1. Qedexkirina Kurdî: 1924-1991	24
1.1.2. Xuyabûna Zimanê Kurdî li Qadên Civakî Piştî Salên 1990î	28
1.2. Ziman Wekî Nîşaneyê Nasnameyî di Sînemaya Tirkî da.....	31
1.2.1. Beriya Salên 1990î Xuyabûna Zimanê Kurdî di Sînemaya Tirkî da	34
1.2.2. Destnîşankirina Karekterên Kurd bi Rêya <i>Aksana</i> Tirkî.....	43
1.3. Tarîxçeya Kurtefilman li Tirkiyeyê.....	48

1.3.1. Tarîxçeya Kurtefilmên Tirkî	49
1.3.2. Tarîxçeya Kurtefilmên Kurdî.....	52
1.4. Peydabûna Sînemaya Kurdî li Tirkîyeyê.....	60
1.4.1. Mînaqêşeyên Ontolojîk Derbarê Sînemaya Kurdî da	65
1.4.2. Rola Zimanê Kurdî di Pênasekirina Sînemaya Kurdî da	67
1.4.3. Zimanê Kurdî Wekî Objeya Sansûrê	69
BEŞA DUYEM: METODOLOJÎ Û BERHEVKIRINA DANÉYAN.....	71
2.1. Pêşkêşiya Pirsyarnamêyê.....	71
2.1.1. Çarçoveya Pirsyarnamêyê.....	71
2.1.2. Diyarkirin û Hilbijartina Koma Lêkolînê	72
2.2. Awayê Berhevkirina Daneyan.....	72
2.2.1. Dariştina Pirsyarnamêyê	72
2.2.2. Proseya Berhevkirina Daneyan.....	73
2.2.3. Amûrê Berhevkirina Daneyan	73
BEŞA SÊYEM: TEHLÎLA DANÉYÊN PIRSYARNAMEYÊ	75
3.1. Kategorîzasyona Peywendiyên Agahîderan ligel Zimanê Dayîkê	75
3.1.1. Li Gorî Zayendê	77
3.1.2. Li Gorî Perwerdeya Sînemayê	80
3.1.3. Li Gorî Rêjeya Bikaranîna Zimanî	82
3.2. Sebebên Bikaranîna Zimanê Kurdî di Kurtefilman da	83
3.2.1. Rola Zimanê Kurdî di Beşdarbûna Festîvalan da	83
3.2.2. Rola Zimanê Kurdî di Wergirtina Xelatan da.....	85
3.2.3. Ziman Wekî Sebebê Sansûrêkirina Kurtefilmên Kurdî.....	86
3.2.4. Rola Zimanê Kurdî di Fînansekirina Kurtefilman da	89
3.3. Kurtefilm Wekî Cihê Peywendîya ligel Zimanê Zikmakî.....	91
3.3.1. Motîvasyona Bikaranîna Zimanê Kurdî ya Agahîderan	91
3.3.2. Peywendîya Agahîderan li gel Edebiyata Kurdî.....	93
3.3.3. Ji Senaryonivîsînê Heta Postproduksiyonê Bikaranîna Zimanê Kurdî.....	95
3.4. Analîza Tematîk ya Kurtefilmên Nimûne	101
3.4.1. Hevsengîya Ziman û Babeta Fîlman.....	101

3.4.2. Hevsengiya Diyalogên Kurdî û Jêrenivîsên Zimanên Biyanî.....	102
3.4.3. Bikaranîna Zimanê Kurdî Wekî Elementeka Folklorî.....	105
3.4.4. Bikaranîna Zimanê Kurdî Wekî Nîşaneyê Aîdiyeteka Polîtîk.....	106
ENCAM.....	108
PÊVEK.....	112
FÎLMOGRAFI 	133
ÇAVKANÎ.....	139



LÎSTEYA GRAFÎKAN

Grafîk 1: <i>Hejmara kurtefilmên kurdî di navbera salên 1999-2018an da.</i>	56
Grafîk 2: <i>Herî zêde sînemaya kîjan derhênerê/a kurd li ser te tesîr kiriye (bi %)</i>	62
Grafîk 3: <i>Zimanê dayîkê yê agahîderan (bi %)</i>	75
Grafîk 4: <i>Şîyanên zimanê kurdî yê agahîderan (bi %)</i>	76
Grafîk 5: <i>Zayenda agahîderan (bi %)</i>	78
Grafîk 6: <i>Li gorî zayenda agahîderan zimanên kurtefilman (bi %)</i>	79
Grafîk 7: <i>Li gorî perwerdeya sînemayê ya agahîderan bikaranîna zimanan (bi %)</i>	81
Grafîk 8: <i>Rêjaya bikaranîna zimanan di kurtefilman da (bi %)</i>	82
Grafîk 9: <i>Rola zimanê kurdî li ser beşdarbûna festîvalên filman (bi %)</i>	84
Grafîk 10: <i>Rola zimanê kurdî li ser wergirtina xelatan (bi %)</i>	86
Grafîk 11: <i>Zimanê kurdî wekî sebebê sansûrkirina filmên kurdî (bi %)</i>	87
Grafîk 12: <i>Peywendiya ziman û fînansekirina kurtefilman (bi %)</i>	90
Grafîk 13: <i>Motîvasyonên bikaranîna zimanê kurdî (bi %)</i>	92
Grafîk 14: <i>Tesîra edebiyata kurdî li ser agahîderan (bi %)</i>	94
Grafîk 15: <i>Li gorî zimanan senaryonivîsîna agahîderan (bi %)</i>	96
Grafîk 16: <i>Rexneyên bîneran li zimanê filmên agahîderan (bi %)</i>	97
Grafîk 17: <i>Rêjeya agahîderan ya xwestina alîkariyê ji pisporekî zimanê kurdî (bi %)</i>	98
Grafîk 18: <i>Zimanên muzîkên filmên agahîderan (bi %)</i>	99
Grafîk 19: <i>Li ser meydîyaya civakî tercîhên agahîderan yê ziman ji bo danasîna kurtefilman (bi %)</i>	100

LÎSTEYA WÊNEYAN

Wêne 1: Sehneyek ji filma <i>Seyyit Han: Toprağın Gelini</i> ya Yılmaz Güney	36
Wêne 2: Sehneyek ji filma <i>Hazal</i> ya Ali Özgentürk	38
Wêne 3: Sehneyek ji filma <i>Sürü</i> ya Yılmaz Güney	40
Wêne 4: Sehneyek ji filma <i>Yol</i> ya Yılmaz Güney	42
Wêne 5: Sehneyek ji filma <i>Kibar Feyzo</i> ya Atıf Yılmaz	45
Wêne 6: Sehneyek ji filma <i>Katırcılar</i> Şerif Gören	46
Wêne 7: Sehneyek ji filma <i>Eşkıya</i> ya Yavuz Turgul	48
Wêne 8: Sehneyek ji filma <i>Ax</i> ya Kazım Öz	55
Wêne 9: Sehneyek ji filma <i>Bêdeng</i> ya Rezan Yeşilbaş	58

KURTEBÊJE

bnr. : binêre

dnd . : di nav da

c. : cild

îng. : îngilîzî

t. d. : tarîxa dîtinê

r. : rûpel

tr. : tirkî

weş. : weşan

wer. : wergêr

DESTPÊK

Piştî belavbûna Împaratoriya Osmanî, wekî mîratgirê vê împaratoriye Komara Tirkiyeyê, ji avabûnê heta destpêka salên 1990î, gotara xwe ya resmî û polîtîkayên xwe yê derbarê kurdan da bi awayekî giştî li ser nebûna kurdan û qedexekirina çand û zimanê kurdî ava kir. Dewletê, ev siyaseta xwe ya li dijî kurdan nêzikî heftê salan ne tenê bi awayekî qanûnî her wisa bi rêya dezgehên çandî – dewletî yan jî sivil- jî berdewam kir. Lê belê, di destpêka salên 1990î da peydabûna faktorên nû yê wekî guherîna şewazên siyaseta kurdan, daxilbûna parlemanterên kurd li meclisê, berendamiya Tirkiyeyê bo ewrûpayê hwd. bûne wesîleya sistkirina polîtîkayên asîmîlasyon û rêvekirina qismî ya li ber mafên zimanî û çandî li Tirkiyeyê. Wekî netîceya vê pêvajoyê, di sala 1991ê da bi fesihkirina xalên derbarê qedexeya zimanê kurdî yê makeqanûna 1982yan, yanê qedexeya li ser weşan û her cure berhemînanan bi zimanê kurdî hate rakirin (Çiçek, 2013).¹ Piştî rakirina qedexeyên li ser weşana zimanê kurdî, bi taybet piştî sala 1995an di warê edebiyat, muzîk û sînemayê da berhemînanan bi zimanê kurdî hêdî hêdî dest pê kir. Berhemîna sînemayê ya bi zimanê kurdî jî yek ji wan qadên hunerî ye ku gelek di bin tesîra van polîtîkayên çandî û zimanî da maye. Ji ber hindê jî, herçiqas beriya salên 1990î qedexe li ser zimanê kurdî hebe jî em di çend filmên tirkî yê wekî *Seyyit Han* (1968), *Sürü* (1978), *Yol* (1982) yê Yılmaz Güney (1937-1984) û di filma *Hazal* (1979) ya Ali Özgentürk da qismen rastî bikaranîna kurdî tîn. Herwiha, di navbera salên 1990î û 2000î da di filmên wekî *Işıklar Sönmesin* (Reis Çelik, 1996), *Güneşe Yolculuk* (Yeşim Ustaoglu, 1999), *Büyük Adam Küçük Aşk* (Handan İpekçi, 2001) û *Büyü* (Orhan Oğuz, 2001) da jî em rastî bikaranîna zimanê kurdî tîn.

Di heman demê da li Îran, Kurdistana Iraqê û li dîasporayê jî berhemînanan filmên kurdîziman zêde dibe. Di sala 2001ê da Bahman Ghobadi bi yekem filma xwe ya dirêj *Dema Hespên Serxweş*, li Festîvala Fîlman ya Cannesê Xelata Kameraya Zêrîn wergirt û vê yekê di xuyabûn û nasîna sînemaya kurdî da roleka gelek muhim gêra. Ghobadi, piştî *Dema Hespên Serxweş*, çendîn filmên din jî berhem înan ku li gelek festîvalan xelat wergirtin. Piştî vê serkeftina Bahman Ghobadi, li Kurdistana Îranê derhênerên kurd yê wekî Shirin Jahani, Ebrahim Saeedi, Jamil Rostemi, Fariborz Kamkari û Rahim Zabihî filmên xwe yê dirêj berhem înan.

¹. Tercûmeyaya kurdî ya referans û bergirtinên bi zimanên din, ji aliyê me ve hatine kirin.

Li Kurdistana Iraqê jî di heman demê da hewldanên avakirina saziyên sînemayê yên wekî miduriyeta sînemayê zêde dibin û xebatên sînemayê dest pê dikin. Gelek derhênerên ku li dîasporayê dijîn, vedigerin Kurdistana Iraqê û dest bi karên sînemayê dikin. Bo nimûne, Mehdi Umed piştî vegera xwe bi yarmetiya Hikûmeta Kurdistanê, di sala 2003yan da filma xwe ya dirêj ya bi navê *Rewa Jinoke/Nêçîra Cinan* berhem îna. Herwisa Jano Rosebiani filma *Jiyan* (2002), Ravin Asaf filma *Rojên Zer* (2003) berhem înan. Dîsa, Şewket Emin Korki *Perrînewe Le Xubar* (2006) Hussein Hasan û Mesud Arif filma *Û Nêrgiz Bişkivîn* (2006) berhem înan (Aktaş, 2017: 60-2).

Ji aliyê din ve, hêj di destpêka salên 1990î da hunermendên kurd dikevin nav hewla berhemînana filmên kurdî. Di sala 1991ê da Hiner Saleem ku yek ji derhênerên kurd yê nasraw e, ji Îtalyayê vedigere Kurdistana Iraqê û tekane kurtefilma xwe ya bi navê *Kuncê Sinorî (Eon Bout Frontiere)* û salek paşê Nizamettin Ariç filma *Klamek ji bo Beko* (1992) berhem înan. Li Fransayê Hiner Saleem filmên wekî *Bijî Bûk... Û Azadiya Kurdistanê* (1998), *Vodka Lemon* (2003), *Kilometre Zero* (2005), *Dol* (2007) û *My Sweet Papper Land* (2013) û Kudret Güneş filma *Gece Yolculuğu*; li Amerîkayê Jalal Janroy filma *David û Leyla* (2005); li Swîsreyê Mano Khalil belgefilmên *Tanrı'nın Uyuduğu Yer, Al Anfal* û *Davidê Tolhildan*; li Norwecê Hisham Zaman filmên *Bawke* (2005), *Winterland* (2007), *Before Snowfall* (2013) û *Letter to the King* (2014) û li Almanyayê Soleen Yusef filma *Mala Bêban* (2016) berhem înan (Aktaş, 2017: 64). Dîsa, Mehmet Aktaş (Mîtos film) wekî produktorekî mezin yê sînemaya kurdî li Almanyayê, di berhemînana û belavkirina filmên kurdî da xwedî roleka girîng e.

Li Tirkîyeyê, bi nisbet nimûneyên ku me li jorê behsê kirî, filmên kurdîziman gelek dereng dest pê dikin û piştî salên 2010an zêde dibin. Yekem berhemên sînemaya kurdî li Tirkîyeyê, Kazım Öz berhem înan. Kazım Öz Ax (1999) *Fotograf* (2001), *Bahoz* (2008), *Zer* (2017), Hüseyin Karabey *Gitmek: Benim Marlon ve Brandom* (2008), Orhan Eskiköy û Özgür Doğan *Dengê Bavê Min* (2012), Erol Mintaş *Klama Dayîka Min* (2014), Ali Kemal Çınar *Kurtefilm* (2013), *Veşartî* (2015), *Gêncö* (2017) *Di Navberê de* (2018), Ender Özkahraman *Biryareke Zor* (2017) û Mehmet Ali Konar *Hewno Bêreng* (2018) filmên kurdî ne ku di dehsaleya borî da li Tirkîyeyê hatine berhemînana.

1. Problematîk

Di destpêka salên 2000î da, hem zêdebûna filmên kurdîziman û hem jî xelatkirina filmên derhênerên wekî Bahman Ghobadi û Hiner Saleem li festîvalên mezin yê cîhanê derwazeyeka nû li ber mineqaşeyên ontolojîk yê derbarê sînemaya kurdî da vekir. Bi taybet xelatkirina filma Bahman Ghobadi ya bi navê *Dema Hespên Serxweş* (2001) li Festîvala Fîlman ya Cannesê bi Kameraya Zêrîn (palme d'or), ev minaqeşe geştir kirin. Tevî ku lêkolînên derbarê sînemaya kurdî da dereng dest pê kirine, di van deh salên dawî da ji bo lêkolînên sînemaya kurdî rewaceka berbiçav heye. Kitêba edîtoriyal ya Mizgîn Müjde Arslanê *Kürt Sineması: Yurtsuzluk, Sınır ve Ölüm* (2009) ku bi tirkî ye û ji gotarên muxtelîf pêk tê, yek ji kitêbên derbarê sînemaya kurdî da ye. Dîsa, teza doktorayê ya bi navê *La construction visuelle des identités kurdes au cinéma* yek ji xebatên ewil e ku di sala 2013an da ji aliyê Yılmaz Özdil ve hatiye nivîsîn.

Li Tirkiyeyê, ji destpêka salên 2000î heta îro, berhemînana filmên kurdîziman, bi gotineka din bikaranîna zimanê kurdî di belgefilm, kurtefilm û filmên dirêj da bû wesîle ku sînema bibe meydana nû ji bo xuyabûn, geşedan û berbelavbûna zimanê kurdî. Mirov dikare îddia bike ku zêdebûna kurtefilmên kurdîziman li Tirkiyeyê, bi awayekî yekser girêdayî ye bi şert û mercên polîtîk yê serdema xwe û zêdebûna rêjeya zimanê kurdî di dezgehên perwerdeyî û medyayên nû da. Ji ber hindê jî, ev lêkolîn dê hewl bide ku di nav çarçoveya sosyo-polîtîk û tarîxî da bikaranîna zimanê kurdî rave bike. Bi gotineka din, lêkolîna me dê li dû bersivên van pirsan bikeve:

- Bikaranîna kurdî di kurtefilman da ji kengî ve dest pê kiriye?
- Çi peywendî di navbera babeta filmê û zimanê filmê da hene?
- Derhênerên kurd bi kîjan armanc û motîvasyonê kurdî di kurtefilmên xwe da bi kar tînin?
- Kurdî bi giştî bi rêya sînemayê, bi taybet bi rêya kurtefilman dikare çawa berbelav bibe?
- Zimanê kurdî di pênasekirina sînemaya kurdî da dikare roleka serekî bigêre?

2. Metodolojiya Lêkolînê

Ev lêkolîn, ji bo ronîkirin û ravekirina paşxaneyê babetê, xwendin û lêkolîneka sosyo-polîtîk û tarîxî pêwîst dibîne; lewma di beşa ewil da, bi navê “Karîgeriya Siyasetê li Ser Sînemayê li Tirkiyeyê, me layen û rehendên peywendîdar yê babeta lêkolînê rave kirin ku mirov

dikare wan bi giştî wekî polîtîkayên zimanî li Tirkîyeyê, xuyabûna zimanê kurdî di sînemaya tirkî da, destnîşankirina karakterên kurd bi rêya aksana tirkî, tarîxçeya kurtefilman li Tirkîyeyê û minaqeşeyên ontolojîk derbarê sînemaya kurdî da” destnîşan bike. Herçiqas em ji dîsîplînên muxtelîf yê wekî, sosyolenguîstîk û teoriyên ragihandinê îstîfade bikin jî, bi giştî em dê analîza xwe li ser daneyên pirsyarnameya xwe ava bikin ku li ser motîvasyon û tecrûbeyên derhênerên kurtefilman hûr dibe. Bi vê rêbazê em dê hewl bidin ku bi yarmetîya grafîk û îstatîstîkan û bi rêya berawirdiya kurtefilman babeta lêkolîna xwe tehlîl bikin.

Ev lêkolîn, ji sê beşên serekî pêk tê. Di beşa yekem ya vê lêkolînê da em li ser karîgeriya siyasetê ya li ser sînemayê hûr bûne, ka peywendiya sînema û polîtîkayên siyasî yê Tirkîyeyê karîgeriyeka çawa li ser bikaranîna zimanê kurdî di sînemayê da pêk aniye? Bi armanca berhevkirina daneyan di çarçoveya lêkolîna xwe da me pirsyarnameyek sepand. Di beşa duyem da em dê behsa metodolojî û rêbaza berhevkirina daneyên pirsyarnameyê bikin. Beşa sêyem ya vê lêkolînê jî ji tehlîla daneyên pirsarnameyê pêk tê. Di vê beşê da daneyên destkeftî ligel naveroka kurtefilman hatine berawirdkirin û tehlîl kirin.

3. Çarçoveya Teorîk

Girêdayî rewşa sosyo-polîtîk û şert û mercên tarîxî, sînemaya kurdî ne di nav sînorekî diyarkirî da, lê belê di nav sînoren dewletên ciyawaz da tê berhemînan. Ji ber van şert û mercan, hem pênaseya sînemaya kurdî ne zelal e, hem jî bidestxistina filmên kurdî gelekî bi zehmet e. Lewma, me lêkolîna xwe ji aliyê mekan û nimûneyên analîtîk ve bi kurtefilmên kurdî yê li Tirkîyeyê hatine kêşan û ji aliyê demê ve jî bi periyoda 1999-2018an ve sînordar kir.

Pirsyarnameya ku me bi armanca berhevkirina daneyan sepand, bi temamî ji bersivên 40 agahîderan pêk tê. Ji aliyê din ve, ji bo zelalkirina sînoren vê lêkolînê, em pênasekirina têgehên “sînemaya kurdî”, “sînemaya tirkî” û “kurtefilm”ê pêwîst dibînin.

Sînemaya kurdî: “Digel pabendîya ekonomîk ya çêker û derhênerên kurd û nebûna nasnameyeka fermî, mirov dikare sînemaya kurdî bi vî rengî pênase bike: Sînemaya kurdî ji filmên wan derhênerên kurd pêk tê ku aîd/xwediyê nasnameyên resmî û ciyawaz in², bi renegekî

². Di minaqeşeyên pênasekirina sînemaya kurdî û diyarkirina sînoren wê da têgeha “nasname”yê gelek caran derdikeve pêşîya me û ev têgeh li gorî kontekstê bi çendîn me’neyan hatiye bikaranîn. Girêdayî şert û mercên siyasî,

giştî girêdayî/muteesîrên derdorên hunerî, siyasî û sosyo-ekonomîk yên welatên lê niştecih in û di navenda çîrokên filmên wan da karekterekên kurd hene, zimanê filmên wan kurdî ye û/yan jî babeta filmên wan debarê kurdan da ye û ji “jêr-sînemayên” ciyawaz pêk tê. Li gorî vê pênaseyê pênc layenên sereke yên sînemaya kurdî derdikevine pêş: 1) Derhênerên kurd xwedî nasnameyên ciyawaz yên netewî/fermî ne ku di heman demê da (li gorî rewşê) hem wekî kurd, hem jî di nav nasnameya xwe ya fermî da dikarin bêne pênasekirin. 2) Di pênasekirin û avakirina sînemaya kurdî da derhêner- bo nimûne li gorî çêker- gelek caran xwedî qîmet û giraniyeka zêde ye û hetta cihê çêker digire. Bi gotineka din derhênan ji berhemînanê girîngtir e yan jî berhemînan parçeyeke derhênanê ye. 3) Di filmên kurdî da, rola karekterên kurd di nav çîrokê da navendî ye û kamera bi giştî li gorî van karekteran cih diguhere û mekanê filmê destnîşan/ava dike. 4) Di diyarkirina *nasnameya etnîk* ya sînemaya kurdî da, zimanê kurdî xwedî roleka girîng e. 5) Sînemaya kurdî ji layenên estetîk û ekonomîk û sosyal ve bi giştî di bin tesîra sînemayên din (faktorên dereve) da maye û di bin tesîra wan da teşe girtiye. Bes, ji aliyê tematîk û poîtîk ve yekpare ye” (Özdil, 2017: 221-2).

Sînemaya tirkî: Sînemaya tirkî, -bereksê sînemaya kurdî- ji ber ku ne xwedî krîz û kêşeyeka nasnameya fermî ye, mirov dikare bi vî rengî pênase bike: Sînemaya tirkî, ji wan filman pêk tê ku girêdayî nasnameyeka fermî ne û di nav şert û mercên sosyo-polîtîk yên Tirkiyeyê û li gorî kodên civakî, ticarî, olî û siyasî yên endustriya sînemaya Tirkiyeyê, bi giştî yan jî bi tamamî, bi zimanê tirkî hatine berhemînan. Li gorî vê pênaseyê, derhênerên tirkî ne tenê ji aliyê nasnameya xwe ya etnîk ve tîne pênasekirin. Bo nimûne, ji aliyê nasnameya etnîkî ve derhênerên wekî Yılmaz Güney, Yılmaz Erdoğan, Mahsun Kırmızıgül hwd. kurd bin jî, filmên wan wekî filmên tirkî tîne pênasekirin.

Kurtefilm: Derbarê pênaseya kurtefilmê da hemahengî û konsensûseka qet’î nîne. Tevî ku pênase û dirêjahiya kurtefilman li gorî welat û festîvalan diguhere, qenaeta giştî ya derbarê kurtefilmê da ew e ku dirêjahiya wê herî kurt 1 deqîqe û herî dirêj 30 deqîqe ye. Li gorî Nijat

cografî û tarîxî yên kurdan, bi gotineka din nebûna dewleteka kurdî ya musteqîl, derhênerên kurd ji nasnameyeka resmî/naskirî ya kurdî bêpar in û girêdayî nasnameyên fermî yên welatên lê niştecih yên wekî Îran, Iraq, Sûriye û Tirkiyeyê ne. Lewma filmên derhênerên kurd zor caran li ser navên welatên lê niştecih beşdarî festîvalên filman yên navdewletî dibin. Herwiha, herwekî li jorê jî hatiye behskirin, “derhênerên kurd xwedî/aîdê du nasnameyan in”. Yek, nasnameya etnîk ya kurdî, du, nasnameya resmî ya welatê ku derhênerên kurd lê dijîn. Qesta me ev e ji nasnameyên resmî û ciyawaz. Pênaseya van cure nasnameyan di van kontekstan da hatiye bikaranîn.

Özön dirêjahiya kurtefilman li Fransayê 30', li Îtalyayê 30', li Almanyayê 15' û li Belçîqayê 15' deqîqe ye (Özön, 2000: 426). Girêdayî vê dirêjahiya maweyî, kurtefilm di nava xwe da dibin şeş kategori: Honakî (kurmaca/fiction), tecrûbeyî (deneysel/experimental), belgefilm (belgesel/documentary), vîdeo-klîp (video klip/video clip), reklam/danasîn (reklam filmi/advertising film) û anîmasyon (animasyon-canlandîrma/animated film) (Can, 2018: 21-5). Taybetiyên ku kurtefilmê ji filmên dirêj cuda dikin hem maweya wê ye, hem jî vegêrana çîrokeka tîr e li mekaneka sînorkirî nisbet bi filmên dirêj.

4. Armanc û Girîngiya Lêkolînê

Peydabûna zimanê kurdî di sînemaya tirkî da û berhemîna filmên kurdîziman ji aliyê derhênerên kurd ve bû wesîleya qadeka nû ji bo zimanê kurdî. Bi taybet piştî salên 2000î berhemîna kurtefilmên kurdîziman û jinûve-avakirina kurdî di van kurtefilman da û bikaranîna kurdî di sînemaya Tirkî da wekî “aksan”eka tirkî û veguherîna vê “aksan”ê ber bi zimanekî serbixwe ve, hêjayî lêkolînê ye. Ev pêwîstî bi taybet ji nebûna lêkolînên di vî warî da tê, ligel sînorên mekanî û demkî yên xebata me, em di wê baweriyê da ne ku lêkolîna me ya mutewazî dê bibe destpêka lêkolînên derbarê bikaranîna zimanê kurdî di medyayên nû da ku bi her awayî mohra xwe li sedsala bîst û yekem dide.

5. Astengî û Rîskên Lêkolînê

Wekî hemî lêkolîn û xebatên zanistî û akademîk, gelek zehmetî û astengên vê lêkolînê jî hebûn. Di serê ewil da divê em bibêjin ku lêkolîneka kurdî ya bi vî rengî nebû ku rêberiyê li xebata me bike. Ji aliyê din ve derbarê nivîskarî û rexnegirîya bi kurdî da sînemaya kurdî qadeke kêma-destlêdayî ye. Lewma hem di qadên zanistî civakî hem jî di qada hunera sînemayê da xebatên nivîskî kêma in û termînolojîyeka yekpare û rûniştî pêk nehatiye. Bes, di van çend salên dawî da, wekî gelek qadên din yên nivîsevaniya kurdî derbarê hunerên hevçerx û dîtbarî da jî geşedanek heye. Dîsa, ji ber ku lêkolînên kurdîziman yên derbarê sînemaya kurdî da kêma in û çavkaniyên heyî bi zimanên biyanî ne, referansên ku ji çavkaniyên biyanîziman hatine wergirtin, me yek bi yek tercûme kirin. Ev referansên biyanîziman, gelek caran bûn binasê zehmetiya adaptekirin û lêana kurdî û endîşeya tercûmeyeka maqûl bo kurdî. Nezanîna me ya zimanê fransî, em ji îstîfadedkirina hin çavkaniyên sereke yên derbarê sînemaya kurdî da mehrûm kirin.

Wextê ku me bi armanca sepandina pirsyarnameyê û berhevkirina kurtefilman ligel agahîderan peywendî durist kir, atmosfera sosyo-polîtîk ya li Tirkiyeyê ne gelek aram bû. Bi rengekî tebi'î vê atmosferê tesîr li ser dirêj-ajotina lêkolîna me jî kir. Ji ber babeteka “polîtîk”, yanê sînemaya kurdî, hindê agahîder razî nebûn ku beşdarî pirsyarnameya lêkolîna me bibin.

Pirsyarnameya vê lêkolînê ne bi rûbirû, lê belê bi awayekî online hate sepandin. Wextê ku agahîder beşdarê pirsyarnameyê dibûn, me nezanî ka bersivên rast didin yan hema bi awayekî “formalîte” bersiva pirsan didin. Ev yek wekî rîskeka mezin li ber me bû. Lê ji bo berterefkirina vê rîskê, me formata pirsan ji şerh û şîroveyan zêdetir, veguhaste ser formata pirsên bijardeyî. Lê belê dîsa jî ew rîsk dê her hebe ji bo pêbaweriya bersivên agahîderan. Lewma em ev lêkolîn îddia nake ku daneyên pirsyarnameya di çarçoveya vê lêkolînê da hatî sepandin sedî sed rast û durist in.

6. Lîteratûr û Termînolojî

Bi armanca proseya lêgerîna çavkaniyan û berhevkirina kurtefilman me maweyeka qederê çar pênc mehan terxan kir. Sebebê dirêj-ajotina vê proseyê ew bû ku me di vê proseyê da yek bi yek xwe gihande derhêneran û me kurtefilmên wan ji wan xwestin. Di dirêjahiyê vê qonaxê da me li gel 53 derhêneran peywendî girêda ku em bizanin ka heta niha li Tirkiyeyê çend kurtefilmên kurdîziman hatine berhemînan û di vê babetê da bikarin bigehine encamên îstatîstîkî. Lê mixabin ji ber xemsariya derhêneran ev merema me neçû serî; gelek ji wan nexwestin kontaktê ligel me girê bidin yan jî cewaba e-mailên me bidin. Ji ber vê yekê, tehlîlên daneyan bes li gorî kurtefilm û pêzanînên destkeftî hatine kirin.

Di dema xebata teza me da, derbarê rêzimana kurdiya kurmancî da hin qaîde û destûrên rûniştî ji aliyê komek zimanzanan ve hatine guhertin. Bo nimûne qaîdeya ‘i’ya beriya dengê ‘y’yê wekî ‘î’/ ‘-îy’ê; pêşdaçek û paşdaçekên “di... de”, “ji... re”, “di... ser re” û çendîn qaîdeyên din yê rênûsa kurmancî hatine guhertin. Digel ku me ‘i’ya beriya ‘y’yê wekî formulasyona berê (-iy) nivîsî, pêşdaçek û paşdaçekên “di... de”, “ji... re”, “di... ser re” wekî “di... da”, “ji... ra”, “di... ser ra” nivîsîn. Dîsa, li şûna qertafa diyarkirinê, *-ekeyê*, me *-eka* (bo nimûne, ne *filmeke* kurdî, *filmeka* kurdî) tercîh kir.

Herwekî me berê jî behs kirî, kurdiya kurmancî di warên zanistên beşerî û warên hunerî da zor nehatiye bikaranîn. Ji ber vê yekê, ji bo fêhmbariyeka baştir, me hewcedarî bi ravekirina van têgehên dît: Di nav kurdiya kurmancî da ‘gotar’ a ku wekî ‘rabêj’ belav bûbû, me wekî ‘gotar’ (tr. *söylem*, îng. *discourse*), li şûna, ‘kêşan’ û ‘çêkirin’ a filmekê zêdetir me ‘berhemînan’ (tr. *üretim*, îng. *production* ku ji ‘berhemhênan’ a kurdiya soranî keftiye nav kurmancî, ji ber koka ‘berhem’ê me ev têgeh tercîh kir. Dîsa, ‘pirsyarname’ li şûna (tr. *anket*, îng. *questionnaire*), hatiye nivîsîn. Di beşa sêyem ya lêkolînê da me gelek caran cih da têgeha ‘agahîder’ê (tr. *katılımcı*, îng. *participant*) ku bi me’neya kesên ku agahiyan didin. Agahîder, di beşa sêyem da li cihê derhêneran hatiye bikaranîn, ku beşdarî pirsyarnamêyê bûne. ‘Xuyabûn’ jî têgeheka nû ye ku di nav kurdiya kurmancî da bi me’neya (tr. *görünür olma/görünürlük*, îng. *visibility*) hatiye bikaranîn.

7. Cûreyên Çavkaniyan

Di nivîsîna vê lêkolînê da heta ji destê me hat me ji çavkaniyên sereke sûd wergirt û me ji çavkaniyên matbû, audio-visual û daneyên pirsyarnamêyê îstifade kir. Herwiha, bi giştî rexne û tehlîlên derbarê sînemayê da li ser platformên dijîtal tî bilavkirin, lewma me carinan çavkaniyên elektronîk jî bi kar anîn.

Ji ber ku beşa teorîk ya vê lêkolînê ji babetên muxtelîf pêk tê, me ji gelek berhem û çavkaniyên ciyawaz sûd wergirt. Bo nimûne di babeta polîtîkayên zimanî da me belgenamêyên fermî yê derbarê polîtîkayên zimanî da bi kar anîn. Li gel vê yekê, ji bo fêhmdariya polîtîkayên zimanî li Tirkiyeyê, me ji çavkaniyên *Kürdistan’da Milliyetçilik ve Dil* (Hassanpour, 2005), *Zimanek Çima Tê Qedexkirin* (Çiçek, 2013), *Türkiye’de Ulusçuluk ve Dil Politikaları* (Sadoğlu, 2010) sûd wergirt. Hem ji aliyê naveroka xwe ve, hem jî ji aliyê termên pirsyarnamêyê ve me sûd ji kitêba *Rewşa Kurdî ya Sosyolinguîstîk li Tirkiyeyê* (Öpengin, 2011) wergirt û gelek kitêb û gotarên din yê derbarê vê babetê da jî bûne referansên lêkolîna me.

Ji bo çavkaniyên sînemayê jî, me hem ji çavkaniyên elektronîk hem jî ji çavkaniyên matbû gelek îstifade kir. Di serî da, teza Yılmaz Özdil (La construction visuelle des identités

kurdes au cinéma, 2013)³ yek ji wan lêkolînan e ku me jê îstifade kir. Me ji kitêba *Kürt Sineması: Yurtsuzluk, Sınır ve Ölüm* (Arslan, 2017) îstifade kir ku ji desteyek gotarên derbarê sînemaya kurdî da pêk tê. *Şunasî Kultûrî u Sînemay Kurdî* (Sîna, 2018) *Gemideki Hayalet: Türk Sinemasında Türklüğün ve Kürtlüğün Kuruluşu* (Şen, 2019), *An Accented Cinema: Exilic And Diasporik Filmmaking* (Naficy, 2001) û *Türk Sinemasında Kürtler* (Yücel, 2008) çavkaniyên sereke yên sînemayê ne ku me jê îstifade kir.



³. Teza Dr. Yılmaz Özdil ya bi navê *La construction visuelle des identités kurdes au cinéma* di sala 2013an da, li Université Paris III -Sorbonne Nouvelle wekî teza doktorayê hate pêşkêşkirin û qebûl kirin. Ev tez di çarçoveya dersên “Temsîla Kurdan di Sînemaya Tirkî da” û “Destpêka Sînema Kurdî” da di sal û serdemên 2017/bahar û 2018/payîzê da wekî notên van her du dersan li Zanîngeha Mardin Artukluyê, di beşa Ziman û Çanda Kurdî da wekî çavkanî hate xwendin. Hin referansên ku di vê lêkolînê da cih digirin, feyza xwe ji van notên dersî digire. Herwiha tercûmeya referans û bergirtinên ji vê teza frensî, ji aliyê Dr. Yılmaz Özdil bi xwe ve hatine kirin.

BEŞA YEKEM: KARÎGERIYA SIYASETÊ LI SER SÎNEMAYÊ LI TIRKIYEYÊ

Em dê di vê beşê da hewl bidin paşxaneya babetê vekolin û faktorên kartêker yên li ser babeta lêkolînê yek bi yek rave bikin. Bi gotineke din, em dê li ser aliyên babetê hûr bibin ku em dikarin wan aliyên bi vî awayî destnîşan bikin: Polîtîkayên zimanî li Tirkîyeyê, beriya salên 1990î xuyabûna zimanê kurdî di sînemaya tirkî da, destnîşankirina nasnameya kurdî bi rêya aksana tirkî, tarîxçeya kurtefilmên li Tirkîyeyê, peydabûna sînemaya kurdî li Tirkîyeyê, mînaqêşeyên ontolojîk yên derbarê sînemaya kurdî da, rola zimanê kurdî di pênasekirina sînemaya kurdî da û peywendiya sansûr û zimanê kurdî.

1.1. Polîtîkayên Zimanî li Tirkîyeyê

Em ê di vê beşê da pêşî polîtîkayên zimanî yên li Tirkîyeyê di nav proseseka dirokî ya dirêj da rave bikin ku ji *Kanun-ı Esasî* (1876) heta sala 1991ê dewam dike. Ev yek dê derfeta fêhmkirina hewldanên fermîkirina zimanê tirkî bide me ku mirov dikare wekî sînoren millî yên hemû cure polîtîkayên zimanî û çandî yên li Tirkîyeyê bi nav bike. Paşê em dê guherîna wan polîtîkayan û serbestiyên qismî yên zimanî û reformên derbarê polîtîkayên bikaranîna zimanê kurdî da rave bikin.

Berev dawîya sedsala nozdehem û di destpêka sedsala bîstem da, ligel têkçûna Împaratoriya Osmanî û girêdayî netewperweriya etnîk ya milletên di nav sînoren wê împaratoriye da derbarê satatû û polîtîkayên zimanî da gelek mînaqêşe û goftûgoyan dest pê kir. Bi taybet ji dewra Sultan Abdulhemîdê IIyem (1842-1918) ve mînaqêşeyên derbarê zimanê tirkî û statûya wî geştir dibin. Ev mînaqêşeyên zimanî li gorî şert û mercên konjonturel û di nav nîqaşên derbarê nasnameya osmanî da dihatine kirin. Bi gotineka din, ew mînaqêşeyên girêdayî hewldanên îdeolojîk yên destnîşankirina nasnameya millî ya Împaratoriya Osmanî bûn û li gorî sê doktrînen sereke yên wê demê; osmanperwerî, ummetperwerî û tirkperwerî diguherîn. Li gorî Hüseyin Sadoğlu bi armanca yekparekirina Osmaniyan, Abdülhemîdê IIyem wekî amûreka polîtîk dîn derxiste pêş û ev jî dibû sebebê gurrbûna mînaqêşeyên zimanî di nav Dewleta Osmanî da (Sadoğlu, 2010: 87). Ji ber konteksa polîtîk ya wê dewrê zimanên wekî osmanî, farisî û erebî ji kirasên xwe yên edebî û dînî zêdetir, bi kirasên xwe yên polîtîk derdiketîne pêş.

Di dewra Sultan Abdulazîz (1830-1876) û sultan Abdulhemîdê IIyem da ji bo ku zimanê tirkî hem wekî derseka mufredatê bête xwendin û hem jî statûya wî bête parastin hin

hewldan çêbûne. Bo nimûne ji bo dibistanên seretayî yên ku di bin desthilatdariya Hikûmeta navendî da bûn, *Maarif-i Ummumiye Nizamnamesiya* ku di sala 1869an da hatî îlankirin, dersên tirkî mecbûrî dikir (Ortaylı, 1987: 146-7). Herwiha li gorî neqilkirina Hüseyin Sadoğlu derbarê xwendina zimanê tirkî li dibistanên mehellî û xeyrî musliman, di sala 1894an da bi daxwaza Sultan Abdulhemîdê Iiyem fermanek tê dayîn ji bo ku li van mekteban dersên zimanê tirkî wekî derseka mecbûrî bê xwendin (Sadoğlu, 2010: 91).

Dewra Sultan Abdulhemîdê Iiyem ji bo destnîşankirina statûya fermî ya zimanê tirkî, serdemeka muhîm e. Bo nimûne bingeha zimanê fermî –zimanê tirkî- di sala 1876an de bi *Kanun-ı Esasî* hatiye danîn. Di *Kanun-ı Esasî da* ku wekî yekem makeqanûna Osmanî/Tirkiyeyê tê zanîn, li şûna “Osmanî” yan jî “lîsan-ı Osmanî”, “Tirkî” hatiye nivîsîn. Hüseyin Sadoğlu destnîşankirina zimanê tirkî wekî fermî di *Kanun-ı Esasîyê* da, ji bo netewperweriya tirkî, wekî geşedaneka muhîm dibîne (Sadoğlu, 2010: 99). Di vê makeqanûnê da xala herî muhim ya 18emîn e, ji ber du sebebên: Yek, ev xal ji bo kesên ku wekî me’ûr kar bikin di nav karûbarên dewletê da, zanîna zimanê tirkî ferz dike. Du, li şûna termên “zimanê osmanî” yan jî “lîsan-i Osmanî”, “zimanê tirkî” wekî zimanê dewletê hatiye destnîşankirin (Gözübüyük & Kili, 1982: 29). Bi vê makeqanûnê zimanê tirkî fermiyetek bi dest ve anî û herwekî em ê li xwarê bibînin, heta îro jî wekî zimanê fermî yê dewletê statûya xwe parast.

1.1.1. Qedexkirina Kurdî: 1924-1991

Mesut Yeğen, di beşa pêşkêşiya kitêba Mehmet Bayrak ya bi navê *Kürtlere Vurulan Kelepçe: Şark Islahat Planı* (2013) da dibêje ku; polîtîkayên Komara Tirkiyeyê yên heştê salan xwe dispêrine bingeha *Plana Islahatê ya Şerqê (Şark Islahat Planı)*. Li gorî Yeğen, vê planê di tarîxa Komara Tirkiyeyê da rêberî kiriye û hemû polîtîkayên dewletê yên wekî sirgûnkirin, îskana mecbûrî, mektebên leylî û axiftina mecbûrî ya bi tirkî ligel vê planê hevseng in (Bayrak, 2013: 11). Hem di birêvebirin/kontrolkirina meselaya kurdî da hem jî di polîtîkayên zimanê kurdî da *Plana Islahatê ya Şerqê* (PIŞ) yek ji girîngtirîn belgeyên ku dewletê wekî polîtîkayên esasî yên dewletî daye li ber xwe û hikûmetên peyrew sadiqê vê planê mane. Em dê li xwarê bi hûrgilî bibînin ka PIŞê roleke çawa gêraye di qedexkirina zimanê kurdî da.

Faktoreka dî ya ku di polîtîkayên zimanê kurdî da roleka girîngê gêraye, makeqanûnên Tirkiyeyê ne. Bo nimûne di makeqanûnên 1961 û 1982yan da ku piştî darbeyên 60 û 82yan yên

leşkerî hatine amadekirin, zimanê kurdî di nav çarçoveya polîtîk ya meselaya kurdan da hatiye dîtin û qedexekirina ziman û çanda kurdî wekî rêya kontrolkirina vê meseleyê hatiye ferzkirin. Ji ber vê tîkiliya nêzîk ya di navbera meseleya siyasî ya kurdî û qedexekirina ziman û çanda kurdî da makeqanûnên Tirkiyeyê girîngtirîn belge ne ku herwisa di nav sînorên nasnameya netewî ya tirkî da sînorên “legal” yê qad û şêwazên bikaranîna zimanên “kêmîne” diyar dikin.

Amir Hassanpour bi nisbet herçar dewletên ku kurd lê niştecîh in, polîtîkayên zimanî yê Tirkiyeyê wekî “zimankujî” (tr. *dilkarım*, İng. *linguicide*) pênase dike (2005: 229). Ev polîtîkayên dewletî bi awayekî sistematîk, bi rêya hemû hêz û dezgehên sivîl û dewletî ji sala 1924ê heta heta 1991ê berdewam kirin. Em ê bi awayekî kronolojîk û bi ser makeqanûnên 1921, 1924, 1961 û 1982ê ra, qonaxên qedexekirina zimanê kurdî yê li Tirkiyeyê destnîşan bikin.

Herçiqas Komara Tirkiyeyê di sala 1923yan da hatibe avakirin jî, ji ber şert û mercên wê dewrê, parlamentoya Tirkiyeyê cara ewil di sala 1921ê da civiya û yekem makeqanûna Tirkiyeyê di heman salê da ragihand. Di vê dewrê da hem Împaratoriya Osmanî belav bûye û hem jî komara nû ya Tirkiyeyê hêj ava nebûye û vê rewşê tesîr li ser naveroka Makeqanûna 1921ê jî kiriye. Ji ber vê serdema bêdewletiyê di sînor û îzahetên xalên Makeqanûna 1921ê yê derbarê zimanê fermî, pênaseya hemwelatîyê û etnîsîteyê da nezelalîyek heye. Di sala 1923yan da Tirkiye li Lozanê wekî dewleteka serbixwe tê nasîn û elîtên rêveber li ser binyadê tirkperwer dest bi amadekirina makeqanûnêka nû dikin. Salek piştî avabûna Komara Tirkiyeyê, Makeqanûna 1924an hate hazirkirin. Makeqanûna 1924an, nisbet bi Makeqanûna 1921ê gelekî zelaltir û aşkeratir e. Bo nimûne, di vê makeqanûnê da hemû kêmîneyên di nav sînorên vê dewletê da dijîn wekî “tirk” hatin pênasekirin.

Di xala 88an ya Makeqanûna 1924an da tê îfadekirin ku li Tirkiyeyê bêyî ku ji aliyê dîn û nijadê ve ferq û cûdatî bê kirin, her kes ji aliyê hemwelatîyê ve ‘tirk’ e (1924 Anayasası, 1924). Vê pênaseya hemwelatîyê, tesîreke mutleq li ser boçûna polîtîkayên zimanî yê Tirkiyeyê jî kir. Herwiha ne tenê di xala 88an da, di çendî xalên din ên Makeqanûna 1924an da derbarê polîtîkayên zimanî da me’lûmat hene:

“Her çî qas ev xal [xala 88an] tirkbûnê wekî tîkiliyeke hiqûqî ya hemwelatîyê terîf dike jî di xalên wekî 4, 10, 11, 38, 68, 69, 70, 82, 87, 92an de behsa tirk, tirkbûn, dewleta tirk, milletê tirk, çand û dîroka tirkan tê kirin. Xuya ye ku tîgiha tirk ku jixwe navê etnîsîteya tirk e, ne terîfeke

hiqûqî, etnikî ye. Ev feraset herî zêde di xal 2yan da tê dîtin. Di xala diduyan da ku ji aliyê mafê zimanî ve xala herî girîng e, tê gotin ku “zimanê dewletê” tirkî ye” (Çiçek, 2013: 167-8).

Di çarçoveya Makeqanûna 1924an da qedexekirina zimanên din û rûdanên politîk yên wekî serhildana Şêx Se’îd rê li ber amadekirina PIŞê vedike ku li jorê me behs kiriye. Gava mirov li xalên PIŞê dinêre, mirov dibîne ku bi gotina Mesut Yeğen “bingeha siyaseta kurdî ya Komara Tirkiyeyê ew e ku kurd ji behremendiya xwe ya milletbûnê mehrûm bimînin” (Bayrak, 2013: 11). Ew politîkayên zimanî yên dewletê ku heta salên destpêka 1990î berdewam kirin, xwe dispêrin PIŞê. Rayedarên ku PIŞ amade kirine ji bo jinavbirina zimanê kurdî, çendîn rê û rêbaz pêşniyaz kirine.

Beriya ku PIŞ bê hazirkirin û tedbîqkirin, wezîrê karên navxweyî Cemil (Uybadin), wezîrê Çankırıyê Mustafa Abdülhalik (Renda) û Fevzi Çakmak li herêmên kurdnişîn digerin û derbarê rewşa heyî da raporên amade dikin (Bayrak, 2013: 35). Herçiqas di PIŞê da giraniya rêbazên leşkerî bi armanca serkutkirina kurdan berbiçav be jî, politîkayên qedexekirina zimanê kurdî jî cihêkî girîng digirin. Yanê, li teniştê rêbazên leşkerî, politîkayên asîmîlasyonê yên wekî qedexekirina axiftina bi kurdî li sazî û dezgehên fermî û li qadên civakî, vekirina ocaxên tirkan, mektebên leylî û mektebên keçan hwd. tînin tedbîqkirin. Di xalên 14, 15, û 17ê yên PIŞê da rasterast behsa qedexekirina zimanê kurdî û teşwîqa axiftina bi tirkî dikin:

“Li navendên wilayet û navçeyên Meletî, Elezîz, Diyarbekir, Bedlîs, Wan, Mûş, Ruha, Erxenî, Xozat, Adilcewaz, Xelat, Palo, Çarsancaq, Çemişgezek, Ovacık, Hisnîmensûr, Behisnî, Arga, Hekîmxan, Bîrecûk, Çermûgê di daîreyên hikûmet û şaredariyan da û di saziyên din da, li mekteb, sûk û bazarê kesên ku ji xeynê tirkî zimanekî din diaxivin, li gorî curma muxalefet û muqawemeta li dijî emrên belediye û hikûmetê dê bînin sûcdarkirin û ceza li wan bête birrîn” (Bayrak, 2013: 38).

Bi xala 14an ya PIŞê li hemû sazî û dezgehên dewletê û mekteban û li qadên civakî yên wekî sûk û bazarê zimanê kurdî hate qedexekirin. Di PIŞê da politîkayên zimanî li ser du armancan hatine destnîşankirin: Yek, qedexekirina kurdî; du, fêrkirina tirkî. Yanê bi xala 14an ya planê zimanê kurdî tê qedexekirin, bi xalên 15 û 17an jî fêrkirina zimanê tirkî bi rêya perwerde û mekteban tê ferzkirin:

“Li herêmê [herêma kurdan] ocaxên tirkan, mektebên leyfî û mektebên keçan dê bîn vekirin û bi rêya perwerdeyê zarokên herêmê [zarokên kurdan] divê bîn asîmîlekirin. Di vê babetê da, divê ewilî em dorê bidine Dersimê” (Bayrak, 2013: 8).

Yek ji belgenameyên din yê ku behsa jinavbirina zimanê kurdî û meseleya kurdî dike, *Rapora Şerqê ya İsmet İnönü* (RŞİİ) (1935) ye. Ev rapora ku piştî dehsaliya tedbîqkirina PIŞÊ li herêma kurdan tê amadekirin, nirxandin û raporkirina encamên PIŞÊ ye. Ev rapor, ku piştî gereka dûrdirêj ya İsmet İnönü li herêma kurdan tê nivîsîn, li ser daxwaza serokkomarê wê demê Mustafa Kemal bi cih tê (Çîçek, 2013: 9). RŞİİ, derbarê rewşa sosyo-polîtîk û demografiya bajarên kurdan da me’lûmatên girîng dide. Di RŞİİ da, zimanê kurdî bi taybet wekî nîşaneyê kurdayetiyê û xetereyekê hatiye pênasekirin û ji bo bergiriya vê yekê tedbîr hatine pêşkêşkirin (Yayman, 2011: 126).

Astengên li pêşiya ziman û çanda kurdî bi Makeqanûna 1982yan berfirehtir bûn û bi vî awayî sînorên bikaranîna zimanê kurdî bertengtir bûn. Makeqanûna 1982yan ya ku piştî darbeya leşkerî hate hazirkirin li ser bingeheka dewletperwer hate danîn. Bi vê makeqanûnê, hin astengiyên din yê qanûnî derdikevin pêşiya ziman û weşangeriya kurdî. Di vê makeqanûnê da û bi rêya qanûneka nû rê li ber weşangeriya zimanên ji xeynî tirkî tê girtin (Çîçek, 2013: 13).

Ji hin guhertinên xalên Makeqanûna 1982yan diyar dibe ku ew makeqanûn di bin siya darbeya leşkerî û bi hizreka “dewletparêz” da hatiye hazirkirin. Bo nimûne di Makeqanûna 1961ê da derbarê zimanê fermî da xala 3yan wekî “zimanê fermî yê dewletê” hatiye nivîsîn (1961 Anayasası, 1961) lê belê di Makeqanûna 1982yan da îfadeya “fermî” jê hatiye rakirin û wekî “zimanê dewletê” hatiye guhertin (1982 Anayasası, 1982). Ne tenê di xala derbarê zimanî da guherîn pêk hatin, herwiha derbarê weşangeriya zimanên din da jî hin asteng û qedexe derketin pêşiya zimanê kurdî û zimanên din. Di vê çarçoveyê da dîsa di heman makeqanûnê da, xalên 26 û 28an yê derbarê weşangeriya zimanên ji xeynî tirkî û vegêrana fikran bi Qanûna 2932yan tê revîzekirin.

Di Qanûna 2932yan da sînor û çarçoveya bikaranîna zimanên ji xeynî tirkî û bi taybet kurdî hatine diyarkirin. Qanûna 2932yan ya ku ji heşt xalan pêk tê, ji xeynî çend xalan, bi temamî derbarê weşangerî û derbirîn û belavkirina fikr û ramanên bi zimanên din da ye. Girîngiya vê qanûnê ew e ku nisbet bi belge name û makeqanûnên berê sînor û çarçoveya

bikaranîna zimanên ji xeynî tirkî hatiye diyarkirin. Xala 2 û 3yan ku derbarê derbirîn û belavkirina fikr û raman û nivîsandina her cure belavokan da ye; bandên dîmenan, plaq, deng û amûrên derbirînê yên bi zimanên dî qedexe dike (Kanun No 2932, 1983). Ev qedexe heta sala 1991ê berdewam dikan. Bi guhertin û sistkirina van xalên makeqanûnî û çend pêngavên din ên derbarê weşana zimanên ji xeynî tirkî da, di sala 1991ê da, ji bo weşana zimanê kurdî û zimanên din qonaxeka nû dest pê dike. Herçiqas heta niha zimanê kurdî wekî zimanekî nehatibe nasîn jî, bi taybet piştî sala 1991ê çendîn geşedan çêbûn û qismen be jî zimanê kurdî li qadên civakî hate bikaranîn. Niha, em ê behsa rewşa zimanê kurdî bikin ka li Tirkiyeyê ji sala 1991ê heta îro derbarê serbestiya zimanê kurdî da çi gorankarî pêk hatine, rengvedana wî li qadên civakî û fermî û di jiyana sîvîl da çawa ye.

1.1.2. Xuyabûna Zimanê Kurdî li Qadên Civakî Piştî Salên 1990î

Di destpêka salên 1990î da hem xurtbûna siyaseta kurdî, hem jî hewldanên Tirkiyeyê yên bo berendamiya Yekitiya Ewrûpayê rê li ber sistkirina polîtîkayên qedexeker yên li pêşiya zimanê kurdî vekir. Wekî me li jorê jî gotî, di sala 1991ê da hem xalên makeqanûnê yên ku zimanê kurdî qedexe dikirin û hem jî Qanûna 2932yan ya ku bikaranîna kurdî yekcar qedexe dikir, qismen hatine fesihkirin (Kubilay, 2004). Lê belê herçiqas rê li ber bikaranîna zimanê kurdî vebibe jî, zimanê kurdî heta îro jî bi awayekî resmî nehatiye nasîn û kurdî statûyeka fermî bi dest ve neînaye. Lewma, di vê beşê da gava em behsa reformên derbarê bikaranîna zimanê kurdî da dikan, ji nasîna wî zêdetir em ê behsa reformên qanûnî û rengvedana wê li qadên civakî û li saziyên fermî bikin.

Bi fesihkirina Qanûna 2932yan, bi awayekî fermî rê li ber weşangeriya bi zimanê kurdî jî vebû. Wekî encama vê serbestiya zimanî, digel ku hindêk weşanxaneyên kurdî beriya salên 1991ê dest bi weşanê kiribin jî, bi giştî, weşanxaneyên kurdî piştî sala 1991ê hatin avakirin. Pirraniya weşanxaneyên ku beriya sala 1991ê hatibûn avakirin ligel bizavên siyasî peywendîdar bûn. Bo nimûne weşanxaneyên wekî Komal (1974) û Doz (1989) beriya salên 1991ê hatine avakirin. Herwisa, piştî rakirina qedexeya weşana bi zimanê kurdî di sala 1991ê da, weşanxaneyên wekî Weşanên Enstîtûya Kurdî (1992), Nûbihar (1992), Avesta (1995), Pêrî (1997) Aram (1997), Bajar (2003) û Lîs (2004) hatin avakirin (Demirel, 2016).

Herçiqas qedexeyên li ser zimanê kurdî di sala 1991ê da hatibin rakirin jî, sînorên qad, amûr û şert û mercên weşana bi zimanê kurdî ancax di destpêka salên 2000î, bi qanûnên nû, bo nimûne bi Qanûna 4709ê hate destnîşankirin (Kanun No 4709, 2001). Qanûna 4709ê ya ku ji bo fesihkirina xalên 9 û 10ê ya Qanûna 2932yê hatiye weşandin, bi şêwazeka resmî rê li ber bikaranîna zimanê kurdî vekir û xalên 26/3 û 28/2 yê Makeqaûna 1982yan bi heman qanûnê hate revîzekirin. Ev hewldan û çakkirina serbestiya bikaranîna zimanê kurdî, bi armanca endamtiya Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewrûpayê hate kirin. Di çarçoveya berendamtiya Tirikiyeyê ya Yekîtiya Ewrûpayê da çendîn reform û hewlên çakkirina bikaranîna zimanê kurdî li qadên civakî û li saziyên fermî pêk hat ku hindêk ji wan reforman ev in:

1) Di çarçoveya sêyemîn pakêta berendamtiya Tirkiyeyê ya Yekîtiya Ewrûpayê da, di 9ê Tebaxa 2002yan da qanûna derbarê weşanên radyo û televîzyonan da hate destnîşankirin ku "...hemwelatiyên tirk dikarin weşanê [a radyo û televîzyonê] bi ziman û zaraveyên cuda bikin yê ku di jiyana rojane da bi awayekî 'edetî bi kar tînin" (ABGS, 2007: 16).

Bi vê reformê rê li ber weşangeriya bi kurdî di radyo û televîzyonan da jî vebû. Helbet weşangeriya televîzyonî ya bi kurdî nayê me'neye nasîna zimanê kurdî. Li gorî Ergin Öpengin "Çendan lehce û ziman nehatibine binavkirin jî, naskirineke *de facto* ya van zimanan aşkere ye. Lê belê, bi zor meha hezîrana 2004an kanala dewletî TRT 3yê dest bi bernameyên bi zimanên kêmnîyan kir, ku kurmançî û zazakî jî ji van zimanên kêmnîyan bûn" (Öpengin, 2011: 99). Weşana bi zimanê kurdî li ser televîzyona dewletê têra xwe sembolîk bû û heftane herî zêde 2 saet û 30 deqîqe weşana bi kurdî (kurmançî-zazakî) diçû serî.

Du sal piştî vê pêngavê, di sala 2006an da bi rêzîknameyekê ji bo televîzyonên taybet maweya weşanê bû 45 deqîqe (İnal, 2018), lê di sala 2004an da gava TRT 3yê dest bi weşanê kir û rojane herî zêde 30 deqîqe heqê weşanê hebû. Herwiha di sala 2009an da kanala TRT 6ê dest bi weşana kurdiya kurmançî kir ku TRT 6ê bîst û çar saetan weşana bi kurdî dikir. Ersa Aslan derbarê qebûliyeta TRT Kurdiyê di nav kurdan da lêkolînek kiriye û îddia dike ku kurdên ku TRT Kurdiyê wekî kanaleka sûdmend pênase dikin zêdetir kurdên misilman ên sunnî ne û hêviya wan ji TRT Kurdiyê ew e ku zêdetir bername û weşanên dînî bêne duristkirin (Arsan, 2015). Ergin Öpengin di kitêba we ya bi navê *Rewşa Kurdî ya Sosyolenguîstîk li Tirkiyeyê* da cih daye hizra bîneran ya derbarê avabûna TRT 6ê (TRT Kurdî). Öpengin, li gorî konteksta gund, konteksta nîv-bajarî û konteksta bajarî hizra derbarê avabûna TRT kurdiyê ji 76 kesan pirs kiriye.

Her çiqas 10 kesan xwe ji cewabdana pirsê dabine paş jî, 66 kesan cewaba vê pirsê dane. Di her sê kategoriyan da herçiqas cewabên muxtelîf hebin jî, derbarê avabûna kanalê û feyde/zererên wê da, konteksta gundî zêdetir bi çavekî qenc berê xwe didinê. Bereksê vê yekê, konteksta bajarî zêdetir bi nezereka polîtîk, avabûna kanalê wekî menfe'etên siyasî û lêhbandineka dewletî dibîne (Öpengin, 2011: 200-2).

2) Di çarçoveya endamtiya Tirkiyeyê bo Yekîtiya Ewrûpayê da, di sêyemîn pakêta hevahengiyê da derbarê fêrkarî û perwerdeya ziman û zaraveyên biyanî da qanûnek hate weşandin. Qanûna 4771ê ya ku 3ê Tebaxa 2002an hatî qebûlkirin (ABGS, 2007: 25) derbarê fêrkarî û perwerdeya zimanên biyanî da ye û piştî qebûlkirin û weşandina vê qanûnê di Rojnameya Fermî da rê li ber fêrkarî û perwerdeya zimanê kurdî li kursên taybet vebû. Piştî qanûnê ku di Tebaxa 2002yan da hatine qebûlkirin, digel çendîn astengên siyasî, yekem saziyên fêrkariya kurdî di Nîsana 2004an da li Êlih, Riha û Wanê hatin vekirin. Halê heyî heft navend hene ku kursên taybet ên kurdî didin. Li gorî daneyên navendên fêrkariyê yê Amed, Êlih, Riha, Wan, Stenbol, Qoser û Edeneyê 1780 kursiyeran qeydiya xwe li van kursan çêkirine û ji navendên van kursan 1179 kursiyer mezûn bûne (Akin, 2013: 213).

3) Qanûna 6287an ya ku di sala 2012an da hate qebûlkirin, rê li ber xwendina dersên bijarde yê kurdî li mektebên seretayî vekir (Kanun No 6287, 2012). Di çarçoveya perwerdeya kurdî ya lîsans, lîsansa bilind û doktorayê da jî pêngav hatina avêtin. Di vê çarçoveyê da ji bo lêkolînên derbarê çand û zimanê kurdî û gihandina mamosteyên zimanê kurdî, ji bo dersdariya dersên kurdî yê bijarde li polên 5, 6 û 7an, Enstîtûyên Zimanên Zindî hatin avakirin. Di 2009an da bi biryara Lijneya Wezîran yekemîn Enstîtûya Zimanên Zindî di bin banê Zanîngeha Mardin Artukluyê da hate avakirin. Piştî, li zanîngehên Dersim, Bîngol û Diyarbekir jî bi heman navî enstîtû hatin avakirin. Di dewra perwerdeya 2013-2014an da zanîngehên Wan, Mûş, Bîngol û Mêrdînê bo bernameya masterê xwendekar qebûl kirin (Çiçek, 2013: 23). Xwendekarên ku ji van enstîtûyan mezûn bûne, wekî mamosteyên kurdî (kurmancî-zazakî) li dibistanên seretayî, li polên 5, 6 û 7an dersdarî kirin. Materyal û kitêbên van dersên bijarde ji aliyê akademîsyen/mamosteyên Enstîtûya Zimanên Zindî ya Mardin Artukluyê ve, bi kurmancî û zazakî hatine hazirkirin. Ji van enstîtûyên navhatî hejmareka zêde xwendekarên bernameya lîsansa bilind ya bêtez û bitez mezûn bûn. Herwiha, serê pêşiyê, di sala 2011an da beşa Ziman û Edebiyata Kurdî li zanîngeha Mardin Artukluyê vebû. Paşê, li Mûş û Bîngolê jî heman beş û li Dersimê jî beşa Ziman û Edebiyata

Zazakî hate vekirin. Ev beşên edebiyatê yên ku li van zanîngehan hatine danîn nêzikî çar, pênc salan e xwendekarên lîsansê mezûn dikin. Ji serdema 2012-2013an ya payîzê ve dersên kurdî yên bijarde li çendîn mektebên bajar û navçeyên kurdnişîn têne dayîn. Ji aliyekî din ve di bin banê van enstîtûyan da, ku hemî ne çalak in, derbarê tarîx, ziman, edebiyat, mîtolojî û sînemaya kurdî da ders tên dayîn û heta niha derbarê van qadan da çendîn tezên bi kurdî hatine nivîsîn.

4) Di sala 2013an da li Tirkiyeyê reformeka din pêk hat û bi Qanûna 6411an rê li ber îfadedana bi zimanê kurdî li mehkemeyên li Tirkiyeyê hate vekirin. Li gorî vê qanûnê ji bo ku bersûc bikaribin li mehkemeyan xwe baştir îfade û beyan bikin, dikarin bi zimanekî din parastina xwe bikin. Lê belê mesrefên tercûmanan ji aliyê dewletê ve nayên dan (Kanun No 6411, 2013).

Van pêngav û hewldanên polîtîk yên girêdayî meseleya kurdî tesîreka rasterast li ser polîtîkayên çand û zimanî jî kir. Bi taybet, di navbera salên 2009-2015an da ku wekî “pêvajoya çareseriyê” (Çözüm Süreci) tê binavkirin derbarê mafên zimanî û çandî da hindêk pêngavên din hatin avêtin. Girêdayî vê yekê rewaceka berbiçav çêbû ji bo zimanê kurdî û qismî be jî ji bo edebiyata kurdî bazarek pêk hat. Vê pêvajoyê zêdetir rê li ber çapkirin û belavkirina kitêbên kurdî vekir. Li gorî îstatîstîkên salane, di sala 2013an da cara ewil hejmara kitêbên kurdî ji 200 kitêban derbas dibin. Di sala 2016an da ev hejmar digihe 250 kitêbên kurdî. Piştî dawîlêhatina wê projeyê di dawiya sala 2017an da, em dibînin ku hejmara kitêbên kurdî yên salane dadikeve derdora 170 kitêban (Oguz, 2018). Ji sala 2015an ve ji ber şert û mercên konjonktûrel xuyabûna kurdî di amûrên medyaya giştî û qada civakî da kêmtir bû. Çendîn rojname, radyo û televîzyonên ku weşana bi kurdî dikirin û komele û enstîtûyên ku bi salan e bi armanca geşkirina çand û zimanê kurdî hatibûn avakirin (yên wekî Kurdî-Der û Enstîtûya Kurdî ya Stenbolê) hatin girtin (Karabağlı, 2016).

1.2. Ziman Wekî Nîşaneyê Nasnameyê di Sînemaya Tirkî da

Ji sala 1914ê heta destpêka salên 1950î sînemaya tirkî ji aliyê naverokê ve di bin tesîra sînemayên biyanî yên rojavayî û ji aliyê form ve jî di bin tesîra zimanê teatral yê kesên wekî Muhsin Ertuğrul da dimîne. Herwisa ji 1915ê û heta 1922yê hemû hewldanên sazîkirina sînemaya tirkî di bin banê saziyên leşkerî yên wekî Merkez Ordu Sinema Dairesi (1915) (Evren, 1995: 74-5), Mudâfaa-i Milliye Cemiyeti (1917), Malul Gaziler Cemiyeti (1919), Osmanlı Donanma Cemiyeti (1920) û Ordu Foto Film Merkezi (1922) da pêk tên. Mesûliyet û armanca

sereke ya van saziyan di nav şert û mercên konjonktûrel da bikaranîneka propagandîst ya sînemayê ye (Özdil, 2013: 64-66).

Piştî serkeftina Partiya Demokrat di yekem hîlbijartinên azad (piştî 1950î) da, di sînemaya tirkî da çîrokên li ser jiyana gundewarî û dîmenên taşrayê zêdetir dibin. Girêdayî vê guherîna sosyo-polîtîk di heman serdemê da sînemaya tirkî ya Tirkîyeyê (Yeşilçam) ava dibe û tirkîyaya yekserî ya di navbera edebiyata gundan û sînemayê da xurttir dibe. Bi berhemînanana filmên gundan, cara ewil kurd bi van babet û temayan daxilî sînemaya tirkî dibin. Di sînemaya tirkî da behsa kurdan jî cara ewil bi rêya van babet û temayan tê kirin. Li gorî Mûsûm Yücel yekem filma tirkî ya ku behsa kurdan tê da tê kirin, filma *Mezarımı Taştan Oyun* (1951) ya Hüseyn Peyda û Atıf Yılmaz e (Yücel, 2008: 35). Yücel îddia dike ku çîroka vê filmê ji straneka kurdî hatiye wergirtin ku behsa eşq û evîna Abdo Axayê Diyarbekirî û keçeka bi navê Mircan dike. Lê hevalê Abdo Axa Müslüm jî dil berdide keçikê û ji ber hesûdiya xwe Abdo Axa dikuje. Ev stran jî li ser şîna Abdo Axa hatiye nivîsîn. Müslüm Yücel dibêje ku, di sala 1926an da şandeya Darü'l Elhanê ku ji Samsûnê bi armanca berhevkirina stranên tîr bo Edene, Entap û Ruhayê, gelek stranên kurdî berhev dikin û adapteyî zimanê tirkî dikin. Strana li ser Abdo Axa hatî nivîsîn jî yek ji wan stranên e (Yücel, 2008: 39-42).

Hem bi merema lêgerîna çîrok û serpehatiyeka 'egzotîk' û hem jî bi endîşeya bazara sînemayî, meyla hindêk derhênerên tirk bo çand û cografyaya kurdan çêbûye û ji sala 1951ê ve kurd di sînemaya tirkî da di nav vê çarçoveya folklorîk da hatine temsîlkirin. Ev temsîl bi çendîn form û awayên cuda, bêyî ku behsa heqîqeta tarîxa kurdan, zimanê kurdî, cografya û çanda kurdan bê kirin, yanê kurd wekî kurd bî destnîşankirin (Özdil, 2013: 453), li gorî aîdiyetên îdeolojîk û niyet û nezerên derhênerên tirk yê derbarê kurdan da pêk hatiye. Digel ku li gorî serdeman boçûn û gotara sînemaya tirkî ya derbarê kurdan da guherî be jî, vê cure temsîliyetê di nav tarîxê da heta îro berdewam kiriye.

Ji destpêkê ve bîranîn, roman û çîrokên nivîskarên Köy Enstitüleri (Enstîtûyên Gundan) bala senarîst û derhênerên tirk kêşaye. Bi taybet di serdema 1950-1980î da, gelek senarîst û derhênerên tirk yê ku xwedî sînematografîyên ciyawaz in, ji edebiyata gundan û metnên nivîskarên Enstîtûyên Gundan îstifade kirin (Şen, 2019: 71). Sabahattin Şen, li ser sebebên meyl û arastebûna derhênerên tirk bo "şerq/doğu"yê hûr dibe û dibêje ku piştî salên 1960î, berdest û hazirbûna romanên gundan senarîst û derhênerên tirk ji zehmetiya nivîsîna senaryoyekê û

peydakirina çîrokekê xilas kir. Bi giştî di edebiyata tirkî da û bi taybet romanên gundan yên tirkî da, realîzm û realîzma civakî geş dibe û ev romanên ku li filman tên adaptekirin dibe wesîleya peydabûna meyla realîst di sînemayê da. Filmên wekî *Beyaz Mendil* (Lütfi Akad, 1955), *Alageyik* (Atif Yılmaz, 1957) û *Karacaoğlan Sevdası* (Atif Yılmaz, 1959) ku ji çîrokên Yaşar Kemal hatine adaptekirin, nimûneyên ewil yên salên 1950î ne ku xwe dispêrin romanên gundan (Şen, 2019: 71-2).

Şen, di kitêba xwe da, derbarê sebeb û motîvasyona *daxwaza nîşandana* (*gösterme arzusu*) kurdan û meskenên wan di sînemaya tirkî da ji aliyê derhênerên tirk ve, minaqeşeyekê dide destpêkirin. Şen, wekî sebeb û motîvasyonên *daxwaza nîşandana* kurdan û meskenên wan, hem bi paşxaneyê tarîxî ya karakterê (ethos) tirkayetiye ve, hem jî bi motîvasyonên şexsî yên derhêner û senarîstên tirk ve girê dide. Şen dibêje “ji bo ku mirov *daxwaza nîşandana* Kurdistanê ya derhêner û senarîstên tirk fêhm bike, ligel tesîrên pir-alî yên proseyan rojavayîbûnê ku di bedenên kollektîf û şexsî da peyda bûne, divê mirov berê xwe bide têgehên wan lêkolînên ku bi nezereka psîkanalîzê nêzikî tirkayetiye dibin” (Şen, 2019: 48).

Gregory Jusdanis, ji bo modernbûna hin neteweyan û bi taybet bo modernbûna Yûnanistanê têgeha “modernîteya derengmayî” (geçikmiş modernlik/belated modernity) bi kar tîne, ku ev netewe bi endîşeya derengmana modernîteyê di nav keftûleft û şiddetekê da ne (Jusdanis, 1998: 12). Şen, feyza xwe ji têgeha Jusdanis ya *modernîteya derengmayî* digire û di navbera *daxwaza nîşandana* kurdan ya sînemaya tirkî û fikr, hest, tirs û endîşeyên ku ji rojavayîbûn/ kapîtalîzasyona Tirkiyeyê peyda bûne, peywendiyekê durist dike: “Gava em li *daxwaza nîşandan* û keşîfîkirina “şerqê/doğu”yê ya derhêneran dinêrin, em rengvedana Rojava dibînin di vê daxwazê da ku ji salên 1950î dest pê dike, di salên 60 û 70î da zêde dibe û heta îro berdewam dike” (Şen, 2019: 48-9).

Li gel vê peywenda jorê, mirov dikare *daxwaza nîşandana* kurdan û welatê wan “şerqê/doğu”yê, di sînemaya tirkî da bi çendîn form û awayên temsîlê destnîşan bike. Di navbera qebûlnekirina gotara dewletî ya derbarê etnîsîteya kurdan û pratîka temsîlê ya binavnekirin lê destnîşankirina kurdan ji salên 50î heta dawiya salên 1990î da hevteribiyek heye. “Dewlet *kurdayetiya* meseleya kurdî nas nake/înkâr dike, bi têgehên “axatî”, “eşîret”, “kevneperest”, “tore”, “eşqiyatî” û “paşdamayîna ekonomîk” pênase dike” (Şen, 2019: 83).

Piştî behskirineka sethî ya derbarê tesmsîla giştî ya kurdan di sînemaya tirkî da, mirov dikare axiftina kurdan ya bi *aksana* tirkî di sînemaya tirkî da, wekî awayekî temsîl û kodkirina kurdan destnîşan bike. Yılmaz Özdil di teza xwe ya doktorayê da diyar dike ku, li cihê kodên yekserî yê nasnameya etnîk ya kurdan, di sînemaya tirkî da bi rêya îqamekirina hindê kodên antropolojîk yê neyekserî rastiya kurdan hatiye veşartin. Li gorî Özdil, piştî salên 1990î di sînemaya tirkî da jî girêdayî guherînên sosyo-polîtîk ev yek diguhere û di sînemaya tirkî da kurd wekî kurd tên temsîlkirin (Özdil, 2013: 134-188). Em ê di bin vê beşê da, behsa xuyabûna zimanê kurdî di filmên beriya salên 1990î da û paşê behsa destnîşankirina karakterên kurd bi rêya *aksana* tirkî bikin.

1.2.1. Beriya Salên 1990î Xuyabûna Zimanê Kurdî di Sînemaya Tirkî da

Herçend qedexeya berhemînana filmên bi zimanê kurdî di sala 1991ê da hatibe rakirin jî, beriya salên 1990î di hindê filmên tirkî da zimanê kurdî qîsman hatiye bikaranîn. Di vê çarçoveyê da me filmên *Seyyit Han* (Yılmaz Güney, 1968), *Hazal* (Ali Özgentürk, 1979), *Sürü* (Yılmaz Güney, 1979), û *Yol* (Yılmaz Güney, 1982) tehlîl kirine û peywendiya van filman li gel zimanê kurdî rave kiriye.⁴ Hem ji ber redkirina zimanê kurdî ji aliyê komîsyona sansûrê ya dewletê ve û hem jî ji ber sansûra navê kurdî ya karaktera Kejê, me filma Yılmaz Güney ya bi navê *Seyyit Han: Toprağın Gelini* (1968) di vê çarçoveyê da tehlîl kir. Li gorî agahiyên me *Seyyit Han* yekem film e ku li Tirkiyeyê ji ber zimanê kurdî tê sansûrkirin. Ji aliyê din ve, yanzdeh sal paşê di filma Ali Özgentürk ya bi navê *Hazal* da bi qasî şeş deqîqeyan qesîdeyeka dînî ya bi zimanê kurdî hatiye bikaranîn. Dîsa di filmên Yılmaz Güney yê wekî *Sürü* û *Yol* da hindê diyalogên kurdî û muzîka dengbêjiya kurdî cih digire.⁵

⁴. Bêyî ku em bikevîne nav mînaqeseyên derbarê kurdîbûnê ya jî tirkîbûna sînemaya Yılmaz Güney, ku ev mesele babeta lêkolîneka berfirehtir e, filmên Yılmaz Güney yê ku li jorê navên wan hatine nivîsîn, di nav çarçoveya sînemaya tirkî da hatine destnîşan kirin û ev film wekî filmên tirkî hatine behskirin.

⁵. Filma *Hakkari'de Bir Mevsim* (Erden Kıral, 1983) ji romana "O"ya (û paşê navê romanê wekî *Hakkari'de Bir Mevsim* tê guhertin) Ferit Edgü hatiye adaptekirin. Romana ku li filmê hatiye adaptekirin behsa serhatiya Ferit Edgü dike ku di sala 1965an da li Colemêrgê wekî mamoste, erkdar bû. Mekanê filmê yê rasteqîn jî gundê Anîtosâ (Yoncalı) bi ser Colemêrgê ve ye. Di vê filmê herçend kurdî wekî diyalogan cih negirtibe jî, di sehneya anîna bûkê bo muxtarê gundî da, stranên li ser bûkê tene gotin û stranên dawetê bi kurdî ne. Sehneya li sinifê jî, gava mamosteyê mektebê diaxive û li xwendekaran vedigere û ji wan pirs dike ka fêhm kirine yan ne, hemî xwendekar bi yekdengî dibêjin "naaa!". Digel ku di van herdu sehneyan da -kêm be jî- kurdî hatibe bikaranîn jî me ev film daxilî lêkolîna xwe nekir.

Senarîst, lîstikvan û derhêner Yılmaz Güney, di sala 1937an da li gundê Yeniceya Edeneyê, ji malbateka kurd hate dinyayê. Babê wî ji Sêwregê kurdekî zaza, dayika wî ji Mûşê ye. Di dewreka zû ya ciwaniya xwe da dest bi nivîsîna çîrokan kiriye û aliyê xwe yê edebî pêş xistiye. Di dawiya salên 1950î da dikeve nav karê sînemayê û wekî senarîst, lîstikvan û derhêner di gelek filman da kar kiriye. Di serencama jiyana xwe ya hunerî da, Yılmaz Güney bi temamî di 111 filman da wekî derhêner, alîkarê derhêner, senarîst û lîstikvan kar kiriye (Özgüç, 1988: 7). Lê belê herwekî ew bi xwe jî dibêje, mirov dikare jiyana wî ya sînemayî/hunerî bike du pişk: Güney, wekî figûrekî Yeşilçamê “Çirkin Kral” ji bo demeka dirêj di nav filmên sînemaya tirkî da wekî karakterên eşqiya, qaçaxçî, mafya û hwd. lîstikvanî kiriye. Ber bi salên 1970î ve tesîra bizavên polîtîk-sosyalîst li ser Yılmaz Güney çêdibe û sînemaya wî jî ji îdeolojiyên van bizavên polîtîk teşe digire. Di sala 1961ê da ji ber nivîsîna çîroka xwe ya bi navê *Üç Bilinmeyenli Eşitsizlik Sistemleri* cezayê hejdeh mehên zindanê û heşt mehên sirgûniya Konyayê lê tê birîn. Piştî sextbûna şert û mercên polîtîk yê li Tirkiyeyê, Yılmaz Güney bi çendîn caran tê zindanîkirin û xebatên xwe yê sînemayê di zindanê da berdewam dike. Senaryoyên filmên wî yê wekî *Sürü* û *Yol* û *Duvar* di vê serdema zindanê da tî nivîsîn. Herwisa Güney, di zindanê da (ji dût ve) derhêneriya filmên xwe yê *Sürü* û *Yol* dike. Piştî derbasbûna Güney bo Fransayê, filma *Yol* li 35emîn Festîvala Navnetewî ya Fîlman ya Cannesê bi *Palmiyeya Zêrîn* (li gel filma Costa Gavras, *Missing*) hate xelatkirin. Piştî pênc mehan, di 26ê Cotmeha 1982yan da Güney ji hemwelatiya Tirkiyeyê hate derxistin.

Di sala 1968an bi berhemînanana filma *Seyyit Han*, herwekî ew bi xwe jî beyan dike, çend agahîyan derbarê veguherîna sînematografiya xwe da dide û dibêje “*Seyyit Han*, yekemîn xebata min e ku hemû berpirsariyên wê li ser milê min bûn. Di jiyana min a hunerî da dawiya dewreka kevn û pêngava ewil ya dewreka nû ye.(...) *Seyyit Han*, di serê 1968an da, ligel tecrûbeyên min ên berê jî, navê serhildanê ye li dijî qaîdeyên Yeşilçamê û bi taybet li dijî “Çirkin Kral Yılmaz Güney” (Güney, 1998: 7). Piştî filma *Seyyit Han*, filmên din ên wekî *Sürü*, *Yol*, *Duvar* jî vê guherîna sînematografiya Güney tesdîq dikin. Ev filmên ku di nav îmkanên sînorkirî da hatine berhemînan, derbarê kurdan jiyana wan ya civakî da gelek agahiyên sosyolojîk û antropolojîk didin.



Wêne 1: Sehneyek ji filma *Seyyit Han: Toprağın Gelini* ya Yılmaz Güney⁶

Li gorî lêkolîn û pêzanîn berdest, yekemîn filma tirkî ya ku peywendiya wê ligel zimanê kurdî çêbûye -ji ber meseleya navê karektera Kejê bûye sebebê sansûrê- filma *Seyyit Han* e. Çîroka filma *Seyyit Han*, evîna Kejê (Nebahat Çehre) û Seyyit Han (Yılmaz Güney) e. Birayê Kejê Mürşit (Nihat Ziyalan) soz dide Seyyit Han ku xwêşka xwe bidetê, lê bi şertê ku ji dijminên xwe xilas bibe. Seyyit Han diçe hemî dijminên xwe dikuje û heft salan di zindanê da dimîne. Wê demê jî xeberek belav dibe ku Seyyit Han miriye. Piştî vegera wî, Seyyit Han tê xapandin û kemîneyek li ber tê vedan ku Seyyit Han Kejê dikuje. Di dawiya filmê da Seyyit Han, Haydar Begî (Hayati Hamzaoglu) dikuje, ku bûye sebebê mirina Kejê.

Di filma *Seyyit Han* da nîşaneyê sereke ya bikaranîna zimanê kurdî, navê karektera Keje (Kejê) ye. Hem bi piştrastkirina Yılmaz Güney û hem jî ji ber du car sansûrkirina filma *Seyyit Han* mirov dikare bibêje ku bikaranîna van navên kurdî yê karekteran (Kejê û Seyyîdxan) ne tesadûfî ye. Herwisa, ev yek nîşan dide ku sînematoğrafîya Yılmaz Güney guherîye û Güney zêdetir nêzikî realîteya civakî bûye. Filma *Seyyit Han* ne tenê ji ber navê karekterê Kejê, herwisa ji ber kostûm û alaya di destê gundiyan da jî tê sansûrkirin. Cara ewil, gava filma *Seyyit Han* bi

⁶. Hemî wêneyên ku sertaserê vê lêkolînê da hatine bikaranîn, ji heman filman hatine wergirtin.


armanca hinartina festîvalên derveyî Tirkîyeyê diçe komîsyona sansûrê, komîsyon îcazetê nade filmê. Bes, sebebên sansûrkirina filmê bi awayekî nivîskî nayên teblîxkirin. Mirov dikare vê yekê wekî nexwestina teyîtkirina bikaranîna navên kurdî wekî sebebê sansûrkirinê bibîne. Prodûktorê filmê Abdurrahman Keskiner, ji bo zanîna sebebê sansûrkirina filmê gava ku diçe Enqereyê, bo Keskiner tê gotin ku “komîsyona sansûrê navê karektera “Kece”yê [Kejê] wekî navekî xeternak dîtîye. Bi tirkî navekî wisa nîne. Herhal ev navekî kurdî ye” (Güney, 1998: 12).

Yek ji awayên destnîşankirina karekterên kurd di sînemaya tirkî da navlêkirina karekteran e. Di gelek filmên tirkî da ev navlêkirina karekteran bi şêwazekî pejoratîf hatine bikaranîn û ev yek bêhtir di serdema 1970 û 1980yî da gelek berbiçav e. Mirov dikare bibêje ku ev yek jî encameka din ya tesîra edebiyata gundan, bi taybet edebiyata Yaşar Kemal e (Alakom, 2010). Bo nimûne di filmên *Salako* (Atıf Yılmaz, 1974) (karekterê Salako-Salo), *Erkek Güzel Sefil Bilo* (Ertem Eğilmez, 1979) (Bilo), *Kibar Feyzo* (Atıf Yılmaz, 1978) (Feyzo) û *Cemo* (Atıf Yılmaz, 1972) (Memo û Cemo) hem navê filman, hem jî yê karekterên wan bi “o”yê diqedin û bi awayekî karîkatûral kurdbûna wan karekteran destnîşan dikin. Digel ku ew şêwaza bikaranîna navên kurdî heta îro berdewam dike, Yılmaz Güney hêj di sala 1968an da ew sembola pejoratîf berevajî kiriye û navên resen yên kurdî yên wekî Kejê û Seyîd Xan bi kar anîne. Derbarê çîroka filma *Seyyit Han* da hem Ali Fuat Şengül (2012: 69) hem jî Müslüm Yücel (2008: 150) îddia dikin ku çîroka filmê xwe dispêra destan/hikayeteka kurdî. Lê herdu jî derbarê vê destan/hikayetê da çî hûrgiliyan pêşkêş nakin. Herwiha, Şengül îddia dike ku ji ber ku navê karekterên vê destanê kurdî ne (Seyit Xan û Kejê), di filmê da jî ev nav li wan hatine kirin.

Yek ji filmên din yê ku em ê di çarçoveya bikaranîna zimanê kurdî di sînemaya tirkî da behsê bikin, filma *Hazalê* (Ali Özgentürk, 1979) ye. Senaryoya filmê ji aliyê Ali Özgentürk û Onat Kutlar ve hatiye nivîsîn. Ali Özgentürk, yek ji wan derhênerên tirk e ku bo demekê asîstaniya Yılmaz Güney kiriye. Paşê Özgentürk, bi yekemîn filma xwe ya dirêj, *Hazalê*, dest bi berhemîna filman kir.

Filma *Hazal*, di ser çîroka firqeta Hazal (Türkan Şoray) û Duvarcı Emin Usta (Talat Bulut) ra, behsa hatina ‘medeniyetê’ bi çêkirina rêyên gundî, pevçûna jiyana modern û jiyana ‘edetî, têkçûna hakimiyeta dînî û hakimiyeta şêxan dike. Di sehneya ewil ya filmê da bi dengê vegêrekî û bi nîşandana derwêşên kore derhêner berê bîneran dide cografyayeka “egzotîk”. Herwiha bi rêya nîşandana tesîra terîqet û baweriyên dînî, nakokîya di navbera jiyana modern û

jiyana ‘edetî û ayînî da nîşan dide. Derhênerê filmê gava ku civaka “dûrî medeniyetê” di nav formeka ayînî da destnîşan dike, ji bo ku wê ambîansa folklorîç û ayînî biparêze serî li nivîsîna herfên erebî û xwendina medhiyeyeka ji bo Hz. Muhammed Pêxember dide. Ji aliyê din ve, herçiqas mekanên filmîk yên filma *Hazal* wekî Kercews –ku wê demê bi ser Mêrdînê ve bû- bête zanîn jî, Gülsüm Depeli îddia dike ku mekanên filmîk yên filma *Hazal* gundekî Qadiriye Şemzînana Colemêrgê ye (Depeli, 2007: 86).



Wêne 2: Sehneyek ji filma *Hazal* ya Ali Özgentürk

Di edebiyata klasîk a îslamî da şî'rên ku babeta wan pesn û sîtayiş e, wek medhiye têne binavkirin. Babeta medhiyeyan pesndayîna kesayet û figûrên dînî (Xwedê, pêxember, sehabî, ehlê beytê pêxember, mela û şêx) ne (Adak, 2019: 135). Di filma *Hazalê* da di sehneya derxistina bûkê (Hazal) ji malê, qesîdeka bi kurdiya kurmancî wekî dengê derveyî çarçoveyê tê xwendin. Du nusxeyên bi “devoka” herêma Badînî hatî nivîsîn li ber destên me ne ku navê her du qesîdeyan jî “*Qesîda Em Dê Biken Medhê Resûl*” e. Derbarê vê filmê da xala sereke ya ku peywendîdar e ligel babeta me, armanc û niyeta bikaranîna vê qesîdeya kurdî ye. Gelo derhênerê filmê di vê serdemê da, bi çi armancê ev qesîde bi kar aniye û filma wî çawa ji sansûrê filitiye. Li gorî Yılmaz Özdil, sê îhtimal hene: 1) Dibe ku komîsyona sansûrê ji ber mijara filmê qesîdeya bi kurdî wekî qesîdeyeka bi zimanê ‘erebî hesabandibe. 2) Girêdayî gotara modernîst ya filmê, bikaranîna qesîdeya kurdî wekî xetereyekê nedîtibin. Çunkî di vê mînakê da qesîdeya bi zimanê

kurdî ligel strûktûra polîtîk ya çîrokê –dîn wekî sebebê paşdemayîna kurdan- hevseng e. 3) Ihtimaleka din ya ku ber'eksê gotara modernîst ya filmê ye, komîsyona sansûrê mudaxeleya vê teksta dînî nekiribe. Çunkî dîn yek ji elementên sereke ye, ji bo girêdana kurdan bi nasnameya fermî ya tirkî ve (din kardeşliği) ye (Özdil, 2013: 147-8). Ligel van îddiyên jorê, mirov dikare behsa endîşeyeka endustriyel ya derhênerî jî bike, ku derhênerî bi armanca mîstîfîyekirina jiyana kurdan di nav konteksteka 'edetî û ayînî da ev qesîdeya kurdî wekî elementê vê mîstîfîyekirinê di filmê da bi awayekî “fonksiyonel” îqame kiribe.

Fîlma *Sürüyê* (1978) bi sehneya deng û ahengeka kurdî dest pê dîke ku bi sê siwarên bi cemedanî ber bi deverê ve diçin. Piştî çend sehneyên din em ji axiftina karakteran fêhm dikin ku xwîndariyek di navbera eşretên Veysîkan û Xelîlan da heye. Senaryoya *Sürüyê* ji aliyê Yılmaz Güney ve hatiye nivîsîn, behsa jiyana edetî û koçberî ya eşretêka kurdan dike. Bi rêya vê mijarê, di filmê da bi nîşandana makîneyên çandinîyê modernîzasyona salên 1970yî, bi bertîlxuriya makînîst û memûrên li îstasyona trêne, têkçûna burokrasiya dewletê û bi nîşaneyên postera Marx û axiftina kurê hevalê Şivan yê li Enqereyê, fikra sosyalîzmê û hatina kapîtalîzmê destnîşan dike. Piştî filma *Seyyit Han*, çî eşkere çî veşartî, Yılmaz Güney tevî îmkanên wê dewrê (qedexeyên li ser çanda kurdî û atmosfêra hişk ya siyasî ya ber bi salên 1980yî ve) kurdan û jiyana wan li ser bîngeheka sosyo-polîtîk, di nav çarçoveya kodên sosyolojîk û antropolojîk da destnîşan dike. Bo nimûne derwêşên defjen û kostûmên karakteran, temsîlên antropolojîk yê jiyana kurdan yê wê dewrê ne. Ev yek ji şîyanwerî, samîmiyet û nasîn û boçûna Yılmaz Güney ya derbarê kurdan tê.

Yılmaz Güney di hevpeyvîna xwe ya ligel Chris Kutchera da, derbarê meselaya îmkanên bi kurdî-kêşana filma *Sürüyê* (1978) û bikaranîna zimanê kurdî da beyan dike ku: “*Sürü*, di esasê xwe da tarîxa milletê kurd e, lê mumkin nebû ku vê filmê bi kurdî bikêşim. Eger min lîstikvanên xwe bi kurdî bidana axiftin, bawer bike niha hemî hatibûne zindankirin.” (Kutchera, 2017). Lê belê tevî wê atmosfêra hişk ya siyasî ya li Tirkiyeyê, filma *Sürüyê* yek ji wan filmên beriya salên 1990î ye ku qismî be jî zimanê kurdî tê da hatiye bikaranîn. Zimanê kurdî di filmê da bi du awayan hatiye bikaranîn: Yek, di nav formeke dengbêjî/çîrokbêjîyê da (di sehneya trêne da rêwîyek çîrokeka evîniyê bi tirkî vedibêje lê tekrîrên çîrokê wekî “*heyla lê dayê..*” dubare dike) û çend caran ji bo bilindkirina tesîra dramaturjîk ya filmê deng û awazên muzîka dengbêjîyê kurdî

hatine bikaranîn. Ya duyem jî ew e ku ji bo saxbûn û filitîna Berîvanê ji nexweşiya xwe, li ser Berîvanê (Melike Demirağ) derwêşek duayeka bi kurdî dixwîne.



Wêne 3: Sehneyek ji filma *Sürü* ya Yılmaz Güney

Digel ku atmosfera polîtîk ya salên kêşana filma *Sürüyê* gelek sext bûn, ji ber paşxaneya malbatî ya Yılmaz Güney û vehesîna wî ya li ser kurdbûna wî, di filma *Sürüyê* da bikaranîna zimanê kurdî, ferqa di navbera Yılmaz Güney û derhênerên din da baş nîşan dide. Çunkî bikaranîna qismî ya zimanê kurdî di filma *Sürüyê* da wekî yek ji elementên çanda kurdî hatiye îqamekirin. Güney, di filmên xwe yê dawiyê da kurd bi awayekî samîmî temsîl kirine.

Hem bi çîrok û naveroka xwe hem jî bi temsîliyeta xwe ya filmîk, yek ji navdartirîn filma Yılmaz Güney, *Yol* e. Çîroka filma *Yol* serpêhatiya pênc mehkûman vedibêje ku ji girtîgehê derdikevine îzna 'eyda Qurbanê. Güney, di ser van karekteran ra atmosfera polîtîk ya salên 1980'yî li Tirkiyeyê, şert û mercên zindanê, meseleya kurdî ya polîtîk⁷ û sînoren di navbera Tirkiye û Sûriyeyê da vedibêje.

⁷. Bi nezera me polîtîkayên sext yê salên 1980'yî li Tirkiyeyê û zindanbûna Yılmaz Güney bi çendîn caran, tesîreka radîkal li ser naveroka filmên wî yê dawiyê kirin. Filmên *Sürü*, *Yol* û *Duvar* di vê çarçoveyê da hatine berhemînan. Güney, bi filma *Yol* meseleya sînor, kurd û welatê kurdan bi awayekî zela vedigêre û bo cara yekem e ku di sînemaya tirkî da bi întertîtra "Kürdistan"ê sînoren Kurdistanê tên destnîşankirin. Taybetiya derfeta filma *Yol* nisbet

Fîlma *Yol* yek ji wan filmên Yılmaz Güney e ku berdewam heta îro minaqeşe û goftûgoyên akademîk û zanistî li ser tîn kirin. Hem ji ber naveroka filmê, hem jî ji ber xelatkirina filmê li Festîvala Cannesê di sala 1982yan da, reseniya xwe heta îro parastiyê û wekî filmeka şaheser îro jî ji aliyê gelek bîneran ve tê temaşekirin. Gava filma *Yol* dihate kêşan, Yılmaz Güney li zindana Ispartayê bû û derhêneriya fi'îlî ya filmê ji aliyê Şerif Gören ve hate kirin. Li gorî neqilkirina Tarık Akan, hemû vîdeo û dîmenên negatîf/xav yên li ser seta *Yol* hatî kêşan, bi armanca parastinê, demildest bo Swîsreyê dihatin veguhastin (Akan, 2017). Montaja filma *Yol*, ji atmosfera sext ya li Tirkiyeyê dût, li Swîsreyê hate kirin. Piştî xelatkirina filmê li 35emîn Festîvala Cannesê, nîşandana li Tirkiyeyê hate qedexekirin. *Yol*, bi montajeka nû, piştî derxistina întertîtra “Kürdistan”ê û muzîkên dengbêjiyê –strana *Ehmedê Mala Musa* û strana Fatma Îsa ya bi navê *Lo Lo Miho*⁸, di sala 1999an da, yanê 18 sal piştî kêşana filmê, li Tirkiyeyê bi awayekî “deformekirî” hate nîşandan. Zahit Atam derbarê bikaranîna întertîtra “Kürdistan”ê da pirs dike ka çima Yılmaz Güney ev yek tercîh kiriye. Li gorî Atam, Yılmaz Güne çaxê di zindana Selîmiyeyê da bû, derbarê muşkîleyên çînî û muşkîleyên netewî kitêb dixwendin û bi taybet kitêba Lenin ya navdar *Ulusların Kendi Kaderini Tayin Hakkı*⁹ û metnên din yên sereke xwendibûn û Güney berî ku biçe Fransayê ji kurdbûna xwe haydar bûbû (Atam, 2014).

Piştî nîşandana versiyona deformekirî ya filma *Yol* li Tirkiyeyê, di sala 1999an da versiyona orjînal ya filmê jî li Tirkiyeyê peyda bû ku tê da stranên dengbêjiyê û zimanê kurdî cih digirt. Di fîlma *Yolê* da, bi nisbet bi filmên beriya salên 1990î hatine berhemînan, ziman û muzîka kurdî zêdetir hatiye bikaranîn. Mirov dikare sebebên vê yekê wiha rêz bike: Yek, montaja filmê li derveyî Tirkiyeyê hatiye kirin û çî endîşeya derhênerî ya li ser sansûrê nebûye. Du, Yılmaz Güney, li gorî neqilkirina Zahit Atam jî, salên dawî yên li Tirkiyeyê ji nasnameya xwe ya kurdî agahdar bû; piştî çûna wî ya Fransayê, axiftinên wî yên derbarê kurd û Kurdistanê da nîşaneyên vehesîna wî ya derbarê kurdbûna wê da ne.

bi filmên pêştir yên Güney ew e ku, montaja filmê li gundekî li ser sînorê Fransa û Swîsreyê hatiye saz kirin û heta ji destê derhênerê filmê hatiye bi îmkânên montajê dirûveka kurdî daye filmê.

⁸. Fatma Îsa, yek ji dengbêj û stranbêjên Radyoya Yerîvanê ye ku bi xwendina strana *Lo Lo Miho* deng vedaye. Di versiyona filmê ya orjînal da (ya ku li Cannesê hatî xelatkirin) ev stran cih digire. Di versiyona deformekirî ya filmê da ku li Tirkiyeyê hate nîşandan, ev stran hatiye jêbirin û li şûna vê stranê zêmar û girînek hatiye bicihkirin.

⁹. Mafê self-deretmînyonê. Metneka bingehîn û berbelav ya Vladimir Lenin e ku derbarê tayînkirina qedera neteweyan da ye.

Deformekirin û sansûrkirina hindêk sehneyên filma *Yol*, tesîreka mezin li ser ziman û estetîka wê jî kiriye. Bi awayekî berawirdî gava her du versiyonên filmê tên temaşekirin, ferq û cudahiya di navbera versiyonan da bi hêsanî tên dîtin. Di versiyona orîjînal ya filmê da, piştî întertîtra “Kürdistan”ê tê destnîşankirin, Ömer (Necmettin Çobanoğlu) di nav şînkahiyê da xuya dike û axê maçî dike. Bi nezera me ev dîmen û maçîkirina axê ji aliyê Ömer ve dikare wekî kodên texeyyula xaka Kurdistanê ya Yılmaz Güney bête dîtin ku welatê xwe wekî beheştê teswîr dike. Derbarê vê yekê da her wekî Yılmaz Özdil dibêje; di vir da klama dengbêjiyê (*Ehmedê Mala Musa*) wekî faktora sereke ya kurdîfikasyona xak û dîmena jeografîk wec dibîne (Özdil, 2013: 365). Dîsa, yek ji muzîkên ku ji versiyona orîjînal hatiye jêbirin, muzîka *Lo lo Miho* ye ku piştî serdagirtina gundî û derdestkirina gundiyan ji aliyê leşkeran ve, tê strîn. Ev stran, di versiyona sansûrkirî da hatiye jêbirin û li şûna wê axîn û nalîna jinekê û dengê girîna zarokekê hatiye bikaranîn.



Wêne 4: Sehneyek ji filma *Yol* ya Yılmaz Güney

Güney, di filma *Yol* da ne tenê bi rêya muzîka dengbêjiya kurdî, herwiha di versiyona orîjînal ya filmê da (wekî dengên ambîansê) diyalogên bi kurdî bi kar tîne. Gava mirov li van mînakên dinêre, dibîne ku bikaranîn û bikarneanîna zimanê kurdî ne tenê girêdayî helwesta şexsî ya derhêneran e, herwisa girêdayî konteksta polîtîk ya serdemê û daxwaz û kodên ticarî yê bazara sînemayî ya serdema xwe ye.

Di navbera naveroka filmên jorê û armanca bikaranîna zimanê kurdî di heman filman da peywendiyeka yekser heye. Bo nimûne di filma *Hazal* da, bikaranîna zimanê kurdî di nav formeke ‘edetî û ayînî da ye, xwendina medhiyeyeka kurdî ya ji bo Hz. Pêxember, bi armanca mîstîfîyekirina civaka kurdan hatiye bikaranîn. Bi filma *Seyyit Han*, avakirina karekterên kurdî, bi filma *Sürü* vegêrana tarîxa kurdan û bi *Yol* jî destnîşankirina meseleya kurdî û cografyaya kurdan, Güney di navbera naveroka filman û zimanê kurdî da peywendiyekê durist dike û zimanê kurdî wekî parçeyeka ji meseleya kurdî û çanda kurdî pêşkêş dike.

1.2.2. Destnîşankirina Karekterên Kurd bi Rêya Aksana Tirkî

Di sînemaya tirkî da, rêya sereke ya destnîşankirina karekterên kurd axftina tirkî ya bi *aksana* e. Ev yek bi giştî bi merema veşartina zimanê kurdî hatiye bikaranîn. Di vê çarçoveyê da li ser periyodeka dehsalane em ê filmên *Kibar Feyzo* (Atıf Yılmaz, 1978), *Katırcılar* (Şerif Gören, 1987) û *Eşkîya* (Yavuz Turgul, 1996) tehlîl bikin. Herwiha, li gorî kontekstê carinan em ê behsa hindêk filmên din yên tirkî jî bikin. Pêşiyê mirov dikare bibêje ku girêdayî vê cure temsîl û avakirina karekterên kurd bi rêya *aksana* tirkî, heqîqeta ontolojîk ya zimanê kurdî hatiye veşartin. Bi gontineka din li cihê zimanê kurdî aksana tirkî hatiye îqamekirin.¹⁰

Hamid Naficy di kitêba xwe ya bi navê *An Accented Cinema: Exilic And Diasporik Filmmaking* (2001) da tarîxa paydabûna sînemaya biaksan û peywendiyên sînemaya biaksan li jêr bizavên sosyo-polîtîk û ekonomîk mînaqêşe dike û derhênerên sînemaya biaksan kategorîze dike. Naficy, têgeha *sînemaya biaksan* wiha pênase dike: “Ev têgeh, ji bo filmên sînemakarên sirgûn yên li Rojava dijîn û xwedî nasnameyên dîasporîk¹¹ yan jî postkolonyal/etnîk tê bikaranîn ku ji salên 1960î heta îro filman berhem tînin. Bi giştî ev sînemakarên ku ji welatên “dinyaya sêyemîn” û postkolonyal in, ji salên 1960î ve li deverên kozmopolît yên li Bakurê Rojava bi cih bûne. Di navbera van derhêneran, welatê lê niştecîh û welatê ku ew jê hatî da, narehetî û nakokiyek heye” (Naficy, 2001: 10). Naficy, peydabûna sînemaya biaksan li Rojava, wekî

¹⁰. Bêjeya *accentê* ku di zimanê îngilîzî û frensî da tê bikaranîn, ji têgehla latînî ya *ad cantusê* dariştiye ku ew jî bi me’neya xwe *stranbêjî* ye. Herwiha, di gel ku çendîn maneyan vê têgehê hene, li gorî ferhenga online ya Turengê me’neyên wekî “şewaza axiftinê” û “taybetiya cudaker” jî hene.

¹¹. Hamid Naficy, têgeha “nasnameya dîasporîk” ji bo wan derhêneran bi kar tîne ku di netîceya bizavên polîtîk, civakî, dînî û netewî da ji salên 1960î ji welatê xwe berev dîasporayê koç kirine û ev derhêner piştî tecrûbeyeka dîasporayê bûne xwedî “nasnameyeka dîasporîk”.

netîceya bizavên polîtîk, civakî, dînî û netewî yên welatên yekem yên sînemakaran dibîne û filmên derhênerên ku dikevîna nava vê kategorîzyonê, wekî cureyeka nû ya sînemayê destnîşan dike. “Têgeha *aksanê* ku ji aliyê lînguîstîkê ve qîmet û girîngiyeka xwe heye, di qadên civakî û polîtîk da neyeksaniyê destnîşan dike. *Aksan*, li hindek kesan nîrxên xwemalî, li hindekan dînî, li hindekan jî nîrxên polîtîk bar dike. Bi gotîneka din aksan, yek ji kodên diyar e ku hem nasnameyê destnîşan dike hem jî nasnameyê ava dike” (Kültür, 2017). Herçiqas pênaseya têgeha sînemaya biaksan ya Hamid Naficy bi giştî derbarê sînemayên dîasporîk da be jî, mirov dikare vê pênaseyê di nav çarçoveya têkiliya sosyo-polîtîk (têkiliya çeper û navendê) ya kurdan û tirkên jî bi kar bîne.

Di kitêba xwe ya bi navê *Şehir, Orta Sınıf ve Kürtler* (2011) da Cenk Saraçoğlu behsa boçûn û reaksiyonên şênîyên Îzmîrê yên derbarê kurdan da dike û atmosfera polîtîk û texeyyula Îzmîriyan ya derbarê kurdan da neqil dike. Li gorî Saraçoğlu di nezera Îzmîriyan da kurd bi çendîn wesfên xirab yên wekî “dagirker” “nezan û cahil” tên dîtîn (Saraçoğlu, 2011: 116-125). Ev dîtîn, ne li ser înkarkirina nasnameya kurdî ya etnîk hatiye avakirin, ligel qebûlkirina nasnameya kurdan ya etnîk, kurdayetî bi wesfên “xirab” tê destnîşankirin û ji aliyê civaka Îzmîrê ve tê mehrûmkirin/vederkirin (dîşlama/exclocion). Li gorî çîna navîn ya Îzmîrê kurd ne tenê bi bêahengî û dijayetiya şewejiyana modern û bajarî ya li Îzmîrê tên pênasekirin, herwiha axiftina kurdan ya bi kurdî yan jî axiftina tirkîya biaksan jî nîşaneyê rasterast ya kurdbûnê ye û ev nîşane dibe yek ji parçeyê gotara derbarê “cahiltiya” kurdan da. Li gorî vê nezera çîna navîn bi şertê ku kurd bi *devoka* tirkîya Stenbolê biaxivin, dikarin ji kirasê xwe yê “cahil û nezan” xilas bibin. Herwiha, bi şertê ku kurd çî emare û taybetiyên cudaker yên derbarê kurdayetiyê da nîşan nedin, wê gavê kurd nabine objeya gotara mehrûmiyetê/vederkirinê (Saraçoğlu, 2011: 127). Axiftina kurdan ya bi aksana tirkî ku di sînemaya tirkî da li cihê zimanê kurdî hatiye bikaranîn, dikare wekî encama vê têkiliya nakok (hebandin-vederkirin) bête dîtîn.

Rengvedana gotarên fermî û atmosfera salên 70 û 80î ya Tirkiyeyê di gelek filmên tirkî da tê dîtîn. Ev film di heman demê da derbarê temsîliyeta kurdan ya vê serdemê da gelek agahiyên girîng didin, bi tabet jî filmên komediyê yên vê serdemê. Janra komediyê ji aliyê sînemaya ticarî (Yeşilçam) ya Tirkiyeyê ve wekî cih û amûrê karîkatûrîzekirina kurdîniyê hatiye bikaranîn. Bo nimûne di filmên *Salako û Kibar Feyzo* (Atif Yılmaz, 1974-78) da *Davaro û Şalvar Davası* (Kartal Tibet, 1981- 83) *Erkek Güzeli Sefil Bilo* (Ertem Eğilmez, 1979) û *Züğürt Ağa* (Nesli

Çölgeçen, 1985) da jin û mêrên kurd wekî mijarên çîrokên karîkatûral yên cinsî hatine nîşandan. Di van filman da kurdayetî bi cehalet, axatî, xulamtî, eşqiyatî, pûçebawerî/xurafe û nextê jinan hatiye temsîlkirin, herwisa wekî cihê têkiliyên cinsî yên ne-meşrû, maçîst û “heywanî” tê nîşandan.



Wêne 5: Sehneyek ji filma *Kibar Feyzo* ya Atîf Yılmaz

Di filma *Kibar Feyzo* da îmaj û mesajên gotara salên 1970î li Tirkîyeyê, nisbet bi filmên din yên ku di nav peywenda “axatî-gunditiyê” da hatine berhemînan, berbiçavtir in. Feyzo (Kemal Sunal) ji bo peydakirina nextê Gülo (Müjde Ar) gava diçe metropolê (Stenbol) û vedigere, dixwaze fikra xwe ya sosyalîst û gorankariya ku li metropolê tesîr li ser kiriye, li gund belav dike. Ber’eksê ew filmên tirkî ku erkdarên dewletê yên wekî mamoste, rojnameger û esker ji metropolê bi merema “ehlîkirin û medenîkirina” niştecihan/*yerliyan* têne rojhilat/*doğuyê*, di *Kibar Feyzo* da em dibînin ku yekî niştecih piştî çûn û hatina xwe ya stenbolê sazûmana civakî têk dibe û “ji nû ve ava dike” û Maho Axa (Şener Şen) dike.

Ligel vê dubarekirina gotara sosyalîst ya temsîlkirina kurdan di nav çarçoveya “gotara sosyalîst” ya salên 1970 û 80yî, wekî gelek filmên din yên tirkî, di filma *Kibar Feyzo* da jî tirkîya biaksan, karakterên seksîst û zimanê argo, dibin nîşaneyê temsîla kurdîniyê. Herwekî Cenk

Saraçoğlu jî behs dike, di filmên jorê da axiftina kurdan ya biaksan wekî îşareta “kurdûnê” û bi rengêkî cudaker, wekî delîlê “tirknebûneka çeperî” ye. Yanê, tirkîya biaksan ya van karekteran dibe rêya veşartina kurdûna wan û rêya tescîlkirina tirkûna wan.

Wekî çendîn filmên din yê wekî *Derman* (Şerif Gören û Zeki Ökten, 1984), *Hakkâri'de Bir Mevsim* (Erden Kıral, 1983), *İki Dil Bir Bavul* (Orhan Eskiköy û Özgür Doğan, 2008) û *Mucize* (Mahsun Kırmızıgül, 2015) ku herêmên kurdnişîn dibin mekanên rasthatina tirk/erkdarê dewletê (wekî ebe û mamosteyan) û kurdan, *Katırcılar* jî dikare di nav vê kategoriyê da bête nirxandin. Ev mekan di heman demê da dibine mekanên rasthatin û diyarbûna tirkîya rewan/pak û “tirkîya biaksan”.



Wêne 6: Sehneyek ji filma *Katırcılar* Şerif Gören

Di filma *Katırcılar* da mirov dikare bikaranîna aksana bi tirkî di nav du formên cuda da destnîşan bike: Aksana qaçaxçiyên û aksana eskerê Diyarbekirî, Raci (Raci Kiper). Herwekî li jorê me behsê kirî, di hindêk filmên tirkî da, tirkîya biaksan ligel hindêk kodên din yê wekî “axatî”, “xulamî”, “nezan û cahilî” û “sekshezî” hatiye bikaranîn.

Di filma *Katırcılar* da “qaçaxçîtî” jî wekî wan kodan hatiye bikaranîn. Bi gotineka din, di navbera qaçaxçîtî û tirkîya biaksan da peywendiyeka rasterast hatiye duristkirin. Di meseleya

aksanê da, nisbet bi filmên din yê tirkî filma *Katırcılar* nimûneyeka seyr e. Çunkî Raciye Diyarbekirî jî, yê ku bi unîformaya xwe ya leşkerî statûyeke resmî temsîl dike, bi tirkîyeka biaksan û xirab diaxive. Divê neyê jibîrkirin ku girêdayî şer û pevçûnan meseleya kurdî jî di van salan da dest pê dike. Mirov dikare temsîla eskerê Diyarbekirî, Raci, ku wekî kesekî komîk, xwedî mîzah û safekî ehmeqane tê nîşandan, wekî emareyeka “cudâ” ya boçûna sînemaya tirkî ya derbarê kurdan da bibîne” (Şen, 2019: 199). Tevî ku Raci di filmê da wekî esker dewletê temsîl dike, bi bilêvkirin û destnîşankirina nasnameya wî ya bajarî –Diyarbekirîbûna wî- dikare wekî temsîla kurdayetiya wî bête dîtin.

Li gorî Ahmet Özcan di navbera salên 1950 û 1980yê da, di sînemaya tirkî da babeta serekî eşqiyatî bû. Yekemîn pêla romantîzma eşqiyatîyê di salên 1950î da bi filmên eşqiyatiya Egeyê dest pê dikan. Di filmên hindê derhêneran da bêyî ku rexneyek lê bê kirin, “mîta efe”yê wekî şerê di navbera axayekî zalim û eşqiyayekî qehreman da û wekî pevçûna di navbera başî û xirabiyê da dihate temsîlkirin. Di salên 1960î da peydabûna eşqiyayên “şerqî” di çapemeniya netewî da bala prodûktor û derhêneran kêşaye. Özcan îddia dike ku di paşxaneya vê meyl û meraqa derhêneran da, endîşeyeka endustriyel hebû; çunkî her ku diçû derbarê axa “wehşî” û “tarî” ya “Şerqiyân” da meraqa “Xerbiyan” zêdetir dibû (Özcan, 2018: 47-8). İsmail Beşikçi, di kitêba xwe ya *Doğu Anadolu'nun Düzeni* da eşqiyatiya kurdan wekî “eşqiyatiya civakî” pênase dike. Beşikçi, vê eşqiyatîyê wekî serîhildaneke li hember burokrasiya dewletê dibîne: “Esasen, ev bûyerên (zordestî û kuştinê) ku bo raya giştî wekî eşqiyatî tèn pêşkêşkirin, ne li dijî gelê mezlûm, lê li dijî axayên zordest û burokrasiya dewletê ye ku her tim berjewendiyên axayan parastîye û hevkarî ligel wan kiriye” (Beşikçi, 1969: 156). Wekî gelek derhênerên tirk û Yılmaz Güney derbarê eşqiyatîyê da film berhem îname û ev babeta sînematîk heta roja me berdewam kiriye.

Mirov wan emareyên temsîla pozîtîf ya eşqiyatîyê di filma Yavuz Turgul ya bi navê *Eşkîya* da dibîne. Fîlm bi vegêrana bûyereka eşqiyatîyê dest pê dike ku berî 35 salan li Çiyayê Cûdî qewimiye. Eşqiyayekî ku berî 35 salan li Cûdî hatiye girtin û piştî 35 salan jî zidanê derdikeve û li dû evîna xwe ya zarokatîyê –Kejê- dikeve¹². Filma ku vê temaya dubare vedigêre bi romantîzekirina eşqiyatîyê – *gava eşqîya dimirin dibin stêrkên xuricî*- bi dawî dibe.

¹². Di filma *Seyyit Han* da jî çîrokeka eşqiyatîyê heye ku Seyyit Han (Yılmaz Güney) vî eşqiyayî temsîl dike û li dijî axa ye. Herwiha, karektera Kejê û çîroka eşqiyatîyê di filma *Eşkîya* da jî dubare dibe. Ev yek hem wekî tesîra Yılmaz Güney hem jî dubarebûna temayên sînemaya tirkî dikare bêne dîtin.



Wêne 7: Sehneyek ji filma *Eşkîya ya Yavuz Turgul*

Di *Eşkîya* da, ber'eskê hatina erkdarêkî dewletê bo herêma kurdan/doğuyê, kurdek/mehelliyek ber bi Stenbolê ve diçe. Vê carê Stenbol/metropol dibe mekanê rasthatina kurd û tirkan. Ferqeka dî ya vê filmê nisbet bi filmên tirkî yên ku babeta wan eşqiyatî ye, ew e ku navên kurdî yên orîjînal hatine tercîhkirin. Bo nimûne, navê Kejê ku di filma *Seyyi Han* da bûbû sebebê sansurê, di vê filmê da careka din hatiye bikaranîn. Mirov dikare bibêje ku bikaranîna van navên kurdî di filma *Eşkîya* da bi encama xuyabûna meseleya kurdî û qebûlkirina wê li qadên siyasî ve girêdayî ye. Digel eşqiyabûn û cilûbergên Baran, axiftina wî ya bi aksana tirkî jî wekî nîşaneyê nasnameya wî ya kurdî derdikeve pêş.

1.3. Tarîxçeya Kurtefilman li Tirkîyeyê

Fîlma *Ayestefanostaki Rus Abidesinin Yıkılışı* (Fuat Özkınay, 1914) wekî yekem fîlma tirkî û destpêka tarîxa sînemaya tirkî tê qebûlkirin. Ev fîlm teqabûlî destpêka Şerê Yekem yê Cîhanê (1914-1918) dike ku bi merema propagandaya li dijî rûsan ji bo raperîn û provakekirina tebaya osmanî hatiye berhemînan. Em ê hem behsa minaqeşe û îddiyên derbarê vê filmê da -ku wekî

destpêka tarîxa sînemaya tirkî tê zanîn- hem jî bi awayekî panoramîk behsa tarîxçeya kurtefilmên tirkî û paşê jî behsa kurtefilmên bi zimanê kurdî bikin.

1.3.1. Tarîxçeya Kurtefilmên Tirkî

Ji ber şert û mercên teknîkî û kamilnebûna hunera sînemayê di serdema peydabûna wê da mirov nikare behsa cureyên sînemayê yê wekî kurtefilm, belgesel, filmên dirêj, anîmasyon hwd. bike. Di destpêkê da gava film dihatine berhemînan hemî film kurt bûn. Geşedan û veguherîna amûrên sînemayê, peydabûna dengî di sînemayê da û îmkanên montajê tesîreka yekser li ser dirêjahiya filman kir. Wekî encama vê tesîrê, formên ciyawaz yê vêgerana sînemayê peyda bûn û kurtefilm jî wekî formeka vêgeranê di nav vê tradîsyonê da bi cih bû. Wekî destpêka tarîxa sînemaya fransayê, tarîxa sînemaya tirkî jî bi kurtefilman dest pê kiriye. Herçiqas li gorî tarîxa resmî ya sînemaya tirkî filma *Ayestefanos'taki Rus Abidesinin Yıkılışı*, di sala 1914an da dest pê kiribe jî, ev film ne li ber destan e û derbarê hebûna wê da mînaqêşe tîn kirin.

Di nav rexnegir û tarîxnasên sînemaya tirkî da qenaeta berbelav ew e ku yekemîn film/kurtefilma tirkî *Ayestefanos'taki Rus Abidesinin Yıkılışı* di 1914an da ji aliyê Fuat Özkınay ve hatiye berhemînan. Di van çend salên dawî da jî ku hebûn û nebûna vê kurtefilmê tê mînaqêşekirin, ligel peydabûna belgeameyekê ev mînaqêşe geştir bûn. Akademîsyen Arda Odabaşı derbarê hebûn û nebûna vê kurtefilmê da belgeameyek di arşîva Osmanî da peyda kiriye û îddia dike ku filma navborî hatiye kêşan û hatiye nîşandan jî (Özyurt, 2018).

Nijat Özön jî yek ji wan kesan e ku li ser meselaya yekemîn filma tirkî û derhênerê filmê Fuat Özkınay hûr bûye. Özön, îddia dike beriya ku Fuat Özkınay vê filmê bikêşe meyla wî bo sînemayê hebûye û heta di rêveberiya holên sînemayê da xwedî tecrûbe bûye û ev film ji aliyê wî ve hatiye kêşan (Özön, 1970: 10). Herçend di navbera rexnegir û tarîxnasên sînemaya tirkî da derbarê kêşana filma *Ayestefanos'taki Rus Abidesinin Yıkılışı* ji aliyê Fuat Özkınay ve konsensûs hebe jî, heta niha ji xeynî çend îmajan çî delîlên vê yekê nînin. Nezereka dî ya derbarê hebûn û nebûna vê filmê da ji aliyê Nusret Eraslan ve hatiye beyankirin ku di navbera salên 1951-71an da li Serokatiya Navendî ya Foto-filman wekî fermanदार kar kiriye. Nusret Eraslan dibêje ku ev film hatiye kêşan û bi heman navî hatiye qeydkirin. Heta Nusret Eraslan îddia dike ku wî qotiya vê filmê bi çavê xwe dîtiye lê film tê da nebûye (Can, 2018: 85). Eraslan îdia dike ku film wê demê

li Yıldız Sarayê dihate parastin û ji ber ihtimala şewitîna depoyê hin kesan film ji wir derxistine û ligel çendîn filmên din avêtine behrê (Can, 2018: 86).

Minaqeşe û lêkolînên derbarê destpêka tarîxa sînemaya tirkî da ne tenê bi filma *Ayestefanos'taki Rus Abidesinin Yıkılışı* ve sînordar in. Herwiha çend filmên din jî hene ku di çarçoveya destpêka tarîxa sînemaya tirkî da têne mineqeşekirin. Yek ji wan filman *Cihad-ı Ekber İlanı Mitingi* (Mösyö Mordo (?), 1914) ye. Odabaşı, îddia dike ku di wê belgenemayê da ku me li jorê behs lê kirî, filmeka bi navê *Cihad-ı Ekber İlanı Mitingi* heye ku di heman tarîxê da hatiye kêşan (Özyurt, 2018). Ligel van îddiayan, Aytekin Can derbarê filmên ewil yên tirkî da îddiayeke din pêşkêş dike. Li gorî îddiaya Aycan, beriya filma *Ayestefanos'taki Rus Abidesinin Yıkılışı* sê film hatine berhemînan. Digel ku Can vê îddiaya xwe pêşkêş dike, hûrgiliyên qanîhker yên derbarê van filman da nade. Filma ewil ya beriya sala 1914an, di 28ê Temmûza 1905an da li Mizgefta Yıldızê hatiye kêşan û derhênerê filmê nayê zanîn. Fîlma duyem, di 5-26ê Hezîrana 1911an ji aliyê Yanaki û Milton Manaki ve hatiye kêşan ku ev her du kes sînemakar û wênegirên Makedonî ne. Ev film di arşîva Makedonyayê da berdest e (Evren, 1995: 68). Filma sêyem ya ku di sala 1913an da hatiye kêşan filma *Hamidiye Kravazörü* ye. Derbarê hebûna vê filmê da jî çî delîl nînin (Can, 2018: 86).

Di salên ewil yên destpêka sînemaya tirkî da ji ber tesîra Şerê Yekemîn yê Cîhanê ji xeynî filma sînemakarên Makedonî, çî filmên din ne berdest in ku wekî yekemîn filmên tirkî tên îddiakirin. Ev filmên ku li jorê hatine behskirin yan bi alîkariya sînemakar û pisporên biyanî yan jî ji aliyê biyaniyan bi xwe hatine kêşan. Tevî vê yekê, destpêka tarîxa sînemaya tirkî wekî 1914 tê qebûlkirin û her sal wekî salvegera sînemaya tirkî tê pîrozkirin.

Ji ber nenivîsiya tarîxa sînemaya tirkî ya salên pêşîn, diyarkirina hejmara kurtefilmên tirkî ne mumkin e. Lê di navbera salên 1914-1921ê da, li gorî Giovanni Scognamillo ji 1914an heta yekemîn filma Muhsin Ertuğrul ya bi navê *İstanbul'da Bir Facia-i Aşk* (1921) şeş filmên dirêj yan jî navîn (orta metraj) û gelek kurtefilm û belgefilm hatine berhemînan. Herwiha di sala 1918an da Sigmund Weinberg yekemîn filma sînemayî (konulu film /feature film) ya bi navê *Himmat Ağa'nın İzdivacı* berhem îname (Scognamillo, 2003: 39). Lê ber'eksê vê îddiayê, Agâh Özgüç iddia dike ku di sala 1916an da dest bi kêşana filma *Himmat Ağa'nın İzdivacı* tê kirin, lê di sala 1918an da tê nîşandan.

Li Tirkîyeyê ji bo çakkirina çavkaniyên “Müdafaa-i Milliye Cemiyeti”, bi merema duristkirina peywendiyên di navbera gel û artêşê da filmên sînemayî hatine berhemînan (Can, 2018: 87). Endamê Müdafaa-i Milliye Cemiyeti rojnameger Sedat Simavi yekemîn filma sînemayî ya bi navê *Pençe* berhem tîne, ku ji çîroka *Pençeyê* ya nivîskarê dewra Servet-i Fünûn Mehmet Rauf hatiye wergirtin. Li gorî Agah Özgüç ev film di sala 1917an da hatiye kêşan û ew vê filmê wekî yekemîn filma sînemayî ya tirkî qebûl dike (Özgüç, 1993: 15). Sînemaya tirkî di serdema pêşîn da (1914-1922) bi pêşengiya biyaniyan, bi taybet bi pêşengiya Almanan tête berhemînan. Ji ber tesîra Şerê Yekem yê Cihanê heta dawîya salên 1920î mirov nikare behsa berhemînaneka berkeftî ya sînemaya tirkî bike. Lê belê Şadi Fikret Karagözoğlu sêbareya kurtefilmên komediyê yên wekî *Bican Efendi Vekilharç*, *Bican Efendi Mektep Hocası*, *Bican Efendi Rüyası* di sala 1921ê da berhem tîne. Şadi Fikret, bi karakterê xwe yê komediyê *Bican Efendi*, cara ewil bo sînemaya tirkî komedyenekî diafirîne (Özgüç, 1988: 15).

Ber bi dawîya salên 1930î ve, ligel peydabûna dengî di sînemayê da filmên bideng tîn berhemînan. Bi vê guherînê ra, li Tirkîyeyê di salên 1930î da filmên bideng hatine kêşan. Nazım Hikmet bi navê *Düğün Gecesi/ Kanlı Nigar* (1933) filmekê dikêşe ku ew bi xwe li duyemîn şirketa filman ya Tirkîyeyê ya bi navê İpek Filmê senarîst û derhêner e (Can, 2018: 87).

Di navbera salên 1930-1950î da berhemînanana kurtefilman kêmbûnê û filmên hatî berhemînan jî nagehine hejmareka baş ya bîneran. Belgefilmên ku ji aliyê sazî û şirketên filman yên wekî Kemal Film û İpek Film, Sinemacılık Kolu (Şaxa Sînemakariyê) ku girêdayî Wezareta Turîzm, Weşan û Medyayê bûn û Öğretici Filmler Merkezi (Navenda Filmên Fêrkar) ku di sala 1950an da di bin banê Wezareta Perwerdeyê da hate avakirin, negihîştine bîneran. Salên 1950-60î bi vî awayî derbas dibin û berhemînaneka berbiçav ya kurtefilman pêk nayê (Can, 2018: 88-9).

Salên 1960î ji bo berhemînanana kurtefilmên tirkî serdemeka girîng e. Di sala 1963yan da xwendekarên Koleja Robertê yên wekî Özer Kabaş, Üner Biricikli, Ömer Bilgin, Faruk Seyrek, Hasan Gürdal, Kayahan Tolunay, Sezer Tansuğ û Ersan Pertan, Kluba Sînemayê ya Koleja Robertê ava dikin. Ev klub, wekî karê ewil di sala 1966an da kovara *Görüntüyê* neşr dikin. Ev kluba ku bi armanca belavkirina çanda sînemayê, îqamekirin û sazîkirina sînemayê hatiye avakirin, di sala 1967an da Yekemîn Pêşbirka Kurtefilman ya Hisarê dane destpêkirin û bi çendîn caran ev festîval li dar xistin. Çend sal paşê, derhênerên wekî Oğuz Tarcan, Yeşim Ustaoglu, Nuri Bilge Ceylan û Reis Çelik yekemîn kurtefilmên xwe berhem înan (Can, 2018: 89-90). Piştî

salên 2000î hem hejmara derhêneran hem jî girêdayî vê yekê, hejmara kurtefilmnan li Tirkîyeyê zêde bûn.

1.3.2. Tarîxçeya Kurtefilmên Kurdî

Bi armanca berhemînan û geşkirina muzîk, şano, sînema, edebiyat û bi giştî hunera kurdî, bi pêşengiya kesên wekî Musa Anter, İsmail Beşikçi û Ali Temel, di 27ê Îlona 1991ê da li Stenbolê Navenda Çanda Mezopotamyayê (NÇM) hate avakirin (MKM, 1991). Dîsa, di sala 1995-96an da, di bin banê NÇMê da, komeka xwendekaran ji bo berhemînan sînemayê, Kolektîfa Sînemayê ya NÇM ava kir û girêdayê vê kolektîfê şirketeka produksiyonê ya bi navê Yapım 13 hate danîn. Di vê kolektîfa sînemayê da atolyeyên dersên teorîk û pratîk hatin dayîn. Kesên wekî Hüseyin Kuzu û Ahmet Soner di rêvebirin û organîzasyona vê kolektîfê da rolên serekî gêran (Öz, 2011: 155). Ev kolektîfa sînemayê xebatên xwe yê sînemayî di salên 1995-96an da zêde kirin û bi beşdariya kesên muxtelîf yê bi sînemayê ra eleqedar, atolye û semînerên sînemayê li dar xistin. Kolektîfa Sînemayê ya NÇMê, bi vekirina şaxên Diyarbekir û Îzmîrê xebatên xwe berfirehtir kirin.

NÇMya ku bi durîşmeya “jiyana azad, hunera şoreşger” dest bi xebatên hunerî kirî, li gorî beyanata saziyê bi xwe, “li dijî endûstriya çandê ya modernîteya kapîtalîst bi dixwaza afirandina çand û hunereka pir-reng û pir-deng û alternatîf ya xelkên Mezopotamya, Anatoliya û Rojhilata Naverast û bi perspektîfeka muşterek û şoreşgerane bi rê ve diçû.” Herwiha, NÇM ji bo nîşandana berdewamiya tradîsyona edebiyata kurdî, risteya Melayê Cizîrî ya meşhûr “*Feyza me şubhî Nil e, lê em Dicle û Firat in*” refere dike û vê risteyê wekî motto li ser malpera xwe divîsîne (MKM, 1991).

NÇMê, heta niha di warên dans, şano, muzîk û sînemayê da bi dehan berhem û xebatên kolektîf berhem înanê û pêşkêş kirine. Koma şanoyê ya bi navê Teatra Jiyana Nû ku di sala 1991ê da hate avakirin, salek şûnda daxilî NÇMê bû û ji wê tarîxê ve nêzikî 30 listikên şanoyê yê bi kurdî berhem înan. NÇM, di warê muzîka kurdî û gihandina stranbêjên kurdî da jî bû mektebek. Di bin banê NÇMê da bi çendîn komên muzîkê û stranbêjên kurdî gihan. Komên muzîka kurdî yê salên 1990î, wekî Koma Amed, Koma Gulên Xerzan, Agirê Jiyan û stranbêjên wekî Zelal Gökçe, Rojda, Ayfer Düzdaş di bin banê NÇMê da berhemên xwe yê muzîkê pêk anîn. Dîsa, di 2005an da, li NÇMê komeka dansa modern ya bi navê Mezopotamya Dans hate

avakirin ku ji heman salê ve bi çendîn performansên xwe, navdar bû. Koma dansê ya NÇMê hem li ser destanên kurdî yê wêkî *Mem û Zînê û Destana Kawa* hem jî li ser babetên nasname û muşkîleyên jinan yê rojane hûr bû. Mezopotamya Dans bi performansên şano-dansê ya *Mem û Zînê* derketin ser sehneyê. Mezopotamya Dansê heta vê gavê *Mem û Zîn, Navber, Bê Zeman û Bê Ziman, Sînor, Yasaq, Destana Kawa, 4Kapî 40 Mekan (4Dergeh 40Meqam) û Jenosît* berhemînan (MKM, 1991). Herwiha Performansa *Leylayê* ya ku jiyana Leyla Bedirxan vedigêre ji aliyê Mezopotamya Dansê ve di sala 2015an da hate berhemînan (Akgül, 2015).

Kolektîfa Sînemayê ya Navenda Çanda Mezopotamyayê, ku paşê navê wê dibe Kolektîfa Sinemayê ya Mezopotamyayê (KSM), di sala 1995-6an da bi pêşengî û rêxistina derhêner û senarîstên wêkî Ahmet Soner û Hüseyin Kuzu tê avakirin. Bi beşdariya dersdar û mamosteyên wêkî Zahit Atam, Meryem Yavuz, Müjde Arslan û bi atolyeyên sînemayê yê derhênerên wêkî Sırrı Süreyya Önder, Yeşim Ustaoglu, Özcan Alper û Handan İpekçi KSM dest bi xebatên hunerî dîke (Gündoğdu, 2012; Keleş, 2013).

KSM hem di zayîn û geşedana sînemaya kurdî da hem jî li hember çanda endustriyel ya sînemayê û îdeolojiya fermî xwedî roleka girîng e. Derbarê vê giringiya KSMê da Engin Sustam dibêje ku, xebatên hunerî, çandî û polîtîk yê kurdî ku di salên 1990î da pêk hatin, ne tenê îmtiyazên qada civakî (kamusal uzam) binpê kirin, di heman demê da xwendinên *dij-çand* (karşî-kültür) yan jî *jêr-çanda* kurdî (Kürt alt-kültürü) dane xuyakirin ku dikare derveyî çanda resmî bîne pênasêkirin. Bi lêpîrsîna heqîqeta civakî, em dibînin ku wêkî fa'îl kurdên ku li dijî îdeolojiya resmî ya çanda populer û niştecîh in, dest bi berhemînaneka hunerî ya nû kirine (Sustam, 2016).

Em dikarin filmên ku bi wesîleya NÇMê hatine berhemînan ji du aliyên ve wêkî berhemînaneka li dijî îdeolojiya fermî ya niştecîh bi nav bikin: Yek, filmên ku ji aliyê derhênerên kurd (bi taybet Kazım Öz û filmên wê yê wêkî *Ax û Fotograf*) ve berev dawîya salên 1990î û di destpêka salên 2000î da hatî berhemînan, meyla wan zêdetir li ser nîşandana heqîqeta kurdan ya polîtîk û rewşa kurdan ya salên 1990î ye. Ya duyem jî, ji bo xwe-bicîhkirina li hember boçûn û berhemînaneka hunerî ya ku di bin siya îdeolojiya fermî da dirûv girtiye, berhemînaneka filmên kurdîzîman e.

Nebûna arşîveka sînemayê û nediyariya sînorên pênaseya sînemaya kurdî, tesîrê li ser diyarkirina çarçoveya filmên kurdî û destnîşankirina tarîxa sînemaya kurdî ya li Tirkiyeyê dikin (Özdil, 2019). Ligel vê yekê, li gorî lêkolînên me kirî yekemîn kurtefilma kurdîziman û honakî kurtefilma Kazım Öz ya bi navê *Ax* (1999) e ku di heman demê da yekem berhema KSMê ye. Kazım Özê ku bo demekê asîstaniya Yeşim Ustaoglu (di filma *Güneşe Yolculuk* da) kirî, di sala 1999an da yekemîn kurtefilma xwe berhem îna. Kurtefilma *Ax*, di ser karekterê Zelo (Hikmet Karagöz) ra, behsa babeteka aktuel ya salên 1990î, yanê şewitandin û valakirina gundên kurdan dike. Zelo, pîremêrekî gundî ye ku li dijî şewitandin û valakirina gund û kuştina seyê xwe, ji bo neterikandin û bicihnehiştina gundê xwe li ber xwe dide. Öz, bi vê filma xwe, meseleyeka tarîxa kurdan ya aktuel ya di nav diyardeyên “hafîze”, “mekan”, “nasname” û “berxwedan”ê da pêşkêş dike.

Herwekî me li jorê behsê kirî, berhemînana derhênerên kurd ya sînemayê di dawiya salên 1990î û di salên 2000î da hem ji aliyê naverok û hem jî ji aliyê zimanê filman ve, derveyî berhemînana sînemaya tirkî ya domînant e. Nîşandana şewitandina gundekî kurdan û yekem car bikarananîna jêrenivîsa zimanê kurdî di kurtefilma *Ax* da îşaret û encamên vê yekê ne.




Wêne 8: Sehneyek ji filma *Ax ya Kazım Öz*

Piştî vê filmê ku mirov dikare wekî yekem kurtefilma kurdî li Tirkîyeyê bi nav bike, heta salên 2003yan di warê berhemînana kurtefilmên kurdî da pêşveçûneka berbiçav nîne. Lê di sala 2003 û 2004an da, bi organîzayona NÇMê, atolyeyên perwerdeya sînemayê li Diyarbekirê pêk hatin û di encama van atolyeyan da hindê kurtefilm û belgefilm hatin berhemînan. Li gorî Mehmet Aktaş di encama van atolye û semîneran da çar kurtefilmên kurdî yên wekî *Pervane* (Ahmet Soner, 2003), *Surun İki Yakası* (Mehmet İlyas Ünal, 2003), *Çekçek* (2003) û *Perde* ((?), 2003) hatine berhemînan (Aktaş, 2017: 64).¹³ Paşê di sala 2004an da, Ali Kemal Çınarê ku filmên xwe wekî filmên kurdî pênase dike, bi kurtefilma xwe ya bi navê *Bu Bir Cinayet Değildir* heta sala 2009an, hersal herî kêm kurtefilmekê, nêzikî deh kurtefilman berhem tîne.¹⁴ Ber bi dawîya salên 2010an ve bi zêdebûna derhênerên kurd , kurtefilmên kurdî jî zêde dibin.

¹³. Mehmet Aktaş beyan dike ku ev her çar film kurtefilm in. Lê digel ku me kurtefilma *Perdeyê* peyda nekir, kurtefilmên *Surun İki Yakası* û *Pervane* du kurtefilmên kurdî yên komediyê ne. Kurtefilma çarem ya ku Aktaş behsê dike *Çekçek*, belgefilmeka kurdî ya derbarê çekçek/hemalên Diyarbekirê da ye.

¹⁴. Di proseya berhevkirina film û daneyên lêkolînê da yek ji derhênerên ku me ligel kontakt girêdayî, Ali Kemal Çınar bû. Ali Kemal Çınar yek ji wan derhênerên kurd e ku hejmareka zêde kurtefilman berhem înanê. Lê belê, li gorî beyana Çınar, çar kurtefilmên wî wînda bûne û me li ser platformên online jî peyda nekirin. Digel kurtefilmeka



Grafîk 1: Hejmara kurtefilmên kurdî di navbera salên 1999-2018an da.¹⁵

Di sala 2006an da derhênerên wekî Mizgîn Müjde Arslan (*Son Oyun*), Arin İnan Arslan (*Sî û Ba*)¹⁶; di 2008an da Erol Mintaş (*Butîmar*); di 2009an da Aram Dildar (*Binevş*), Filiz Işık Bulut (*Deng*) û Bilal Çakay (*Salıncak*); di 2010an da Aziz Çapkurt (*Bêdengi*), Ercan Y Yılmaz (*Pace*), Ferit Karahan (*Beriya Tofanê*), Serhat Karaaslan (*Pisqilêt*), Diyar Bayram (*Raborî*) û Orhan İnce (*Dema ku Genim Dirijîn*) yekem kurtefilmên xwe berhem tînin.

ku navê wî nehat zanîn, kurtefilmên wî yên bi navê *Bu Bir Cinayet* Değildir (2004), *Ev* (2005) û *Duvar* (*Dîwar*, 2007) ne li ber destan in.

¹⁵. Hejmara kurtefilmên ku di grafîka jorê da hatine darîştin, bi hewleka zêde şexsî û di prosejeka dirêj da hatine berhevkerin û lêkdan. Lewma, ev grafîk îddia nake ku tenya ev kurtefilmên kurdî hene û ev ji sedî sed rast e. Helbet çendin sebebên vê yekê hene. Sebebê ewil yê vê aloziyê, nebûna lêkolînên derbarê sînemaya kurdî û platformeka online ya ku salane hejmar û îstatîstîkên kurtefilm û filmên kurdî bilav bike. Herwiha, aloziya pênasekirin û diyarkirina filmên kurdî ya ji ber nebûna nasnameyeka fermî ya derhênerên kurd ku li ser navê welatê xwe başdarî festîvalên filman bibin û xemsariya hindêk derhênerên kurd ku di proseya berhevkerin û diyarkirina kurtefilmên kurdî da bi çî awayî cewaba me nedan û em ji pêzanînen derbarê filmên xwe da mehrûm kirin. Tevî van astengî û aloziyan, me kurtefilmên berhevkerî li gorî du krîteran kategorîzekirin: Yek, ev kurtefilmên ku wekî kurtefilmên kurdî hatine diyarkirin ji aliyê derhênerên van filman ve jî wekî kurtefilmên kurdî hatine pênasekirin û ev derhêner filmên xwe di nav çarçoveya sînemaya kurdî da dibînin. Duyem, kurtefilmên ku me bi çî rengî nekarî em ligel derhênerên wan peywendiyê durist bikin û xwe bigehînin wan, yan zimanê wan kurtefilman (çî bi temamî û çî qismen) kurdî ne yan jî babeta filman derbarê kurdan da ye.

¹⁶. Li gorî lêkolîna me yekem kurtefilma honakî ku bi kurdiya zazakî/kirmanckî hatiye berhemînan, *Pera Berbangê* (Arin İnan Arslan, 2010) ye. Derhêner, di filma xwe da bi diyalogên karekterên kurmançixêv û zazakixêv cih dide her du zaraveyên kurdî. Herwiha di sala 1999an da Hüseyin Karabey bi belgefilma xwe ya bi navê *Boran* cih daye zaraveya zazakî/kirmanckî. Ji ber ku ev film ne honakî ye, yan jî niv-honakî niv-belgesel e (docu-drama) me derveyî lêkolîna xwe hêla.

Şaxên NÇMê yên ku li bajarên wekî Diyarbekir, İzmir, Mêrdîn hwd. ava bûyî, piştî atolyeyên perwerdeyê dest bi çêkirina filman dikin. Yekem filma Düzgün Aslan ya bi navê *Benda Tariyê* (2011) bi hevkarî û produksiyona hevpar ya ligel Yapım 13, Mezopotamya Sînema û Atolyeya Sînemayê ya Mezopotamyayê hate berhemînan. Derhênerên ku di sala 2011an kurtefilm berhem îname, zêdetir li ser meseleyên “polîtîk” yên li bajarên kurdan hûr bûne; Selim Akgül û Seren Gel bi yekem kurtefilma xwe *Mêrên Ji Avê Ditirsîn* bi bêdengî û neçariya karakterê Yılmaz Yalçın, tehekkûma eskerî ya li ser kurdan destnîşan dikin. Orhan İnce bi *Ali Ata Bak* meseleya perwerdeya tirkî ya mecbûrî û trawmaya li ser zarokên kurdan pêk hatî, Ferit Karahan bi referekirina xewna Hz. Yusuf, bi kurtefilma xwe *Xewna Yûsiv* behsa bîrên asîdê û “faîlên meçhûl” yên salên 1990î dike. Ömer Çakan bi *Barkê* behsa şer û pevçûna li bajarên kurdnişîn, valakirina gundan û koçberiya kurdan dike. Çetin Baskın bi *Gerayîşê* behsa çîrokeka şexsî ya windabûna xortekî û lêgerîna babê wî dike.

Bi nisbet salên 2011 û 2013an, ji aliyê hejmara kurtefilmên kurdî ve sala 2012an di tarîxa kurtefilmên kurdî da qonaxeka zor girîng e. Di sala 2012an da hem bi babetên nû û aktuel yên wekî rewş û pozîsyon û bikaranîna zimanê kurdî li qadên civakî li Tirkîyeyê, hem jî daxilbûna derhênerên jin di berhemînanê kurtefilmên kurdî da pir-rengiyek peyda dibe. Derhênerên jin yên wekî Roza Erizin, ku bi yarmetiya Konservatuara Aram Tîgran ya Şaredariya Diyarbekirê film derhênaye, di kurtefilma xwe *Defterê* da bi metafora defterekê behsa “faîlên meçhûl” dike. Dîsa yek ji derhênerên jin Adar Bozbay di kurtefilma *Bêziman da* behsa pîrejinê dike ku ji ber nezanîna tirkî û jêistifadenekirin û bêparmana wê ji xizmetên çak yên tendûristiyê li saziyên wekî nexweşxaneyan neçar dimîne. Derhênerên wekî Ferhat Ayebe bi *Lorîna Kewên Mirî*, bi metafora kewan behsa Jenosîda Helebçeyê dike. Dilşad Bayram bi kurtefilma *Diyarê Dilşad* ku filma anîmasyon e texeyyûla gund/diyarekî îdeal nîşan dide.

Dîsa di heman tarîxê da kurtefilma kurdîziman ya Rezan Yeşilbaş ya bi navê *Bêdeng*, bi Palmiyeya Zêrîn (Palme d’Or) li 65emîn Festîvala Fîlman ya Navnetewî ya Cannesê hate xelatkirin. Piştî Yılmaz Güney û Bahman Ghobadi, sêyemîn derhênerê kurd Rezan Yeşilbaş e ku Xelata Palmiyeya Zêrîn wergirt. Rezan Yeşilbaşê ku xelkê Diyarbekirê ye, li Zanîngeha Marmarayê beşa sînema û televîzyonê xwendiyê. Yeşilbaş, di çend filman da asîstaniya Zeki Demirkubuz kiriye û heyamekê jî bo kanala CNN Türkê belgefilm berhem îname. Yeşilbaş, ji ber paşxaneya xwe ya malbatî, ku ew bi xwe vê yekê dibêje, zêdetir karakterên jin di navenda

sînemaya wî da cih digirin, ku filmên berhem îrane yên wekî *Hüküm* (2008) û *Bêdeng* herdu kurtefilmên pêşîn yên zincîreya vê sêbareyê ne. Yeşilbaş, wekî nifşê nû yê sînemakarên kurd (bi taybet ew derhênerên kurd yên di serê salên 2010an da ji beşên sînema û ragihandinê derçûyî, li ser meseleyên polîtîk û aktuel yên wekî astengiyên bikaranîna zimanê kurdî li qadên civakî li Tirkîyeyê, hûr bûne) bi çîrokeka mînimalist behsa qedexeya axiftina kurdî li zindana Diyarbekirê ya sala 1984an dike.

Çîroka filma *Bêdeng* bi rêya cotek pêlavan, ku jinek dixwaze bo mêrê xwe yê zindanî bibe, behsa rewşa siyasî û civakî ya salên piştî Darbeya 1982yan li Diyarbekirê dike. Berî sehneya guhertina pêlavan di zindanê da, ku temamiya çîrokê li ser hatiye raçandin, wekî puxte û nîşaneyên polîtîkayên dewletê yên heyî, em li ser dîwarê zindanê slogana “*Türkçe konuş, çok konuş*” (Bi tirkî biaxive, zêde biaxive) dibînin. Yeşilbaş, bi nîşandana vê sloganê û hişyariya erkdarên zindanê ya derbarê axiftina bi tirkî da, qedexeya bikaranîna zimanê kurdî li qadên civakî û fermî destnîşan dike.



Wêne 9: Sehneyek ji filma *Bêdeng* ya Rezan Yeşilbaş

Piştî xelatkirina vê kurtefilma kurdî li festîvaleka meşhûr ya wekî Cannesê, berhemîna kurtefilmên kurdî nisbet bi salên berê, du qat zêdetir dibe (bnr. grafîk 1). Li gorî lêkolînên me,

heta vê gavê herî zêde di sala 2013yan da kurtefilmên kurdî hatine berhemînan. Mirov dikare vê zêdebûna kurtefilmên kurdî bi çendîn sebab û motîvasyonan rave bike: Pêvajoya Çareseriyê ji gelek aliyên ve li ser vê yekê tesîreka mezin kiriye. Bo nimûne, di vê dewra aram da ji aliyê Wezaretê Çandê û Serokatiya Daîreya Sînemayê ve gelek kurtefilmên kurdî hatine fînansekirin. Dîsa, girêdayî rewşa aram li bajarên kurdnişîn rêveberî û şaredarî ketin nav hewldanên piştevaniya derhênerên kurd. Di vê çarçoveyê da bi taybet li Diyarbekir û Wanê bi alîkariya şaredariyan, navendên çand û hunerê yê wekî Navenda Çanda Cegerxwîn û Navenda Çanda Nûdayê dest bi xebatên sînemayî kirin û festîvalên filman li dar xistin.

Hem pêkhatina tradîsyoneka di berehemînana kurtefilmên kurdî li Tirkîyeyê, hem jî perwerdeya derhênerên kurd di beşên sînema û ragihandinê da li zanîngehan û li kurs û atolyeyan, rê li ber berehemîna kurtefilmên kurdî ya salên 2010î vekir. Li gorî vê yekê:

2013: Bülent Öztürk (*Küçük Pencere Evler*) Özkan Küçük (Pepûk), Şerif Polat (*Bêdengiya Mirinê û Min Kuşt*), Musab Tekin (*Pêlav*), Mehmet Salih Demir (*Keliya Mêsan*), Gülistan Acet (*Bihuşt Zebesân û Li Benda Biharê*), Mazlum Demir (*Bê Re Deng*), Bilal Bulut (*Qêrîn*), Yakup Tekintangaç (*Qapsûl*) û Mustafa Yeşil (*Pêlekân*),

2014: Süleyman Karaaslan (*Zarokên Bênav*) û Nazif Coşkun (*Welat*),

2015: Tahsin Özmen (*Mast*), Mehmet Mahsum Akyel (*Zilan*), Dilan Toftik (*Neqş*), Muhammed Seyyid Yıldız (*Diyariyek*), Vedat Alınca (*Binhişt*) û Rüstem Sünmez (*Êş û Mûsik*),

2016: Bilal Korkut (*Ez Tusubasa me*), Nedim Rojhat Yeşilçınar (*Qemçurçî*), Ciwan Zengin (*Mara*), Muaz Güneş (*Hêk*), Ramazan Aygürt (*Dara Hinarê*), Sedat Barış (*Piyê Mi Toz Şeker*), Lütfü İrdem (*Cênîya Nêeysayî*), Vedat Oyan (*Mavera/Faili Meçhûl*), Eylem Onat û Helin Yıldırım (*Biyani*), Ruken Tekeş (*Hevêrk*) û Dinar Demir (*Ez û Ez*), Safet Ayhan (*Sarinca Zer*),

2017: Mervan Serhat Sarışın (*Xerîbî*), Hasan İnce (*Mirov*), Mehmet İsmail Çeçen (*Mij*), Sinan Arıkan û Sedat Benek (*Kevok*), Ramazan Kılıç (*Penaber*), Kadir Eman (*Baskên Şikestî*), Burhan Ateş (*Vîr*) û Rıdvan Yavuz (*Kuyu*),

2018: Boğaç Uzun (*Bizin*) yekemîn kurtefilmên xwe berhemînan.

1. 4. Peydabûna Sînemaya Kurdî li Tirkîyeyê

Sînemaya kurdî, di van bîst salên dawî da hem ji aliyê çawanî û hem jî ji aliyê çendetiye ve, li Kurdistana Başûr, Sûriye, Îran, Tirkîye û li dîsaporayê di nav geşedaneka berbiçav da ye. Sînemaya kurdî hem bi motîvasyon û dînamîkên muşterek -yên wekî arezûya derbirîna takekesî û aîdiyet û mesûliyeta hunermendane ya derhênerên kurd ya temsîlkerin û nîşandana kurdan di sînemayê da- hem jî bi motîvasyon û dînamîkên cihêreng -yên wekî şert û mercên polîtîk û aborî yên welatê ku derhênerên kurd lê niştceh in- tê berhemînan. Bo nimûne reform û çaksaziya derbarê sînemaya etnîkî li Îranê, bi gotineka din Fona Farabî, derfet û îmkanên baştir dane derhênerên kurd û rê li ber berhemînan filmên kurdîziman vekir (Sina, 2016). Ligel destkeftinên siyasî yên li Kurdistana Başûr û girêdayî vê yekê durîstbûna îmkanên çak yên ekonomîk hejmara filmên kurdî zêde bûn û festîvalên mezin yên wekî Festîvala Navdewletî ya Duhokê hatin lidarxistin.

Ligel bibîrxistina van şert û mercên cihêreng yên peydabûna sînemaya kurdî li Îran û Kurdistana Başûr, em ê behsa motîvasyon û dînamîkên peydabûn û geşbûna sînemaya kurdî li Tirkîyeyê bikin. Me dînamîkên peydabûna sînemaya kurdî li Tirkîyeyê di bin sê faktoran da dabeş kirine. Ev faktor wekî “tesîra sînemaya Yılmaz Güney û Bahman Ghobadi, NÇM û şaredariyên kurdî û subvansiyonên dewletê yên di dewra hikûmeta Adalet ve Kalkınma Partisi (AKP) da”.

Bi xelatkirina filma *Yolê* li festîvala Cannesê di sala 1982yan da, nav û derhêneriya Yılmaz Güney li dinyayê belav bû. Piştî çûna wî ya bo Fransayê, avêtina wî ya ji hemwelatîya Tirkîyeyê û axiftinên wî yên polîtîk/îdeolojîk û mukirhatina wî ya derbarê kurdayetiya wî da, bû wesîleya bêhtir nasîna wî di nav kurdan da. Ne tenê xelatkirina filma *Yolê* û fikrên îdeolojîk yên Yılmaz Güney, herwiha sînematografiya wî jî li ser sînemaya kurdî tesîr kir. Her wekî lêkolîna me jî îspat dike (bnr. grafîk 2) kurdûna Yılmaz Güney û serkeftinên wî yên sînemayê yên beynelmîlêl bû motîvasyonê berhemînan sînemayê ya derhênerên kurd yên peyrew. Bo nimûne derhênerê kurtefilma *Bêdeng* Rezan Yeşilbaş, behs dike ka fîgûr û derhêneriya Yılmaz Güney çawa ji bo wî bûye prototîp û motîvasyonê (Yado, 2014). Hebûna Yılmaz Güney û sînemaya wî, ne tenê ji bo derhênerên kurd yên li Tirkîyeyê, di heman demê da ji bo derhênerên kurd yên li gelek cih û deverên cihêreng jî motîvasyonêka karîger e û heta sînemaya cîhanê jî car caran sînemaya Yılmaz Güney referê dike. Mesela, derhênerê meksîkî, Alejandro Gonzalez Inarritu, ku wekî

heyranekî Yılmaz Güney û filma wî *Yol* (bi taybet sehneya kuştina hespî) tê zanîn, di filma xwe ya bi navê *Revenant* (2015) da, ku Leonardo Di Caprio di sala 2016an da li Oscarê xelata baştirîn aktorê filmê wergirt, sehneyeka hespê heye ku feyza xwe ji filma *Yol* ya Yılmaz Güney wergirtiye. Inarritu derbarê tesîra filma *Yolê* da dibêje “cara ewil, wextê ku min filma Yılmaz Güney ya bi navê *Yol* (1982) temaşê kirî, min xwest bi sînemayê ra mijûl bibim, bi rastî ez mutesîrê vê filmê bûm, tê bîra min” (Memişoğlu, 2018).


Tesîra Yılmaz Güney û filmên wî li ser gelek derhênerên kurd çêbûye û bo nimûne Şewket Emin Korki ku derhênerê kurd yê ji Kurdistana Başûr e, di destpêka filma xwe ya bi navê *Bîranînên li Ser Kevirî* (2014) da behsa kurdîbûna filma *Yolê* dike û çend sehneyên ji filma *Yolê* nîşan dide. Korki, bi bicihkirina çend sehneyên filma *Yolê* di nav filma xwe da dixwaze hem tesîra filmên Yılmaz Güney li ser berhemînana filmên kurdî nîşan bide hem jî dixwaze xwe bi tradîsyona sînemaya kurdî ve girê bide. Derhêner bi vê hewla xwe, filma *Yol* wekî filmeka kurdî destnîşan dike.

Dîsa yek ji filmên kurdî ku behsa tesîra sinemaya Yılmaz Güney dike, filma Ali Kemal Çınar ya bi navê *Kurtefilm* (2013) e. *Kurtefilm*, behsa zehmetiyên nexweşiya bawesîra Ali Kemal (Ali Kemal Çınar) û pevçûna wî ya ligel malbatê dike. Babê Ali Kemal (Seyithan Çınar) behsa temeşkirina hemû filmên Yılmaz Güney, heqîqeta filmên wî dike. Seyyithan Çınar, bi ser destnîşankirina heqîqetan ra pesnê filmên Yılmaz Güney dide û dibêje ku, herkes ji ber vê xusûsiyetê ji filmên Yılmaz Güney hez dike. Piştî axiftina Seyyithan Çınar, li ser ekrana komputera Ali Kemal wêneyekî Yılmaz Güney xuya dike ku wê gavê Ali Kemal gotina babê xwe ya derbarê heqîqeta filmên Yılmaz Güney, bi heqîqeta nexweşiya xwe ya bawesîrê ve girê dide.

Ji bo ronîkirina danûstandina di navbera derhênerên kurd da, me di pirsyarnamaya xwe da (bnr. grafîk 2) cih da pirsêka bi vî rengî: Tesîra sînemaya derhênerên kurd. Me navê 18 derhênerên kurd yên ji Îran, Kurdistana Başûr, Sûriye, Tirkiye û li dîasporayê wekî bijarde danan. Navên van derhêneran li gorî balans û hev kêşeya zayenda derhêneran û çêkirina filmeka kurdî ya dirêj yan jî belgefilmeka derhêneran hatine hilbijartin. Ev pirsêka ku ji sê bijardeyan pêk tê, li gorî asta tesîra derhêneran (yekemîn, duyemîn û sêyemîn) li ser agahîderan û bi taybet agahîderên ku kurtefilm berhem îname, hatiye amadekirin. Herçiqas 40 agahîder beşdarî pirsyarnamê bibin jî, 37 agahîderan bersiva bijardeya yekemîn daye. Ji van 37 kesan, 24 (% 64.8) agahîderan beyan kirine ku di rêza yekemîn da tesîra sînemaya Yılmaz Güney li ser wan çêbûye. Agahîderên mayî

ji rêzê ve, 11 (%29.7) Bahman Ghobadi, 1 (%2.7) Hisham Zaman û 1 (% 2.7) jî beyan kirine ku tesîra Ali Kemal Çınar li ser wan çêbûye.

Di rêza duyem da 34 agahîder beşdarî pirsyarnamê bûne. Ji van 34 agahîderan 17 (%50) Bahman Ghobadi, 5 (%14.7) Yılmaz Güney, 3 (%8.8) Hiner Saleem, 2 (%5.8) Hisham Zaman, 2 (%5.8) Şewket Emin Korki, 2 (%5.8) Hussein Hasan, 1 (%2.9) Kazim Öz û 1 (%2.9) jî Yüksel Yavuz beyan kirine ku tesîr li ser wan kiriye. Di rêza sêyem da jî 28 agahîder beşdarî pirsyarnamê bûne ku 7 (%25) Hiner Saleem, 5 (%17.8) Kazim Öz, 4 (%14.2)



Grafîk 2: Herî zêde sînemaya kîjan derhênerê/a kurd li ser te tesîr kiriye (bi %)

Yılmaz Güney, 4 (%14.2) Bahman Ghobadi, 3(%10.7) Hisham Zaman, 2 (% 7.1) A. K. Çınar, 1 (%3.5) Yüksel Yavuz û 1 (%3.5) jî Erol Mintaş hîlbijartine ku tesîr li wan kiriye. Herwekî ji grafîk 2ê jî tê fêhmîkirin, tesîra Yılmaz Güney li ser derhênerên kurd zor diyar e û nêzikî temamiya derhênerên (ji 40 agahîderan, 33 agahîder, % 85.2) ku beşdarê pirsyarnamê bûyî, beyan dikin ku tesîra Yılmaz Güney li ser wan heye. Di rêza duyem da jî navê Bahman Ghobadi derdikeve pêş ku derhênerên kurd di bin tesîra wî da mane.

Xala muşterek ya van herdu derhênerên kurd ew e ku herdu jî xelatgirên Festîvala Cannesê ne û wekî du derhênerên navdar di nav derhênerên kurd da tene nasîn. Daneyeka dî ya

belkêş ew e ku, digel ku ji 40 agahîderan 7 (%17) agahîderên pirsyarnamê jî bûn, çî tesîra derhênerên jî yê kurd li ser wan çênebûye û zêdetir di bin tesîra filmên derhênerên mêr da mane.

Li gorî daneyên grafîk 2ê û nimûneyên li jorê, Yılmaz Güney û sînemaya wî tesîr li ser derhênerên kurd yê peyrew kiriye û ji bo wan bûye çavkaniya motîvasyona berhemînanan sînemaya kurdî. Xelatdana li ser navê Yılmaz Güney ya festîvalên muxtelîf yê li Tirkiyeyê û lidarxistina festîvalên filman (bi taybet festîvalên filmên kurdî yê wekî Festîvala Yılmaz Güney ya Batmanê û Festîvala Duhokê ya Navdewletî –ku her sal di roja wefata Yılmaz Güney da dest pê dike) nîşan û emareyên vê tesîrê ne.

Piştî tesîra sînemaya Yılmaz Güney li berhemînanan filmên kurdî, niha em ê li ser dînamîkên din yê peydabûn û geşedana sînemaya kurdî ya li Tirkiyeyê hûr bibin. Di vê çarçoveyê da duyemîn dînamîk û faktora geşbûna sînemaya kurdî li Tirkiyeyê NÇM û şaredariyên kurdnişîn in ku roleka muhîm gêrane di geşedana sînemaya kurdî da. Tevî ku xebatên NÇMê bi ekîpmanên kevn û bi ruhekî amatorane dest pê kirin, bi berhemînanan film û vîdeoyên curbicur û lidarxistina atolyeyên sînemayê bo nîfşên nû yê kurd, yekeya sînemayê ya NÇMê di di destpêkirina sînemayeka kurdî ya netewî da bû alîkar” (Koçer, 2014). Tecrûbeyê NÇMê ya di berhemînanan sînemaya kurdî da yekemîn pêngava dezgehî û çalakiya komek aktîvîstên hunerî ye. Bi awayekî çalak, tecrûbeyê NÇMê ya berhemînanan filmên kurdî roleka girîng gêra di destpêkirina sînemaya kurdî li Tirkiyeyê. NÇM, hem ji bo nîfşê nû yê derhênerên kurd, hem jî di berhemînanan filmên kurdî da xwedî cihekî girîng e. Çunkî derhênerên kurd yê wekî Kazım Öz û Hüseyin Karabey, ku nasrav in li Tirkiyeyê, derçûyiyên NÇMê ne û kurtefilm û belgefilmên xwe yê ewil bi saya tecrûbeyê NÇMê berhem înan. NÇMê ligel şaxên xwe yê li bajarên wekî Îzmîrê, zêdetirî 20 kurtefilm û belgefilmên kurdîziman û tirkîziman berhem înane. Herwiha di salên 2003 û 2004an da li Diyarbekirê Atolyeya Sînemayê ya Diyarbekirê (DAS) (Diyarbakır Sinema Atölyesi) 24 kes perwerde kirin û di encama vê perwedeyê da 8 belgefilm û kurtefilm hatine berhemînan (Kamera Arkası, 2010). Piştî tecrûbeyê NÇMê, şaredariyên bajarên kurdnişîn di berhemînan û pêşvebirina sînemaya kurdî da bû meydana. Bi taybet piştî salên 2010an, şaredariyên Diyarbekir, Wan, Batman hwd. di xuyabûn, danasîn û piştevaniya filmên kurdî da roleka girîng gêran. Bi sponsoriyên Şaredariya Mezin ya Diyarbekirê, Navenda Hunerê ya Diyarbekirê û bi piştevaniya konsolxaneyê Swîsreyê, di navbera 4-13ê Berfanbara 2009an yekem

car Konferansa Sînemaya Kurdî ya Navnetewî hate lidarxistin. Di vê konferansê da ku akademîsyenên muxtelîf û derhênerên kurd beşdar bûbûn, bi du rûniştinan nîşandan û goftûgoya şeş filmên kurdî ji şeş cografyayên cuda bi rê ve çû. Di rûniştina yekem ya konferansê da derbarê babeta “wek pîrsekê sînemaya kurdî” û di rûniştina duyem da jî babeta “bicihkirina sînemaya kurdî” hate mînaqêşkirin. Digel vê konferansa sînemayê, bi taybet piştî salan 2010an li Diyarbekir, Wan û Batmanê festîvalên filman hatin li dar xistin. Di sala 2010an da, bi rêxistina Komeleya Akademiya Sînemayê ya Rojhilata Navîn (KASR) û bi sponsorî û piştevaniya şaredariya Batmanê Festîvala Kurtefilmên Kurdî ya Yılmaz Güney dest pê kir. Festîvala ku 2018an da cara heftemîn pêk hat, hem di geşedan û motîvasiyona berhemînana kurtefilmên kurdî da hem jî di danasîn û xuyakirina filmên kurdî da roleka serekî digêre. Dîsa, bi rêxistina KASRê û bi sponsorî û piştevaniya Şaredariyên Diyarbekir û Wanê, Festîvala Navnetewî ya Filman a Amedê (2012) û Festîvala Filman a Axtamara Wanê (2014) dest pê kirin. Ev hewl û pêngavên çandî û hunerî, bi nîşandan û goftûgoyên derbarê sînemaye kurdî da hem rê li ber bêhtir nasîna sînemaya kurdî û xuyabûna wê li bajarên kurdnişîn vekir, hem jî bi xelatkirina hindêk projeyên filmên kurdî di van salan da bû wesîleya zêdetir berhemînana sînemaya kurdî.

Wekî dînamîzmeka serdemê polîtîkayên siyasî, çandî û hunerî yê hikûmetên Tirkiyeyê, li ser geşedan û xuyabûna sînemaya kurdî li Tirkiyeyê diyarker in. Di dewra hikûmeta AKPê da, bi pêvajoya kurdî û berdewama wê Pêvajoya Çareseriyê (Barîş Süreci), di navbera salên 2009-2015an da, nisbet bi salên berê rewş û atmosfereka aram pêk hat ji bo meseleya kurdî li Tirkiyeyê. Bi taybet di sala 2011an da, piştî destpêkirina hevdiştin û muzakereyên siyasî yê di navbera siyaseta kurdî û hikûmeta AKPê da ligel pêkhatin û duristbûna atmosfera aram tesîra xwe li ser warên çandî û hunerî jî kirin. Di vê qonaxê da, nisbet bi salên berê gelek kurtefilm û filmên dirêj yê kurdî bi subvansiyonên Wezareta Çandê ya Tirkiyeyê hatin berhemînan. Ligel hejmareka zêde ya kurtefilmên kurdî, gelek filmên derhênerên kurd li Tirkiyeyê hatine finanskirin, ku ev derhêner nasrav in di nav bînerên sînemaya kurdî û yê biyanî da. Di navbera salên 2012-2017an da filmên dirêj yê wekî *Dengê Bavê Min* (Orhan Eski Köy, 2012), *Cennetten Kovulmak* (Ferit Karahan, 2013) *Klama Dayîka Min* (Erol Mintaş, 2014), *Were Dengê Min* (Hüseyin Karabey, 2014) *Rauf* (Soner Caner û Barîş Kaya, 2016) *Biryareke Zor* (Ender Özkahraman, 2017) û *Zer* (Kazım Öz, 2017) ji wan filmên kurdî yê finanskirî ne li Tirkiyeyê.

1.4.1. Minaqeseyên Ontolojîk Derbarê Sînemaya Kurdî da

Zêdebûna hejmara filmên kurdî li Îran, Kurdistana Başûr, Tirkîye û li dîasporayê û xelatkrina hindêk ji van filman li festîvalên navnetewî û yê xwedî prestîj, bû wesîleya nîqaş û goftûgoyan û rê li ber lêkolînên zanistî yê derbarê sînemaya kurdî da vekir. Ji ber nebûna dewleteka kurdî, girêdayî vê yekê bêparmana derhênerên kurd ji nasnameyeka fermî ya kurdî, minaqeseyên derbarê pênamekirina filmên kurdî û ontolojiya sînemaya kurdî da aloztir dikin.

Ji ber gelek sebebên muxtelîf yê siyasî û tarîxî, derbarê tarîx û ontolojiya sînemaya kurdî da gelek minaqese û boçûnên cîyawaz hene. Bi arezûya duristkirina kevnetarîxekê ji bo sînemaya kurdî, nivîsîn û belavkirina hindêk pêzanîn û me'lûmatên "dûrî rastiyê" yê derbarê yekemîn filma kurdî/destpêka sînemaya kurdî da ji terefê hindêk sînemakar û tarîxnasên kurd ve, rîska têkvedan û şêlûkirina tarîxa sînemaya kurdî dihewîne (Özdil, 2014). Minaqeseyên derbarê destpêka tarîxa sînemaya kurdî da bi taybet li dor van her du filmên biyanî tîn kirin: *Grass: A Nation's Battle for Live* (Merian C. Cooper û Ernest B. Schoedsack, 1925) û *Zarê* (Hamo Baknazaryan, 1926). Filma *Grassê* ku bi derhêneriya du amerîkiyan hatiye berhemînan, behsa koçberî û sefera eşîreta Bextiyariyan ji Angora (Enqere) berev çiyayên Zagrosê dike. Jiyana koçberî û sewalvaniya eşîreta Bextiyariyan, ku Bextiyarî wekî eşîreka kurdan li Îranê tê zanîn, bûye babeta filma her du derhênerên amerîkî yê ku bi filma xwe *King Kong* (1933) navdar in. Bülent Gündüz derbarê filma *Grassê* da nivîsekê bilav dike û îddia dike ku ev film reng e bibe yekemîn filma kurdî (Gündüz, 2012). Gündüz, bi vê îddiaya xwe tarîxa sînemaya kurdî ji sala 1925an dide destpêkirin. Îddia û minaqeseyên derbarê yekemîn filma kurdî da tenê bi vê îddiyê ve sînorkirî nînin. Herwiha Rohat Alakom jî derbarê yekemîn filma kurdî da goterekê belav dike û dide zanîn ku filma derhênerê ermenî Hamo Baknazaryan ya bi navê *Zarê* (1926) yekemîn filma kurdî ye (Alakom, 2017). Qenaeta giştî di nav hindêk tarîxnas û lêkolerên sînemaya kurdî da ew e ku yekemîn filma kurdî, filma derhênerê ermenî Hamo Baknazaryan *Zarê* (1926) ye (Alakom, 2017; Rosebiani, 2019). Filma *Zarê*, evîndariya Seydo (Hrachia Nersisyan) û *Zarê* (Maria Tenazi) û nerazîbûna Temûr Beg (Michael Garagesh) a li hember evîna wan û kuştina Temur Beg ya ji aliyê birayê Seydo ve vedigêre. Filma ku li gundên Elegezê hatiye kêşan, ji çîroka *Qedera Zarê* hatiye adaptekirin (Alakom, 2017).

Îddiyên lêkolînerên navhatî yê derbarê kurdîbûna filma *Zarê* û *Grass* da ji nezereka objektîf û pisporane zêdetir, meyleka hestiyarî û arezûya duristikirina kevnetarîxekê ji bo

sînemaya kurdî nîşan dide. Ev her du film, ji yekem filmên kurdî/destpêka sînemaya kurdî zêdetir, dikarin bibin filmên pêşîn ên derbarê kurdan da ku ji aliyê derhênerên biyanî ve hatine berhemînan. Herwiha, ev her du film dikarin bibine du belgeyên dîtbarî û girîng derbarê jiyana kurdan a sed sal berî niha ji bo sosyolojî û antropolojiya kurdan (Özdil, 2013: 257-9).

Wekî encama serkeftina filmên kurdî li festîvalên mezin yê ewrûpayê û xuyabûna filmên kurdî di dehsaleya borî da lêkolînên zanistî yê derbarê sînemaya kurdî da jî dest pê kirin. Ligel destpêkirin û belavbûna lêkolînên zanistî yê sînemaya kurdî, boçûn û pênasayên mînaqeseyî yê derbarê sînemaya kurdî û pênasikirina filmên kurdî da jî derketine meydanê. Em ê li jêrî cih bidine hemî aliyên cihêreng yê mînaqese û pênasayên sînemaya kurdî yê ku bi rengekî hevterîb ligel zêdebûna filmên kurdî hatine kirin. Wextê pênasê û mînaqeseyên derbarê sînemaya kurdî da tîn raçavkirin, nisbet bi pênasayên din, pênasaya zelaltir bo sînemaya kurdî ji aliyê Yılmaz Özdil ve hatiye kirin: “Sînemaya kurdî, ji wan filman pêk tê ku ji aliyê derhênerên kurd ve hatibin kêşandin, zimanê wan bi tevahî (intégralement) an jî bi giştî (principalement) bi kurdî be û mijara wan li ser kurd û Kurdistanê be” (Özdil, 2014). Herwiha, Yılmaz Özdil beyan dike ku du paradoksên ku ji pirsgirêka kurdî dizên, derdikevin pêşiya sînemaya kurdî:

“Paradoksa yekê ev e: Sînemaya kurdî, wekî sînemaya gelekî bindest, ji sînemayên netewî yê gelên serdest zêdetir pêwîstî bi piştgirîya finansman û saziyên dewletî heye. Berevajî sînemayên neteweyî, sînemaya kurdî ne xwedî temaşevan e, ne xwedî bazar e, ne jî xwedî nasnameyeke fermî ye. Her wisa ji ber nebûna bazar û temaşevanên kurd, ew nikare, wekî dezgehên din ên ragihandin û xwe-îfadekirinê jî, hebûna xwe bi *temamî* bi hebûna bizavên siyasî yê kurd ve girê bide. Ev kêmasiyên aborî bandoreke mezin li ser naveroka filmên kurdî dikin û gelek çarvan derhênerên kurd mecbûrî lêgerîna “çîrokên sivik” dikin ku çêker û temaşevanên “ne-kurd” nikarin û naxwazin filmên kurdî çêbikin û temaşe bikin. Paradoksa duyem jî ev e: Sînemaya kurdî, heya vê gavê armanca hebûna xwe, wekî eşkerekirin û nîşandana “kurdîni”yê destnîşan kiriye. Yanî mîsyona sereke ya sînemaya kurdî şikandina *kodên politîk yê veşartina kurdîniyê* (7) ye. Lê, mixabin di halê hazir de, filmên derhênerên kurd ku mirov bikare di bin navê sînemaya kurdî de analîz bike, bixwe ji aliyê wan kodan ve hatine dorpêçkirin û veşartin” (Özdil, 2014).

Ali Fuat Şengül jî derbarê mînaqese û goftûgoyên pênasikirina sînemaya kurdî da gotarek belav kiriye û Şengül, ji pênasikirineka qet’î ya sînemaya kurdî zêdetir, li ser aliyên hewcedarî û îmkanên wê hûr dibe. Şengül, ji hewcedariya pênasikirina ontolojiya sînemaya kurdî zêdetir, hewcedariya pênasikirina sînemaya kurdî di nav çarçoveya sînemaya netewî û netewebuhêr

(transnational) da rave dike (Şengül, 2013). Herwiha, ontolojiya sînemaya kurdî bi ser parametre/pêkhateyên eleqedar yên wekî “kurd hene yan na?” yan jî “kurdî zimanek e yan na?” ra rave dike û dibêje ji ber demodebûna sînemaya netewî, globalîzasyon û tecrûbeyên dîasporîk û sûrgîniya derhênerên kurd, sînemaya kurdî şiklekî transnational wergirtiye (Şengül, 2013).

Li gel van pênase û şîroveyan jorê û tecrûbeyên xweyanî yên li Kurdistana Başûr, li Tirkîye, Îran û ligel tecrûbeyên derhênerên kurd yên dîasporîk û sûrgîniyê, her çiqas ji dezgehên dewletî û subvansiyoneka dewletî bêpar be jî, ji ber vêgerana çîrokên girêdayî çanda kurdî û bikaranîna zimanê kurdî wekî pêkhata nasnameya kurdî mirov dikare yekûna filmên kurdîziman ku ji aliyên derhênerên kurd ve hatine berhemînan di bin navê “sînemaya kurdî” da bi nav bike.

1.4.2. Rola Zimanê Kurdî di Pênasekirina Sînemaya Kurdî da

Piştî çakbûna şert û mercên siyasî û serbestiya berhemînan kurdî li Tirkîyeyê û ligel fêrbûna hunera sînemayê ya derhênerên kurd li Tirkîyeyê, perwerdebûna derhênerên kurd li welatên ciyawaz di warê hunera sînemayê da û tecrûbeyên dîasporîk ya wan derhêneran, bi taybet piştî 2000î berhemînan kurtefilmên kurdîziman zêde bû. Pirraniya van filmên ji aliyê derhênerên kurd ve hatine berhemînan kurdîziman in. Zimanê kurdî di pênasekirina filmên kurdî û diyarkirina sînorên nasnameya sînemaya kurdî da roleka çawa digêre? Bigotîneka din zimanê kurdî çawa dikare li ser pênasekirina sînemaya kurdî karîger be?

Ji ber konteksta polîtîk ya zimanê kurdî li Kurdistana Başûr, Îran, Sûriye û bi taybet li Tirkîyeyê, berhemînan filmên kurdîziman rê li ber mînaqêşeyên ontolojiya sînemaya kurdî vekir. Yanê, hevterîbî û peywendiyek heye di navbera mînaqêşeyên ontolojiya sînemaya kurdî û tarîxa bikaranîna zimanê kurdî di filman da. Di vê çarçoveyê da gava hewla pênasekirina filmekê tê dayîn, baldariya mezin li ser bikaranîna zimanê kurdî ye di wê filmê da. Bo nimûne, goftûgoyên ku li ser kurdînebûna filma *Zarê* tên kirin, zêdetir xwe dispêrine zimanê wê filmê –ku di wê serdemê da sînema hêşta negehiştû dengî û dewra filmên bêdeng bû- ka kurdî ye yan zimanekî di ye? Herwiha ev goftûgo ji bo filmên Yılmaz Güney jî tên kirin. Îddia û lêkolînên ku sînemaya Yılmaz Güney (bi taybet ew filmên wî yên ku angajeyî meseleyên polîtîk û kurdan in) di bin banê sînemaya kurdî da dinirxînin, balê dikêşine ser şert û mercên polîtîk yên salên 1980yî û astengiyên berhemînan filmên kurdîziman yên Yılmaz Güney.

Derhênerên kurd yên ji Îranê yên wekî Bahman Ghobadi, Hiner Saleem, Shahram Alidî, Taha Kerîmi, Setar Çemeni Gol, Hiwa Amini Nejad û Babek Amini; ji Tirkîyeyê Kazım Öz, Hüseyin Karabey, Erol Mintaş, Orhan Eskiköy, di van salên dawî da Ali Kemal Çınar û Mehmet Ali Konar; ji Kurdistana Başûr Şewket Emin Korkî, Hussein Hasan, Sahim Omar Kalifa, Jano Rosebiani û Solin Yusiv, ji dîasporê Miraz Bêzar, Yüksel Yavuz, Hüseyin Tabak, Ayşe Polat, Hisham Zaman, Jalal Jonroy, Mano Khalil hwd. derhênerên nasraw yên kurd in ku di berhemînanana filmên kurdîziman û belavbûn û nasîna filmên kurdîziman da roleka girîng gêrane. Lê bi taybet di vê em bi bîr bînin ku tesîra filmên Bahman Ghobadi li ser danasîn û xuyabûna sînemaya kurdî gelek e. Bi gotina Devrîm Kılıç xelatkirina filma *Dema Hespên Serxweş* ya Bahman Ghobadi li Cannesê bi xelata Kameraya Zêrîn, bi taybet li ewrûpayê û dinyayê bû wesîleya destpêkirina bikaranîna têgehên wekî “derhênerê kurd”, “filma kurdî” û hetta “sînemaya kurdî” (Kılıç, 2017).

Bikaranîna zimanê kurdî di filmên kurdî da bi rêya kurdîaxêviya karakteran û bikaranîna muzîka kurdî di filman da, li ser naveroka filmên kurdî tesîrê dike. Bi gotineka din, bicihkirin û bikaranîna zimanê kurdî di filmên kurdî da peywendiyeka surîştî durist dike di navbera naverok û karakterên filmên kurdî da. Bo nimûne, kurdîaxêviya yan jî (bi awaykî mecbûrî) kurdîaxêviya karakterên filma Rezan Yeşilbaş ya bi navê *Bêdeng*, ku li ser babeta rewşa bikarneînana zimanê kurdî ye li qadên civakî yên li Tirkîyeyê, tesîrê li ser naveroka filmê dike û filmê di nav vê çarçoveyê da ava dike. Hem bi tespîta Yılmaz Özdil ya derbarê sînemaya kurdî da ku dibêje “mîsyona sereke ya sînemaya kurdî şikandina *kodên politîk yên veşartina kurdîniyê ye*” û hem jî bi tespîta Edward Said ya *dazwaza xuyabûnê* (Dabaşî, 2009) ku derbarê sînemaya Fîlîstînê da ye-ku dikare ji bo sînemaya kurdî jî bête gotin, bikaranîna zimanê kurdî di filmên kurdî da bi erka şikandina kodên politîk yên veşartina kurdîniyê û deşîfrekirina kodên kurdîniyê dibe amrazekî serekî. Lewma, bi taybet di filmên kurdî yên li Tirkîyeyê da, zimanê kurdî ji pêkhatayeka surîştî ya filmîk zêdetir, gelek caran bi erka nîşandan û deşîfrekirina kodên kurdîniyê tê bikaranîn. Herwiha, pêkve-bikaranîna zimanên kurdî û tirkî -bi taybet filmên kurdî yên li Tirkîyeyê- di hindêk filmên kurdî da, di nav diyalektîka paşxaneya tarîxî û serencama nîşandana asîmîlasyonê li Tirkîyeyê divê bête dîtin. Zimanê tirkî wekî amrazekî asîmîlasyonê, ji bo avakirina dijberiya zimanê kurdî gelek caran ligel kurdî, pêkve tînin bikaranîn. Nemaze ev tercîha bikaranîna pêkve ya kurdî û tirkî, di kurtefilmên kurdî yên nîşên ciwan da heye ku di dehsaleya borî da li Tirkîyeyê hatine berhemînan.

Herçiqas rêjaya bikaranîna zimanê kurdî di filmeka kurdî da ji sedî sed nebe jî, ji ber sebabên ku me li jorê behsê kirî; ji bo avakirina pevçûn û diyalektîka di navbera kurdî û tirkî da û paşxaneyê tarîxî ya li Tirkiyeyê, bikaranîna tirkî di hindêk filmên kurdî da wekî destnîşankirina şikandina kodên polîtîk yê kurdîniyê dikare bête dîtin. Wekî encama vê yekê, bikaranîna zimanê kurdî di filmên kurdî da wekî pêkhatyekê hem naverokê hem jî karakteran domîne dike û xwe ji sînemayên gelên serdest cuda dike û zimanê kurdî di pênasekirina sînemaya kurdî da roleka serekî digêre.

1.4.3. Zimanê Kurdî Wekî Objeya Sansûrê

Şeş sal piştî daxilbûna hunera sînemayê li nav sînoren Osmanî, ji sala 1920an vir ve, li Tirkiyeyê bi awayekî resmî sansûr li ser film û senaryoyên filman heye. Digel ku çendîn caran naverok û forma qanûn û rêzîknameyên derbarê sansûrê da guherîbin jî, armanca serekî ya sansûra li Tirkiyeyê rêlibergirtina film/berhemên li dijî exlaqê civakê, propagandaya li dijî yekitiya dewletê û muhefezekirina zarokan ji naveroka filmên şedîd û cinsiyetparêz hwd. e. Di vê çarçoveyê da, di tarîxa sînemaya tirkî da gelek film hatine sansûrkirin. Bi taybet ji salên 1980î ve ji ber zêdebûna filmên polîtîk rêjeya filmên sansûrkirî jî zêde bûne û filmên Yılmaz Güney yê wekî *Sürü*, *Umut* û *Yol* ji wan filman in ku ji ber sebabên muxtelîf hatine sansûrkirin. Ji dawiya salên 1990î û heta îro filmên ku tene sansûrkirin gelek ji wan filmên kurdî ne. Digel ku pîrrianiya filmên kurdî ji ber naveroka wan ya polîtîk tene sansûrkirin, li xwarê em ê lê bikolin ka filmên kurdî ji ber kurdîbûna zimanê wan tene sansûrkirin yan na? Bi gotineka din, kurdîbûna zimanê filmekê dikare bibe sebê sansûrkirina wê?

Belgenameya Karkirina Berhemê (Eser İşletme Belgesi) (BKB) bi wateyeka dî heyeta sansûrê ye ku bi îcazeta heyetê, piştî temaşekirin û guncaviya filmê, BKB bo derhêner yan jî çêkerê filmê tê dayîn. Lewma gelek derhênerên kurd hem ji ber kurdîbûna zimanê filma xwe hem jî ji ber naveroka filma¹⁷ xwe naxwazin serî li vê belgenameyê bidin. Ji ber vê yekê, gava serî li festîvalên filman didin, gelek festîval daxwaza vê belgenameyê ji derhênerên kurd dikin. Bi vê

¹⁷. Derhênerê kurd Kazım Öz, tevî ku filma wî *Zer* (2017) ji aliyê Wezaretê Çandê ve hate fînansekirin, ji ber naveroka filmê, ku behsa Terteleya Dersimê/38ê dike, çend sehneyên filmê jê hatine derxistin. Kazım Öz jî, ji bo protestokirina vê sansûrê ew sehne reşkirin ku ji aliyê heyeta sansûrê ve hatibûne sansûrkirin. Piştî vê protestokirinê belgenamaya karkirina berhemê ya *Zerê* hate betalkirin û li şûna ku filma *Zer* li 100 holên sînemayê bê nîşandan, bi tenê li 11 holên sînemayê hate nîşandan. Öz, yek ji wan derhênerê kurd yê li Tirkiyeyê ye ku herî zêde tûşî sansûrê hatiye.

awayî rê li ber filmên kurdî bo festîvalên li Tirkiyeyê tê girtin. Di vê pêngava ewil da, rêgiriya filmên kurdî bo festîvalên li Tirkiyeyê tê kirin. Pêngava duyem ya sansûrkirina filmên kurdî -çi ji ber naverokê çi jî ji ber zimanê filmê- elemînasyona festîvalên filman e. Ji ber ku festîval sebebên elemînasyona filman bi awayekî fermî îlan nakin, nayête zanîn ka ji ber kîjan sebebên filmên hilbijartin yan jî nayên hilbijartin. Ev alozî jî dibe sebeb ku hindê derhênerên kurd, ku filma wî/wê ji ber lawaziya estetîk û çîroka filmê bo festîvalan nehatiye hilbijartin, vê çendê bi “polîtîkbûn”, “kurdîbûn” û “kurdîzimanbûn” a filma xwe ve girê bidin.

Gelek festîvalên filman li Tirkiyeyê, ji ber hissiyatên xwe yê îdeolojîk cih nadine nîşandan û pêşbaziya filmên kurdî. Herçend ev rewş li gorî salan guherbar jî be, meyla serdest ya domdar her bi vî awayî bûye. Ji aliyê din ve diyarnekirina sebeb û krîterên nîşandan yan jî nîşan-nedana filmên kurdî li festîvalan, mecalê nade ku mirov bizane ji ber naverok, ziman yan jî estetîk/çîroka filmê hate nîşandan yan jî nîşan-nedan. Lewma diyarkirin û piştrastkirina sansûra li ser filmeka kurdî ji ber kurdîbûna zimanê wê filmê ne zelal e. Çunkî belgenamayên ku vê îddiyê piştrast bikin, berdest nînin. Di çarçoveya vê lêkolînê da em li pey mesela sansûr û zimanî jî ketin û di pirsyarnameya xwe da li ser vê babetê me pirsyarek ji agahîderan pirs kir. Hinek agahîderan derbarê meseleya sansûr û zimanî da agahiyên qanîhker pêşkêş kirin ku vê îddiaya me qismen piştrast dike (bnr. grafîk 11).

BEŞA DUYEM: METODOLOJÎ Û BERHEVKIRINA DANÉYAN

Bi armanca îstifadekirina ji motîvasyon û sebebên bikaranîna kurdî ya agahîderan di kurtefilmên xwe da û berhevkirina daneyan ji meydana lêkolînê, hewcedarî bi duristkirin û sepandina pirsyarnamêyê hebû. Lewma, ev pirsyarnamê bi van armancan hate sepandin. Em dê di vê beşê da cih bidine awayê berhevkirina daneyên lêkolînê û metodolojiya pirsyarnamêyê. Bi gotineka din; em ê van hemû aliyên pirsyarnamêyê yek bi yek rave bikin: Pêşkêşiya pirsyarnamêyê, çarçoveya pirsyarnamêyê, diyarkirin û çarçoveya koma lêkolînê, awayê berhevkirina daneyan, dariştina pirsyarnamêyê û proseya berhevkirina daneyan.

2.1. Pêşkêşiya Pirsyarnamêyê

Hem ji ber şert û mercên sosyo-polîtîk yê welatên ku derhênerên kurd lê dijîn û hem jî ji ber globalîzasyonê û îmkanên curbicur yê huner, perwerde û jiyane, derhênerên kurd li çendîn welatên cihêreng dijîn û di nav sînoren wan welatan da filmên xwe berhem tînin. Îro, sînemaya kurdî hem li welatên wekî Îran, Iraq, Sûriye û Tirkîyeyê, hem jî li dîasporayê tê berhemîn. Sînemaya kurdî li ser dînamîkên zor cuda geş dibe. Bo mimûne, bikaranîna zimanê kurdî di filmeka kurdî ya li Tirkîyeyê, carinan reng e bibe sebebê qebûlnebûna wê filmê bo festîvalên li Tirkîyeyê, lê belê li Îranê ev dikare bibe dewlemendiya estetik ya filmeka kurdî. Lewma me ji ber şert û mercên polîtîk yê ku dînamîkên sînemaya kurdî pir-reng dikin, hem ji ber nêzikatî û îmkanên guncav hem jî ji ber çavşinasiya me ya derbarê kurtefilmên kurdî yê li Tirkîyeyê, lêkolîna xwe bi kurtefilmên li Tirkîyeyê ve berteng kir.

2.1.1. Çarçoveya Pirsyarnamêyê

Pirsyarnamêya ku di çarçoveya lêkolînê da hatî sepandin, ji temayên navendî yê bikaranîna zimanî ya ji aliyê agahîderan ve pêk tê. Di çarçoveya pirsyarnamêyê da me ji agahîderan 41 pirs pirsyar kirin ku ji sê kategoriyên cuda pêk tên. Kategorîzasyonên pirsyarnamêyê di bin van sernavan da hatine dabeşkirin: *agahiyên şexsî* (7 pirs), *asta perwedeyê û şiyane zimanî* (9 pirs) û *têkiliya ziman û sînemayê* (25 pirs). Di kategoriya *agahiyên şexsî* da em li ser temen, zayend, bajarê îqametê, bajarê jidayîkbûnê û zimanê dayîkê yê agahîderan hûr bûne. Di kategoriya *asta perwerdeyê û şiyane zimanî* da em li ser asta perwedeyê, perwedeya sînemayê ya teorîk û pratîkî, perwedeya zimanê kurdî û her çar şiyane (axaftin, têgihiştin,

xwendin û nivîsin) zimanî yê agahîderan hûr bûne. Bi ya me rola şiyane kurdî yê agahîderan girîng in di bikaranîna kurtefilmada da. Di kategoriya *têkiliya ziman û sînemayê* da em li ser van temayên navendî hûr bûne: Peywendiya agahîderan ligel zimanê kurdî, tesîra edebiyata kurdî ya nivîskî û devkî li ser filmên agahîderan, krîterên kurdiya ku di filmên agahîderan da hatiye bikaranîn, sebebên bikaranîna kurdî di kurtefilmada da, weşandina kurtefilmên agahîderan li ser televîzyonê netewî û li holên sînemayî, sansûra li ser kurtefilmên agahîderan, fînansekirina kurtefilmên agahîderan, taybetiyên ji bo pênasikirina filmên kurdî, muzîkên filman bi kîjan zimanî ne, li ser platformên medyaya civakî agahîder kîjan ziman/zimanan bikar tînin û tesîra kîjan derhênerên kurd li ser agahîderan zêde ye?

2.1.2. Diyarkirin û Hilbijartina Koma Lêkolînê

Di destpêka lêkolînê da her çiqas me xwest em xwe bigehînin gelek agahîderan, hem ji ber plansazî û teqwîma bo lêkolînê hatî terxankirin, hem jî ber bêmecaliyê me nekarî em xwe bigehînin hemî agahîderan. Lê belê di vê proseyê da têra lêkolîna me agahîder peyda bûn. Me pirsyarname li 40 agahîderan sepand. Herçend me xwest em balans û hevkeşeya zayendê ya agahîderan biparêzin jî, ji ber şertên tebi'î me nekarî. Çunkî zorîneya agahîderên ku -qenebe- kurtefileka kurdî berhem înayî, mêr bûn (bnr. grafîk 5). Krîtera hilbijartina agahîderan ew bû ku, ji Tirkiyeyê bin û herî kêr kurtefilmeka kurdî berhem anîbe. Bi vê armancê ji bo peydakirina agahîderan, me metoda survey (lêgerînê) bi kar anî.

2.2. Awayê Berhevkirina Daneyan

Ji bo berhevkirina daneyên lêkolînê, me *Google Forms* tercîh kir. *Google Forms* yek ji rêbazên berhevkirina daneyan û formateka pirsyarnameyê ye. *Google Forms*, hem ji ber pratîkbûna wê, hem jî ji ber ku online bû -ji bo ku agahîder bi hêsanî bikaribin beşdarî pirsyarnameyê bibin- hate tercîhkirin. Piştî ku pirsyarname hazir bû, bi rêya email û telefonê me ji bo agahîderan lînkê pirsyarnameyê hinart. Agahîderan gava ku pêl li lînkê dikirin, bi awayekî online dikarî pirsyarnameyê dabigirin.

2.2.1. Dariştina Pirsyarnameyê

Bi merema taqîkirina (sağlama/verification) rastiya pirsyarên ku di beşa destpêkê da hatine diyarkirin, pirsyarname hewl dide tercîh û motîvasyonê bikaranîna zimanê kurdî yê

agahîderan teswîr bike. Bi vî awayî, em ê zêdetir li ser van babetên navendî yên pirsyarnameyê biçin:

- Tercîh û motîvasyonên bikaranîna zimanê kurdî yên agahîderan çi ne?
- Rola zimanê kurdî di wergitina xelatan û beşdarbûna festîvalan da çi ye?
- Zimanê kurdî dibe sebebê sansûrkirina filmên kurdî?
- Rola zimanê kurdî çi ye di fînansekirina filmên kurdî da?
- Derhêner ji senaryonivîsînê hata qonaxa post-produksiyonê kîjan zimanî pitir bi kar tînin?
- Zimanê kurdî di pênasêkirina sînemaya kurdî da dikare rolekê bigêre?

2.2.2. Proseya Berhevkirina Daneyan

Di serê ewil da, bi metoda lêgerînê (survey) me hewl da em kurtefilmên kurdî û derhênerên kurd diyar bikin. Di proseyeka dirêj ya qederê 4-5 mehan da ev armanc çû serî. Paşê, li gorî dane/kurtefilmên kurdî yên destkeftî û li gorî derhênerên wan, film hatin kategorîzekirin. Li gorî vê kategorîzasyonê, pirsyarnameya ku hatî lêkdan bi rêya telefon, e-mail û platformên sosyal meydayê ji bo agahîderan hatin hinartin. Proseya sepandina pirsyarnameyê û beşdariya agahîderan nêzikî 30-40 rojan ajot.

Herçend me serê ewil xwest em pirsyarnameya lêkolînê bi kurdiya kurmancî hazir bikin jî, ji ber endîşeya kêrnivîs û xwendewariya kurdî ya agahîderan, pirsyarname mecbûren bi tirkî hate hazirandin. Jixwe daneyên destkeftî jî ev endîşeya me tesdîq kirin (bnr. grafîk 4) ku nivîs û xwendewariya bi kurdî ya agahîderan kêrn e.

2.2.3. Amûrê Berhevkirina Daneyan

Daneyên ku di çarçoveya vê lêkolînê da hatine bikaranîn, bi rêya *Google Forms*ê hatine berhevkirin. *Google Forms*, yek ji metodên berhevkirina daneyan e û sepaneka şirketa *Google*ê ye. *Google Forms*, li gorî gelek formatên ciyawaz yên pirsyaran hatiye hazirandin. Lewma bo me bû hêsankarî ku em bişên pirsyarên ciyawaz bipirsin. Piştî beşdariya agahîderan li pirsyarnameyê, dane bi renekî otomatîk li ser bernameya *Microsoft Office Excel 2010*ê berhev bûn. Piştî temambûna pirsyarnameyê, ev daneyên ku berhevbûyî bo kurmancî hatine tercûmekirin. Herwiha me ev daneyên berhevbûyî, dîsa bi rêya bernameya *Microsoft Office Excel 2010*ê, li gorî kategorîzasyonan, da ku xeletî çênebe, bi rêya formulasyona *EĞERSAY(**; **)*ê berhev kirin û

kirine grafik. Pirsyarên ku ji duyan zêdetir bijarde heyî, li ser grafika *Pastayê* nedihatine formulekirin, lewma me hem grafikên *Stûnî* hem jî grafikên *Pastayê* bi kar anîn.




BEŞA SÊYEM: TEHLÎLA DANeyÊN PIRSYARNAMEYÊ

Me di vê beşê da me hem tehlîla daneyên ku di çarçoveya pirsyarnameya lêkolînê da hatine berhevkerin, hem jî ligel van daneyan bi awayekî berawirdî tehlîla kurtefilmên agahîderan kir. Di destpêka lêkolînê da me çend pirsên serekî pirs kiribûn û me lêkolîna xwe li dû van pirsyan bi rê ve bir.

3.1. Kategorîzasyona Peywendiyên Agahîderan ligel Zimanê Dayîkê

Yek ji pirsyarên serekî ku di pênasekirina sînemaya kurdî da xwedî roleka girîng e, nasnameya etnîk ya derhêneran e. Ji bo ravekirina vê babetê me derbarê zimanê zikmakî yê derhêneran da pirsyarek kir. Bi armanca ku em bidene zanîn ka agahîder girêdayî kîjan zaraveyên kurdî ne, me kurdî bi du (kurdiya kurmancî û kurdiya zazakî) kategoriyan dabeş kir.




Grafîk 3: Zimanê dayîkê yê agahîderan (bi %)

Di sercema vê pirsyarê da, ji 40 agahîderan 25 (83%) agahîderan **kurdiya kurmancî**, 4 (14%) agahîderan **kurdiya zazakî** û 1 (3%) agahîderî/ê jî **tirkî**¹⁸ beyan kiriye ku ziman/zaraveyê wan yê dayîkê ye. Wekî ku ji grafîk 3yê jî diyar e, ji aliyê hejmarê ve agahîderên kurmancî-zarave zêdetir in ji zazakî-zaraveyê li Tirkîyeyê. Kurdên zazakî-zarave di warê berhemînana

¹⁸. Agahîderê/ê zimanê xwe yê dayîkê wekî “tirkî” beyan kiriye. Lê belê bi rengekî organîk peywendiya wî/wê ligel zimanê kurdî çêbûye. Fêrî zimanê kurdî bûye û kurtefilmên kurdîziman berhem înanê. Tevî ku zimanê wî/wê yê dayîkê tirkî ye û wekî nasname ne kurd e, filmên xwe wekî filmên kurdî pênase dîke.

filmên kurdî da nisbet bi kurdên kurancî-zarave ne xwedî giraniyeka berbiçav in. Ev rêje, qismen bi nifûsa kurdên zaza ve girêdayî ye ku nisbet bi kurdên kurancî wekî hejmar kêmtir in.

Bi merema aşkerekirina peywendiya agahîderan ligel zimanê kurdî û behremendî û şarezaiya wan ya her çar şiyânên (axiftin, têgihîştin, xwendin, nivîsîn) kurdî, me pirsyareka bi vî rengî ji agahîderan kir. Ev pirsyar li gorî astên *pir baş*, *baş*, *navînî/normal*, *lawaz* û *qet* hate kategorîzekirin. Digel ku her 40 agahîderan bersiva her çar bijardeyan (*axiftin*, *têgihîştin*,



Grafîk 4: Şiyânên zimanê kurdî yên agahîderan (bi %)


xwendin, *nivîsîn*) daye, di şiyana **axiftinê** da 16 (%40) agahîderan asta *pir baş*, 16 (%40) agahîderan asta *baş*, 6 (%15) agahîderan asta *navînî/normal* û 2 (%5) agahîderan jî asta *lawaz* hilibjartine. ‘Eyan e ku hemî agahîder bi renekî dişên bi kurdî bi axivîn û peywendiya wan ya organîk heye ligel kurdî. Di şiyana **têgihîştinê** da, nisbet bi şiyana axiftinê ferqek derdikeve meydanê. Şiyana têgihîştinê nisbet bi şiyânên din ji aliyê rêjeyê ve bilindtir e. Di şiyana têgihîştinê da 18 (%45) agahîderan asta *pir baş*, 20 (%50) agahîderan asta *baş*, 2 (%5) agahîderan asta *navînî/normal* hilibjartine.

Di şiyana **xwendinê** da ji xeynî agahîderekî/ê, hemî agahîder xerîkî xwendina bi kurdî ne. Ji bo şiyana xwendinê 11(%27.5) agahîderan asta *pir baş*, 11 (%27.5) agahîderan asta *baş*, 13 (%32.5) agahîderan asta *navînî/normal*, 5 (%12.5) agahîderan asta *lawaz* û 1 (%2.5) agahîderî jî asta *qet* hilbijartiye ku peywendiya xwe ligel nivîsîna kurdî destnîşan dikin. Di şiyana **nivîsînê** da nisbet bi her sê şiyânên din yê kurdî, ferqeka diyartir berçav e. Li gorî daneyên agahîderan, 6 (%15) agahîderan asta *pir baş*, 11 (%27.5) agahîderan asta *baş*, 8 (%20) agahîderan asta *navînî/normal*, 10 (%20) agahîderan asta *lawaz*, 5 (%10) agahîderan jî asta *qet* destnîşan kiriye.

Rêjeya şiyânên axiftin û têgihiştinê yê agahîderan bilindtir in nisbet bi şiyânên xwendin û nivîsîna wan ya bi kurdî. Digel ku şiyana axiftina 2 agahîderan *lawaz* e, hemî agahîderên mayî bi rengekî dişên kurdî bi axivîn. Rêjeya şiyana têgihiştinê, şiyana herî bilind ya agahîderan e. Ji xeynî 2 agahîderên ku bi rengekî *navînî/normal* xwedî şiyana têgihiştina kurdî ne, hemî agahîderên mayî beyan dikin ku bi şarezayî kurdî têdigihin. Rêjeya şiyânên xwendin û nivîsîna bi kurdî ya agahîderan li gorî astan zêde diguhere. Ji xeynî agahîderekî, hemî agahîderên din dikarin kurdî bixwînin. Herwiha, di şiyana nivîsîna kurdî da 5 (%12.5) agahîder *qet* nikarin bi kurdî binivîsin. Li gorî daneyên berdest, her 5 agahîderên ku şiyana wan ya nivîsîna bi kurdî *qet* nîne, li derveyî bajarên kurdnişîn dijîn û hemî jî mêr in. Ber'eksê vê yekê, 6 (%15) agahîderên ku di warê nivîsîna kurdî da *pir baş* in, 5 (%12.5) ji wan agahîderan in ku li bajarên kurdnişîn dijîn û 2 (%5) agahîder li derveyî bajarên kurdnişîn dijîn. Lê van herdu agahîderan li Zanîngeha Mardin Artukluyê dersên kurdî xwendine. Bi giştî rêjeya şiyânên axiftin û têgihiştina agahîderan bilindtir e ji rêjeya şiyânên wan yê xwendin û nivîsîna bi kurdî.


3.1.1. Li Gorî Zayendê

Hejmara agahîderên ku beşdarî pirsyarnamê bûne, bi temamî 40 (%100) kes in. Ji aliyê zayendê ve ferqeka mezin diyar dike di navbera agahîderan da. Herwekî ji grafîk 5ê eyan e, ji 40 agahîderan 33 (%83) agahîder **mêr**, 7 (%17) agahîder jî **jin** in ku bi rengekî aktîf di berhemînana kurtefilmên kurdîziman da xwedî rolekê ne. Giraniya berhemînana kurtefilman kurdîziman ya agahîderên mêr berçavtir e ji ya agahîderên jin.



Grafîk 5: Zayenda agahîderan (bi %)

Ji bo zimanê kurdî û zimanên din (tirkî, fransî, îngilîzî û bêdiyalogî) yên ku di kurtefilman da hatine tercîhkirin ji aliyê agahîderên mêr û jin ve, me 78 kurtefilmên her 40 agahîderan tehlîl kirin. Ji van 78 (%100) kurtefilman, 64 (%82) kurtefilm ji aliyê agahîderên mêr, 14 (%18) kurtefilm jî ji aliyê agahîderên jin ve hatine berhemînan. Niha, li gorî zayenda agahîderan em ê bikaranîn û tercîhkirina zimanan di van kurtefilman da berawird bikin û rêjeya bikaranîna zimanan di da derbêxin. Diyarkirina zimanan di van kurtefilman da li gorî temamiya (temamen/completely) zimanê filman pêk hatiye. Bo nimûne ew ziman ji aliyê karakterên filmê ve hatiye axivîn/bikaranîn û dengên wekî dengê televîzyon û radyoyê wekî zimanê filmê nehatine qebûlkirin. Herwiha me muzîk û jenerîkên filman jî daxilî vê krîterê nekirin, bes tenya krîtera diyarkirina zimanê van filman ew e ku ev ziman ji aliyê karakteran ve hatibe axiftin û wekî zimanê filmîk derkeftibe pêş.



Grafîk 6: Li gorî zayenda agahîderan zimananên kurtefilman (bi %)

Herwekî ji daneyên grafîk 7ê jî diyar e, zimanê zorîneya kurtefilman xwerû kurdî ye. Ji 78 (%100) kurtefilman, zimanê 46 (%58.9) kurtefilman xwerû **kurdî** ye. Li gorî zayenda agahîderan, ji van 46 kurtefilmên kurdîziman, 36 (%46.1) kurtefilm ji aliyê agahîderên mêr, 10 (%12.8) kurtefilm jî ji aliyê agahîderên jin ve hatine berhemînan. Hesassiyeta agahîderên jin ya berhemînana kurtefilmên kurdîziman ji hessassiyeta agahîderên mêr berçavtir e. Agahîderên mêr, nisbet bi agahîderên jin pitir cih didene zimanên ji xeynî kurdî. Digel ku agahîderên jin çî filmên xwerû tirkîziman berhem neînane, agahîderên mêr 3 (%3.8) kurtefilmên xwerû **tirkî** berhem înan.

Zimanê kurdî, ji xeynî kurtefilmên bêdiyalog û çend kurtefilman, di temamiya van kurtefilman da yan wekî zimanê serekî yan jî wekî zimanê duyem (% 50 kurdî) hatiye bikaranîn. Ji 9 (%11.5) kurtefilmên ku zimanê wan kurdî-tirkî ye, her dîsa giraniya kurtefilmên **kurdî-tirkîziman** ji aliyê derhênerên mêr ve hatine berhemînan. Ji van kurtefilmên kurdî-tirkîziman, 7 (%8.9) kurtefilm ji aliyê agahîderên mêr, 2 (%2.5) kurtefilmên kurdî-tirkîziman jî ji aliyê agahîderên jin ve hatine berhemînan. 1 (%1.2) kurtefilma **kurdî-îngilîzî** ji aliyê agahîdereka jin û 1 (%1.2) kurtefilma **fransîzî-tirkî** jî ji aliyê agahîderekî mêr ve hatiye berhemînan. Hejmareka bilind ji van kurtefilman bi rengêkî bêdiyalog/bêziman hatine berhemînan. 18 (%23) kurtefilmên ku **bêdiyalog** hatine berhemînan, ji van 18 kurtefilman 17 (% 21.7) kurtefilm ji aliyê agahîderên mêr, 1 (%1.2) kurtefilm jî ji aliyê agahîderên jin ve hatine berhemînan. Zorîneya van kurtefilmên

bêdiyalog yên ku babeta wan li ser kurdan û meseleyên kurdî yên polîtîk in, li şûna bikaranîn û îqamekirina zimanê kurdî wekî zimanê karkekteran, muzîkên filman yên kurdî hatine bikaranîn û îqamekirin. Ev taybetî, nisbet bi filmên kurdîziman yên di berçavtir e. Di van filman da, di navbera babeta filman û muzîka filman da peywendiyek durist bûye. Lewma agahîderan, muzîkên Ciwan Haco, Mehmet Atlı, Nizamettin Ariç, Koma Teq û Req, Kerem Sevinç (bi taybet agahîderê/a ku zaraveya wî/wê ya dayîkê kurdiya zazakî ye) û dengbêjiya kurdî ya herêma Botan (*Heyran Jaro*) hatiye bikaranîn.

3.1.2. Li Gorî Perwerdeya Sînemayê


Ji bo têgihiştin û ravekirina bikaranîna zimanê kurdî û zimanên din di kurtefilman da, me rêjeyên bikaranîna zimanan ligel perwerdeya sînemayê ya agahîderan berawird kir ka perwerdeya agahîderan ya teorîk û pratîk ya sînemayê roleka çawa digêre li ser bikaranîna zimanî di kurtefilman da. Li gorî kategorîzasyonên perwerdeya sînemayê yên wekî *lîsans û master*, *lîsans*, *lîsans atolye û kurs*, *atolye*, “*ne yek ji van astan*”, *mekteba bala* (yûksekokul), *master*, *kurs*, *lîsans û atolye*, *atolye û kurs*, *master û doktora*, “*alaylî*” û *bêbersiv*, li gorî beyanatên agahîderan bi xwe hatine kategorîzekirin.¹⁹

Li gorî daneyên 78 kurtefilmên 40 agahîderan, zimanê van kurtefilman wekî kurdî, tirkî, kurdî-tirkî, kurdî-îngilîzî, fransî-tirkî û bêdiyalog hatine kategorîzekirin û li gorî asta perwerdeya sînemayê ya agahîderan hatine tehlîl kirin ka li gorî vê perwerdeya sînemayê bikaranîn yan jî tercîhkirina zimanan çawa guheriye?

Ji 78 kurtefilman, zimanê 46 (%58.9) kurtefilm xwerû **kurdî** ye ku ev kurtefilm ji aliyê wan agahîderan ve hatine berhemînan û perwerdeyên sînemayê yên ji hev ciyawaz wergirtine. Agahîderên perwerdeya *lîsans û masterê* wergirtî 4 (%5.1) kurtefilm, perwerdeya *lîsansê* 10 (%12.8) kurtefilm, perwerdeya *lîsans, atolye û kurs* 1 (%1.2) kurtefilm, perwerdeya *atolyeyê* 2 (%2.5) kurtefilm, agahîderên ku *ne yek ji van astan* (perwerdeya sînemayê wernegirtî) 3 (%3.8) kurtefilm, *mekteba bala* (yûksekokul) 3 (%3.8) kurtefilm, *master* 8 (%10.2) kurtefilm, *kurs* 6 (%7.6) kurtefilm, *lîsans û atolye* 1 (%1.2) kurtefilm, *atolye û kurs* 6 (%7.6) kurtefilm, *master û*

¹⁹. Kategorîzyonên “*ne yek ji van astan*” û “*alaylî*” bi me’naya xwe ew e ku agahîderan perwerdeya sînemayê wernegirtine.

doktora 1 (%1.2) kurtefilm û bêbersiv 1 (%1.2) kurtefilm hatiye berhemînan. Ji 78 kurtefilmên agahîderan, zimanê 3 (%3.8) kurtefilman **tirkî** ye.



Grafik 7: Li gorî perwerdeya sînemayê ya agahîderan bikaranîna zimanan (bi %)

Agahîderên ku perwerdeya sînemayê *ne yek ji van astan* 1 (%1.2), *master* 1 (%1.2) û *alayl* 1 (%1.2) wergirtî, sê kurtefilmên tirkîziman berhem înan. Agahîderên ku perwerdeya xwe ya sînemayê ji *lîsansê 2* (%2.5), *ne yek ji van astan 2* (%2.5), *master 2* (%2.5) û *atolye û kurs 2* (%2.5) kurtefilmên **kurdî-tirkî** berhem înan. Agahîdereka ku 1 (%1.2) kurtefilma zimanê wê **kurdî-îngilîzî** berhem înayî, perwerdeya xwe di pileya *masterê* da biriye serî. Dîsa, agahîdereki ku 1 (%1.2) kurtefilma zimanê wê **fransî-tirkî** berhem înaye, perwerdeya xwe ya sînemayê di asta *masterê* da temam kiriye.


Di çarçoveya bikaranîna/bikarneanîna zimanan û perwerdeya sînemayê da filmên bêdiyalog/bêziman teqabûlî hejmareka bilind ya kurtefilman dike. Ji 78 kurtefilman, 18 (%23)

kurtefilm ji aliyê agahîderan ve bi regekî **bêdiyalog** hatine berhemînan. Ji van 18 kurtefilmên agahîderan, 4 (%5.1) kurtefilm ji asta *lîsansê*, 5 (%6.4) kurtefilm ji asta *ne yek ji van astan*, 4 (%5.1) kurtefilm ji asta *masterê*, 1 (%1.2) kurtefilm ji asta *atolye û kursê* û 4 (%5.1) kurtefilm jî ji asta *alaylî* hatine berhemînan.

Li gorî dane û îstatîstîkên grafîk 8ê, bikaranîna zimanê kurdî zêdetir ji aliyê wan agahîderan ve hatiye bikaranîn, ewên ku derçûyên perwerdeyên *lîsans*, *master*, *kurs*, *atolye û kurs* û *lîsans û masterê* ne. Ev agahîder, ku wekî nîşê nû yê sînemaya kurdî tê zanîn, zêdetir piştî salên 2010an bi temamkirina perwerdeyên xwe yê sînemayê dest bi berhemînana kurtefilmên kurdîziman kirine.

3.1.3. Li Gorî Rêjeya Bikaranîna Zimanî

Derbarê zimanên kurtefilmên agahîderan da mirov dikare pirseka serekî pirs bike ka çima di 78 kurtefilmên agahîderan (derhênerên kurd) da zimanên muxtelîf hatine bikaranîn? Ji van kurtefilman 46 (%59) kurtefilm bi **kurdî**, 3 (%4) kurtefilm bi **tirkî**, 9 (%12) kurtefilm bi **kurdî-tirkî**, 1 (%1) kurtefilm bi **kurdî-îngilîzî**, 1 (%1) kurtefilm **fransî-tirkî**, 18 (%23) kurtefilm jî bi regekî **bêdiyalog** hatine berhemînan.



Grafîk 8: Rêjeya bikaranîna zimanan di kurtefilman da (bi %)

Temamiya zimanê 46 kurtefilman û zorîneya zimanê 9 kurtefilman jî bi kurdî ye. Di 56 (%71) kurtefilman da kurdî bi awayekî hatiye bikaranîn. Herwiha, agahîderên ku ji xeynî kurdî ciha dane zimanekî din, filmên xwe wekî filmên kurdî pênase dikin. Ligel vê yekê, bikaranîna zimanên ji xeynî kurdî (tirkî, îngilîzî, fransî) peywendiya vê tercîha zimanî ligel babeta filmê heye. Bo nimûne filma ku fransî-tirkî hatiye berhemînan, behsa meseleya Torosê û “faîlên meçhûl” dike. Çîroka ku derbarê konfor û dîzayna modela nû ya Torosê dike li şirketeka fransî derbas dibe. Wekî ku tê zanîn, Toros modeleka erebeyan ya fransiyan e û di bîreweriya kurdan da yek ji temsîlên “faîlên meçhûl”an e. Ji aliyekî din ve bikaranîna cot-zimanan di kurtefilmên kurdî da encama koçberiya kurdan ya bo deverên din û ewrûpayê ye. Agahîdera ku kurtefilmeka kurdî-îngilîzî berhem îname, behsa malbateka kurd li ewrûpayê dike. Ev bikaranîna cot-zimanî hem bi mekanê filmîk hem jî bi çîrokê ve girêdayî ye. Lewma, gava mînaqêşeyên derbarê pênasekirina filmên kurdî da tên kirin, zarûriyeta temamiya kurdîbûna zimanê filmê qismen ji meydanê radibe û li gorî çîrok û mekanê filmîk dibe ku zimanên din jî ligel kurdî di filmên kurdî da bêne îqamekirin.


3.2. Sebebên Bikaranîna Zimanê Kurdî di Kurtefilman da

Di vê beşê da em ê cih bidine sebebên bikaranîna zimanê kurdî di kurtefilman da, ka bikaranîna zimanê kurdî di kurtefilman da roleka çawa digêre di beşdarbûna festîvalan, wergirtina xelatan, sansûrkirina filman û finanskirina filman da. Bikaranîna zimanê kurdî di kurtefilman da li festîvalên netewî û navnetewî yên li Tirkiyeyê, li festîvalên filmên kurdî û li festîvalên navnetewî yên derveyî Tirkiyeyê; di beşdarbûna festîvalan, wergirtina xelatan, sansûrkirin û finanskirina filman da roleka erênî digêre yan roleka neyînî digêre? Yan jî bikaranîna zimanê kurdî çi tesîrê li ser van babetan dike?

3.2.1. Rola Zimanê Kurdî di Beşdarbûna Festîvalan da

Ji xeynî festîvalên filmên kurdî yên li Kurdîstana Başûr, yên wekî Festîvala Navdewletî ya Duhokê, Festîvala Navdewletî ya Silêmaniyê, Festîvala Navdewletî ya Erbilê; li Tirkiyeyê Festîvala Filman ya Amedê, Festîvala Kurtefilman ya Yılmaz Güney, Festîvala Filman ya Axtamarê ya Wanê; li ewrûpayê Festîvala Fîlmên Kurdî ya Londonê, Festîvala Fîlmên Kurdî ya Berlînê, Festîvala Fîlmên Kurdî ya Hamburgê, Festîvala Fîlmên kurdî ya Parîsê hwd., filmên kurdî hem beşdarî festîvalên netewî û navnetewî yên li Tirkiyeyê hem jî beşdarî festîvalên

derveyî Tirkîyeyê dibin. Rola bikaranîna zimanê kurdî di kurtefilmên da, herwekî di grafîk 7ê da hatiye destnîşankirin, li gorî daneyên agahîderan di navbera festîvalan da ferqeka mezîn û berbiçav e.



Grafîk 9: Rola zimanê kurdî li ser beşdarbûna festîvalên filman (bi %)

Bi giştî kurtefilm, bi taybet kurtefilmên kurdî ji ber ku li holên sînemayê pir kêmtên nîşandan, ji xeynî bername û nîşandanên taybet, tenya li festîvalên filman derfeta nîşandanê peyda dikin. Eger ev kurtefilmeka kurdî be, hem -gelek caran- ji ber naveroka filmê hem jî ji ber zimanê filmê reng e li hindê festîvalên filman derfeta nîşandanê peyda neke û derveyî festîvalan bimîne. Herwekî ji grafîka 7ê jî ‘eyan e, rola zimanê kurdî, bi gotineka din kurtefilmên kurdîziman di beşdarbûna festîvalên filman da ferqeka mezîn destnîşan dike. Beşdariya kurtefilmên kurdîziman li gorî her sê komên festîvalan û li gorî bijardeyên *avantaj*, *dezavantaj* û *notr* (bêtesîr) hatine destnîşankirin. Ji bo bijardeya **festîvalên netewî û navnetewî yên li Tirkîyeyê**, hemî agahîderan fikrên xwe beyan kirine. 22 (%55) agahîderan beyan kirine ku zimanê kurdî li festîvalên netewî û navnetewî yên li Tirkîyeyê wekî diyardeyeka dezavantaj e ji bo beşdariya kurtefilmên wan. Ber’eskê vê fikra serdest ya di nav agahîderan da, rêjeyeka pir nizm, yanê 2 (%5) agahîderan kurdîbûna zimanê filma xwe ji bo beşdariya heman festîvalan wekî diyardeyeka *avantaj* destnîşan kirine. Rêjeyeka bilind ya agahîderan, 16 (%40), jî wisa dane

zanîn ku kurdîbûn zimanê filmekê li ser beşdariya festîvalên netewî û navnetewî yên li Tirkîyeyê çî tesîrê nake û nabe krîtereka diyarker.


Herwekî li jorê hatî behskirin, krîtera kurdîbûna zimanê filmekê li gorî festîvalan têra xwe guherbar e. Bi taybet ev ferq û cudahî di navbera festîvalên netewî û navnetewî yên li Tirkîyeyê û festîvalên filmên kurdî da berbiçav e. Agahîderên ku fikra xwe derbarê **festîvalên filmên kurdî** da beyan kirine, korelasyona di navbera filmên kurdîziman û festîvalên filmên kurdî da bi rengekî zelal destnîşan kirine. Diyar e, giraniya agahîderan 31 (%77.5) kurdîbûna zimanê filmên xwe bo beşdariya festîvalên filmên kurdî wekî avantajekê beyan kirine. Teb'en, çî agahîderan kurdîbûna zimanê filmên xwe bo beşdariya heman festîvala navhatî wekî *dezavantaj* destnîşan nekiriye.

Hemfîkrî û meyla muşterek ya agahîderan herî zêde ji bo bijardeya **festîvalên netewî û navnetewî yên derveyî Tirkîyeyê** pêk hatiye. Tevî ku 39 (%97.5) agahîderan beşdariya vê pirsê kirine, 1 (%2.5) agahîderî kurdîbûna zimanê filma xwe wekî *dezavantaj*, 6 (%15.3) agahîderan wekî *avantaj*, 32 (%82) agahîderan jî wekî *notr* destnîşan kiriye. Ji ber meseleyên sansûr û babetên polîtîk yên filmên kurdî û ber'eksê vê yekê pêkhatina festîvalên kurdî li gelek deverên cuda, tesîr li ser beşdariya kurtefilmên kurdîziman kiriye. Herwekî ji grafîka jorê jî 'eyan e, ferqa herî mezin di navbera festîvalên filmên netewî û navnetewî yên li Tirkîyeyê û festîvalên filmên kurdî da heye.

3.2.2. Rola Zimanê Kurdî di Wergirtina Xelatan da

Wextê daneyên her du grafîkan (grafîk 7 û grafîk 8) tên berawirdkirin, hevterîbiyeka diyar heye di navbera rola bikaranîna zimanê kurdî di beşdarbûna festîvalan û di wergirtina xelatan da. Bi merema aşkerekirina rola zimanê kurdî di wergirtina xelatan li sê komên festîvalên cuda, li festîvalên netewî û navnetewî yên li Tirkîyeyê, li festîvalên filmên kurdî û li festîvalên netewî yên li derveyî Tirkîyeyê, me wekî sê bijarde *neyînî*, *erênî* û *notr* (bêtesîr) danan. Hemî agahîderan bersiva her sê bijardeyan daye û bi rengekî kamil bersiva vê pirsê hatiye danan. Li ser pirsê rola zimanê kurdî di wergirtina xelatan da li festîvalên muxtelîf çî tesîrê dike; agahîderên ku ji bo koma **festîvalên netewî û navnetewî yên li Tirkîyeyê** fikrên xwe beyan kirine; 19 (%47.5) agahîderan *neyînî*, 2 (%5) agahîderan *erênî*, û 19 (%47.5) agahîderan jî *notr* beyan kirine. Digel ku li festîvalên filman ên kurdî (ji xeynî Festîvala Navdewletî ya Duhokê û Festîvala Navdewletî ya Silêmaniyê ku her du jî du festîvalên navdewletî ne û ji aliyê kurdan ve tîrên rêkxistin) xelatên

berkeftû nayên belavkirin û ji pêşbirkê zêdetir bi awayê rojên nîşandana filman tên rêkxistin ji bo koma **festîvalên filmên kurdî** çi agahîderan fikreka *neyînî* beyan nekiriye. Ber'eksê vê yekê, 23 (%57.5) agahîderan derbarê kurdîbûna zimanê filma xwe da li festîvalên filmên kurdî wekî *erênî*, 17 (42.5) agahîderan jî wekî *notr* beyan kiriye.



Grafîk 10: Rola zimanê kurdî li ser wergirtina xelatan (bi %)


Komeka dî ya festîvalên filman, **festîvalên netewî û navnetewî yên li derveyî Tirkîyeyê** wekî bijardeyeka festîvalan hatiye danîn. Daneyên vê bijardeyê hema bêje wekî daneyên grafîk 9ê ye ku hevterîbiyeka zor berbiçav heye di navbera wan da, tenya agahîderek li bijardeya grafîk 10ê zêde bûye ku ji bo grafîk 9ê û bijardeya festîvalên netewî û navnetewî yên li derveyî Tirkîyeyê 39 agahîderan bersiv dabû pîrsa me. Di vê grafîkê da jî, tenya 1 (%2.5) kesê derbarê rola kurdîbûna zimanê filma xwe di xelatkirinê da bijardeya *neyînî* destnîşan kiriye. 6 (%15) Agahîderan *erênî* û zorîneya agahîderan 33 (%82.5) jî *notr* beyan kirine.

3.2.3. Ziman Wekî Sebebê Sansûrkirina Kurtefilmên Kurdî

Derhênerê yekem kurtefilma kurdîziman li Tirkîyeyê Kazım Öz, derbarê sansûra li ser filmên xwe da dibêje ku, “Ax (1999) filma min a yekem bû û ji aliyê wezaretê ve hate qedexekirin. Ji yekem filma min heta niha bi awayekî eşkera ez rastî sansûrê hatim û hema bêje ji bo hemû filmên min astengî derketin” (Altyazı, 2014). Herwekî Kazım Öz dibêje sansûra li ser

filmên kurdî li Tirkîyeyê ji roja ewil ve dest pê kirine. Di van bîst salên dawî da filmên kurdî hem ji ber zimanê xwe hem jî ji ber naveroka xwe ya muxalif (bi taybet filmên Kazim Öz) li gelek festîvalên li Tirkîyeyê û bi mudaxeleya Tirkîyeyê jî li festîvalên derveyî Tirkîyeyê hatine qedexekirin û sansûrkirin (Altyazî, 2014). Herçiqas, sansûrkirina filmên kurdî bi rengekî aşkera û zelal û bi rengekî nivîskî nayête beyan û teblîxkirin, peydakirina belge nameyên derbarê sansûra li ser filmên kurdî, babeta sansûrê gelek aloztir dike. Derhênerên wek Kazım Öz û Hüseyin Karabey behsa du cure sansûrên li Tirkîyeyê dikin: Sansûra resmî û sansûra veşartî (Altyazî, 2014).

Ji bo diyarkirina peywendîya sansûra filman û zimanê kurdî li Tirkîyeyê, me pirsyareka bi vî rengî ji agahîderên xwe kir. Bersivên destkeftî nêzikî boçûna li jorê ne ku qismek ji agahîderan derbarê vê babetê da fikrên xwe beyan kirine ku sansûr zor caran ne bi rengekî aşkera/resmî, lê bi rengekî veşartî tê kirin. Herwekî di grafîk 9ê da diyar e, ji 40 agahîderan, 9 (%22) agahîderan beyan kirine ku filmên wan bi rengekî (çi aşkera, çi veşartî) hatine sansûrkirin. Digel ku 10 agahîderan beyan kirine ku filmên wan hatine sansûrkirin, agahîderêkî derbarê sansûra filma xwe da çi hûrgilî nedane. Herwiha agahîderêkî (agahîder 6) beyan kiriye ku filma wî nehatiye



Grafîk 11: Zimanê kurdî wekî sebebê sansûrkirina filmên kurdî (bi %)

sansûrkirin, lê ji ber zarûriyeta Belge nameya Karkirina Berhemê (Eser İşletme Belgesi) ya wezareta çandê, zorîneya festîvalan nîşandana filma wî betal kirine û agahîderêkî din (agahîder

10) jî beyan kiriye ku filma wî nehatiye sansûrkin, lê ji ber şik û gumanên xwe derbarê sansûrê da fikrên xwe gotine. Em ê li jêrî cih bidine hûrgiliyên sansûrkirina filman ji aliyê festîvalan ve û fikrên agahîderan yên derbarê sansûrkirina filmên wan da.

Agahîder 1: “Di sala 2012an da, li Festîvala Kurtefilman ya Zanîngeha Înönüyê filma min ji aliyê jûriya pêşîn ve hate sansûrkin. Min ev agahî ji xebetkarekî/a festîvalê wergirt.”

Agahîder 2: “Di sala 2016an da, li Festîvala Kurtefilman ya Akbankê filma min hate sansûrkin”

Agahîder 3: “Li festîvaleka li Stenbolê (navê festîvalê nîne) ji min lîsteya diyalogên filmê ya ji noterê tesdîqkirî hate xwestin. Lê ji ber ku tesdîqkirina noterê mumkin nebû, filma min bo festîvalê nehatibû qebûlkin”

Agahîder 4: “Zanîngeha Yıldız Teknikê (Festîvala Kurtefilman ya Yıldızê) ji ber kurdîbûna zimanî destûr neda ku kurtefilma min bête nîşandan.”

Agahîder 5: “Ez wisa hizir dikim ku ev (sansûr) veşartî ye. Hewce nake her dem aşkere be.”

Agahîder 6: “Fîlma min nehate sansûrkin. Lê belê, di sala 2015an da ji ber zarûriyeta belge-nameyê (Belge-nameya Karkirina Berhemê) ya wezaretê li zorîneya festîvalan betal bû.”

Agahîder 7: “Li hindek festîvalan hate qedexekin.”

Agahîder 8: “Her sê kurtefilmên min li hindek festîvalan, ji aliyê jûriya pêşîn ve hate redkin. Herçiqa rasterast nebe jî, bi renekî nerasterast hatine astengkin.”

Agahîder 9: “Kurtefilmên min digel ku bo kêma festîvalên li Tirkîyeyê hatine qebûlkin, li derveyî Tirkîyeyê gelek xelat wergirtin û beşdarî gelek nîşandana bijardeyên festîvalan bûn. Ne durist e mirov navê festîvalan bide. Ev rêje (xelat û nîşandan) bi xwe jî têra piştrastkirina vê yekê (sansûr) dike.”


Agahîder 10: “Digel ku ez nebûme şahidê sansûra li ser filmên xwe yan jî min agahiyeka bi vî rengî rasterast ji kesekî nehilgirtiye û nezelal/neşeffafbûna jûriyên pêşîn yên festîvalên li Tirkîyeyê, rê li ber bersivaka rast ya vê pirsê digire. Lêkolîneka derbarê zêdebûna filmên kurdî li

festîvalên li Tirkîyeyê û aloziyên polîtîk yên li Tirkîyeyê dikare derbarê vê babetê (sansûr) da rêyekê li ber me veke.”

3.2.4. Rola Zimanê Kurdî di Fînansekirina Kurtefilman da

Ji bo ravekirina tesîra fînansekirina kurtefilmên agahîderan, me derbarê peywendiya bikaranîna rêjeya zimanan di kurtefilman da pirsyareka derbarê vê babetê da ji agahîderên xwe kir ji bo ku em bizanin ka çavkaniyên fînansekirina kurtefilman çi rolê li ser bikaranîn yan jî tercîha zimanî ya agahîderan digêrin? Li dû vê pirsyarê, herwekî ji grafîk 12ê jî diyar e, di navbera zimanên van kurtefilman û çavkaniyê fînansekirina wan da eleqeyek xurt heye. Di vê çarçoveyê da, 78 kurtefilm ligel fînansekirina wan li jêrê hatiye dariştin. Bi nirxandineka giştî, digel ku çavkaniyên fînansekirina kurtefilmên agahîderan cûrbecûr in, zorîneya van kurtefilman bi îmkanên agahîderan bi xwe têne fînansekirin. Agahiyên fînansekirina kurtefilmên agahîderan herwekî beyanata wan hatiye kategorîzekirin. Li gorî vê yekê, 48 (%61.5) kurtefilm *bi îmkanên xwe*, 5 (%6.4) *zanîngeh yan jî mekteba sînemayê* ya ku agahîder lê xwendekar in, 3 (%3.8) kurtefilm *şaredarî û wezaretê çandê*, 4 (% 5.1) kurtefilm *wezaretê çandê*, 2 (%2.5) kurtefilm bi *fonên festîvalên netewî*, 5 (%6.4) kurtefilm *bi piştevaniya hevalên xwe*, 3 (%3.8) kurtefilm bi *hevkariya şaredarî, wezaretê çandê û saziyên taybet*, 1 (%1.2) kurtefilm bi *piştevaniya saziyên taybet*, 1 (%1.2) kurtefilm bi *hevkariya wezaretê çandê û sponsorên din*, 3 (%3.8) kurtefilm bi *piştevaniya şaredariyan*, 3 (%3.8) kurtefilm *bi îmkanên xwe, wezaretê çandê û şaredariyan* hatine fînansekirin.

Grafîk 12 nîşanî me dide ku, peywendiyeka berbiçav heye di navbera ziman û fînansekirina kurtefilman da. Kurtefilmên kurdî zêdetir bi derfet û îmkanên agahîderan û bi piştevaniya sazî û fonên şaredariyan hatine fînansekirin ku zorîneya van saziyan zêdetir nêzîkî meseleya kurdî ya siyasî ne, yan jî şaredariyên kurdnişîn in. Di vê çarçoveyê da, kurtefilmên **kurdî** bi vî rengî hatine fînansekirin: 29 (%37.1) kurtefilm bi *îmkanên agahîderan*, 5 (%6.4) kurtefilm bi *sponsorîya zanîngeh yan jî mekteba sînemayê* ya ku agahîder lê xwendekar in, 1 (%1.2) kurtefilm bi *sponsorîya şaredarî û wezaretê çandê*, 2 (%2.5) kurtefilm bi *fonên festîvalên netewî*, 2 (%2.5) kurtefilm *hevkariya şaredarî, wezaretê çandê û saziyên taybet*, 1 (%1.2) kurtefilm bi *piştevaniya saziyên taybet*, 3 (%3.8) kurtefilm bi *sponsorîya şaredariyan* û 2 (%2.5) kurtefilm jî bi *îmkanên agahîder û şaredariyê* hatine fînansekirin.



Grafîk 12: Peywendiya ziman û fînansekirina kurtefilman (bi %)

Tirkî wekî yek ji zimanên kurtefilman, di 3 (%3.8) kurtefilman da hatiye bikaranîn. Ji van kurtefilman, 1 (%1.2) bi îmkânên agahîderî, 1 (%1.2) bi sponsoriya wezaret a çandê û 1 (%1.2) jî bi piştewaniya hevalên xwe hatine fînansekirin. Ji 9 (%11.5) kurtefilmên ku zimanê wan **kurdî-tirkî** ne, 6 (%7.6) bi îmkânên agahîderan, 1 (%1.2) bi wezaret a çandê, 1 (%1.2) bi hevkeriya şaredarî, wezaret a çandê û saziyên taybet, 1 (%1.2) bi piştewaniya wezaret a çandê hatine fînansekirin. 1 (%1.2) kurtefilma ku bi îmkânên agahîderî hatiye fînansekirin zimanê wê **fransî-tirkî** ye û 1 (%1.2) kurtefilma dî ya ku zimanê wê **kurdî-îngilîzî** ye jî dîsa bi îmkânên agahîderî hatiye fînansekirin. Kurtefilmên bêziman/bêdiyalog teqabûlî hejmareka bilind ji kurtefilmên agahîderan dikin. Ji 18 (%23) kurtefilmên **bêdiyalog**, 10 (%12.8) bi îmkânên agahîderan, 2 (%2.5) ji aliyê şaredarî û wezaret a çandê ve, 2 (%2.5) ji aliyê wezaret a çandê ve, û 4 (%5.1) jî bi piştewaniya hevalên agahîderan hatine fînansekirin.


3.3. Kurtefilm Wekî Cihê Peywendiya ligel Zimanê Zikmakî

Di bin vê beşê da, em ê peywendiya agahîderan ligel zimanê wan yê zikmakî rave bikin. Bi dorê, em ê behsa motîvasyona bikaranîna zimanê kurdî ya agahîderan, peywendiya agahîderan ligel edebiyata kurdî ya devkî û nivîskî û bikaranîna zimanê kurdî ji nivîsîna senaryoyê heta post-produksiyonê, li gorî daneyên grafîkan teswîr bikin.

3.3.1. Motîvasyona Bikaranîna Zimanê Kurdî ya Agahîderan

Yek ji armancên vê lêkolînê ew e ku em bidene zanîn ka agahîderên vê lêkolînê bi kîjan armanc û motîvasyonan kurtefilmên kurdî berhem tînin, bi gotineka din kîjan faktor li ser bikaranîna zimanê kurdî di kurtefilman da karîger in? Ji pirsyareka bi vî rengî armanc ew e ku em bidene zanîn ka dînamîkên bikarhatina zimanê kurdî di sînemayê da/kurtefilman da çi ne. Ji ber ihtimala bersivên muxtelîf yê wê pirsyarê me çar ast diyar kirin ji bo girîngiya bikaranîna zimanê kurdî ya agahîderan. Lewma me astên xwe li gorî 1 (*girîngtirîn sebeb*), 2 (*sebebê girîngtir*), 3 (*girîng*) û 4 (*girîng nîne*) rêz kirin. Ji bo asta yekem (*girîgtirîn sebeb*) 32 (%80) agahîderan, ji bo asta duyem (*sebebê girîngtir*) 29 (%72.5) agahîderan, ji bo asta sêyem (*girîng*) 32 (%80) agahîderan û ji bo asta çarem (*girîng nîne*) jî 32 (%80) agahîderan bersiv dane.

Digel ku ji bo asta **yekem** 32 agahîderan bersiv daye, van her 32 agahîderan tenya bersiva 4 bijaredeyan daye. Li gorî vê yekê, 13 (%40.6) agahîderan beyan kirine ku *ji bo filma min wekî "filmeka kurdî" bête pênasekirin*, 7 (%21.8) agahîderan *ji ber metirsiya jinavçûna zarave/zimanê ku min di filma xwe da bi kar aniye*, 7 (%21.8) agahîderan beyan kirine ku *dixwazim bi rêya sînemayê kurdî berbelav bibe* û 5 (%15.6) agahîderan jî beyan kirine *ji ber ku ez pê bawer im kurdî zimanekî helbestkî û dramatik e*.




Grafîk 13: Mofvasyonên bikaranîna zimanê kurdî (bi %)

Di asta **duyem** ya grafîk 13ê da bersivên 29 agahîderan hene ku têra xwe ciyawaz in. Ji temamiya 29 agahîderan, 5 (%17.2) agahîderan *ji bo filma min wekî filmeka kurdî bête pênasekirin*, 4 (% 13.7) agahîderan *ji ber metirsiya jinavçûna zarave/zimanê ku min di filma xwe da bi kar aniye*, 1 (%3.4) agahîderî/ê *teşwîqa derdora civakî*, 12 (%41.3) agahîderan *dixwazim bi rêya sînemayê kurdî berbelav bibe*, 1 (%3.4) agahîderî *xelatkirina derhênerên kurd li festîvalên netewî û navnetewî*, 2 (%6.8) agahîderan *ji ber ku ez pê bawer im kurdî zimanekî dramatîk û helbestkî ye*, 2 (% 6.8) agahîderan *bi merema qebûlbûna filma min bo festîvalên filmên kurdî û 2 (%6.8) agahîderî jî ji ber ku ez hizir dikim zimanê kurdî dê ji bo nasîna filma min roleka kartêker bigêre* gotiye. Di asta **sêyem** da 32 agahîderan bersiva vê pirsê daye ku ji van agahîderan 4 (%12.5) agahîderan bijardeya *ji bo filma min wekî "filmeka kurdî" bête pênasekirin*, 12 (%37.5) agahîderan *ji ber metirsiya jinavçûna zarave/zimanê ku min di filma xwe da bi kar aniye*, 2 (%6.2) agahîderan *teşwîqa derdora civakî*, 5 (%15.6) agahîderan *dixwazim bi rêya sînemayê kurdî berbelav bibe*, 2 (%6.2) agahîderan *xelatkirina derhênerên kurd li festîvalên netewî û navnetewî*, 5 (%15.6) agahîderan *ji ber ku ez pê bawer im kurdî zimanekî dramatîk û helbestkî ye* û 2 (%6.4) agahîderan *jî ji ber ku ez hizir dikim zimanê kurdî dê ji bo nasîna filma min roleka kartêker bigêre* gotiye. Asta **çarem** ya ku wekî asteka ber'eksê astên din hatiye danîn, bi temami

32 agahîderan bersiva vê astê dane. Ji van 32 agahîderanên ku ev bijarde neqandine beyan dikin ku “ev motîvasyon ji bo bikaranîna min a zimanê kurdî nabe motîvasyonek”. Halê heyî yê asta çarem, ev e: 1 (%3.1) agahîderî *ji bo filma min wekî “filmeka kurdî” bête pênasekirin*, 1 (%3.1) agahîderî *ji ber metirsiya jinavçûna zarave/zimanê ku min di filma xwe da bi kar aniye*, 4 (%12.5) agahîderan *teşwîqa derdora civakî*, 6 (%18.7) agahîderan *xelatkirina derhênerên kurd li festîvalên netewî û navnetewî*, 2 (%6.2) agahîderan *ji ber ku ez pê bawer im kurdî zimanekî dramatik û helbestkî ye*, 8 (%25) agahîderan *bi merema qebûlbûna filma min bo festîvalên filmên kurdî*, 2 (%6.2) agahîderan *ji ber ku ez hizir dikim zimanê kurdî dê ji bo nasîna filma min roleka kartêker bigêre* û 8 (%25) agahîderan *jî li ser daxwaza saziya ku filma min finanse kiriye* beyan kiriye ku ji bo motîvasyona bikaranîna wan ya zimanê kurdî ne girîng e.

3.3.2. Peywendiya Agahîderan li gel Edebiyata Kurdî

Sînema yek ji wan hunerên hevçerx e ku feyza xwe ji gelek dîsîplînên cuda yê wekî edebiyat, tarîx hwd. digire. Bi taybet edebiyat ji bo senaryonivîsînê dîsîplîneka zêde feyzbexş e. Bi armanca ronîkirina tesîra edebiyata kurdî ya nivîskî û ya devkî li ser senaryonivîsîna agahîderan, me ji wan pirsyar kir ka heta çi dereceyê di bin tesîra edebiyata kurdî da ne gava senaryoyayan dinivîsîn. Ji ber bêîmkaniya xwegihandina senaryoyên derhêneran, me hewl da em tesîra edebiyata kurdî di filmên agahîderan da bibînin. Ji bo vê yekê, bi ihtimala feyza edebiyata kurdî me hemû filmên agahîderan yek bi yek tehlîl kirin. Mirov dikare vê tesîra li ser filmên agahîderan bi du awayan pênase bike: Tesîra rasterast û tesîra nerasterast. Tesîra rasterast ya edebiyata kurdî bi rengekî di nav filmê da hatiye bicihkirin. Tesîra nerasterast ew e ku di filmê da çi nîşane û temsîlên edebiyata kurdî di filman da xuya nakin.



Grafîk 14: *Tesîra edebiyata kurdî li ser agahîderan (bi %)*

Herçiqas nakokiyek di navbera bersivên agahîderan yê derbarê tesîra edebiyata kurdî û filmên wan da hebe jî, hejmareka bilind ya agahîderan wisa beyan kirine ku di bin tesîra edebiyata kurdî da mane. Li gorî vê yekê, ji 34 agahîderan 18an (%53) beyan kirine ku tesîra **edebiyata kurdî ya nivîskî** li ser senaryonivîsîna wan çêbûye; 16 (%47) agahîderan jî beyan kirine ku tesîra edebiyata kurdî ya nivîskî li ser wan çênebûye. Ber'eksê vê yekê, ji bo **edebiyata kurdî ya devkî**, ji 39 agahîderan 34an (%87.2) beyan kirine ku tesîra edebiyata kurdî ya devkî li ser wan çêbûye; ji van 39 agahîderan, 5an (%12.8) beyan kirine ku tesîra edebiyata kurdî ya devkî li ser wan çênebûye di nivîsîna senaryoyên wan da. Herwekî ji grafîk 14ê jî diyar e, di navbera tesîra edebiyata kurdî ya devkî û nivîskî da ferqeka mezin heye. Agahîder beyan dikin ku zêdetir di bin tesîra edebiyata kurdî ya devkî da mane. Hemkat, ev yek nîşaneyê peywendiyê agahîderan e ligel edebiyata kurdî ya nivîskî ku em bi awayekî rasterast tesîra wê di filmên agahîderan da nabînin. Herçiqas senaryoyên çî filmên agahîderan bi awayekî rasterast xwe naspêrine metnên edebiyata kurdî ya nivîskî -bi gotineka din, di nav van kurefilmên agahîderan da çî adaptasyon ji edebiyata kurdî ya nivîskî nehatine kirin- bi rêya muzîkên folklorîk û muzîkên ku ji helbestên kurdî hatine bestekirin û çîrokbêjiya kurdî mirov dikare behsa tesîra edebiyata kurdî ya nivîskî û ya devkî bike.


Di kurtefilmên agahîderên wekî Aram Dildar (*Hazirîyek Bo Derengmayînê*, 2018), Roza Erizin (*Bayê Kur*, 2016), Mervan Serha Sarışın (*Xerîbî*, 2017) û Çetin Baskın (*Gerayîş*, 2011) da

tesîra edebiyata kurdî ya nivîskî bi awayekî nerasterast heye. Di kurtefilma xwe da Aram Dildar, bi diyarîkirina kurtefilma xwe bo Fêrikê Ûsiv û Dengbêj Reso tesîra Fêrikê Ûsiv û Dengbêj Reso li ser berhemînana kurtefilma xwe nîşan dide. Agahîderên wekî Roza Erizin, Çetin Baskın bi bikaranîna strana meşhûr ya Ciwan Haco -ku ji helbesta meşhûr ya Mehmed Uzun ya bi navê *Destana Egîdekî* hatiye bestekirin- û Mervan Serhat Sarışın jî bi strana Ciwan Haco *Sira Sibê* - helbesta Rojen Barnas ya bi navê *Sira Sibê*- bi awayekî nerasterast nîşan didin ku tesîra helbesta kurdî di kurtefilmên wan da çêbûye.

Edebiyata kurdî ya devkî nisbet bi edebiyata kurdî ya nivîskî zêdetir tesîr li ser naveroka kurtefilmên kurdî kiriye. Ev tesîr bi rêya muzîka dengbêjiya kurdî û çîrokbêjiya kurdî ya folklorîk hatiye bikaranîn. Bo nimûne, agahîderên wekî Nedim Rojhat Yeşilçınar (*Qemçûrçî*, 2016) bi strana *Kuro* ya Şakiro, Ciwan Zengin (*Mara*, 2016) bi zêmareka kurdî û Bilal Çakay (*Zarokên Mirî*, 2012) bi strana dengbêjiya Fadilê Cizîrî ya bi navê *Heyran Jaro* nîşaneyên tesîra dengbêjiya kurdî/edebiyata kurdî ya devkî nîşan didin. Herwiha, agahîderên wekî Mehmet Mahsum Akyel (*Zilan*, 2015), Ramazan Aygürt (*Dara Hinarê*, 2016) bi çîroka folklorîk ya *Pîrebokê* û Özkan Küçük (*Pepûk*, 2013) bi çîroka *Pepûkê* nîşan didin ku çîrokên folklorîk li ser naveroka filmên wan tesîr kirine.


3.3.3. Ji Senaryonivîsînê Heta Postproduksiyonê Bikaranîna Zimanê Kurdî

Di bin vî sernavî da em ê behsa pratîkên bikaranîna kurdî yê agahîderan û encamên van pratîkan bikin ka di proseya dirêj ya berhemînana kurtefilmên kurdî da agahîder heta çî radeyê temasekê datînin ligel zimanê kurdî nisbet bi zimanên din. Bi dorê, em ê behsa nivîsîna senaryoya filman, rexneyên bîneran li hember zimanê filmên agahîderan, wergirtina alîkariyê ji pisporekî zimanê kurdî bo filmên agahîderan, muzîkên filman û tercîh û bikaranîna agahîderan ya ji bo danasîna kurtefilmên xwe li ser platformên sosyal medyayê.



Grafîk 15: Li gorî zimanan senaryonivîsîna agahîderan (bi %)


Senaryonivîsîna agahîderan, herwekî ji grafîk 15ê diyar e, têra xwe pir-rengiyeka zimanî nîşan didet. Agahîderên vê pirsyarnameyê, ji bo filmên xwe yê kurdî senaryoyên filmên xwe bi kîjan zimanî dinivîsin? Li gorî vê pirsyarê, bersivên gelek ciyawaz bi dest ketin ku rêjeya pratîka nivîsîna bi kurdî ya senaryoyên filmên agahîderan têra xwe nizm e. Grafîk 15, li gorî bersivên agahîderan bi xwe hatiye lêkdan. Li gorî bersivên 40 agahîderan, 18 (%45) agahîderan senaryoyên xwe **li gorî diyalogên filmên kurdî û zimanekî din**, 11 (%28) agahîderan **bi temamî tirkî**, 7 (%17) agahîderan **bi temamî kurdî**, 1 (%3) agahîderî bi **flemenkî**, 1 (%3) agahîderî jî bi **tirkî û diyalog bo kurdî hatine tercûmekirin**, 1 (%2) bi **tirkî û kurdiya zazakî** û 1 (%2) agahîderî **bi tirkî û kurdî** nivîsiye. Rêjeya agahîderên ku senaryoyên xwe bi temamî bi kurdî dinivîsin, hema bêje nêzik e bo agahîderên ku şiyana wan ya nivîsîna bi kurdî *pir baş* e (bnr. grafîk 4). Zorîneya agahîderên ku perwerdeya zimanê kurdî li çendîn sazî û kursan wergirtî, senaryoyên xwe bi kurdî û zimanekî din (ev ziman gelek caran tirkî ye) dinivîsin.



Grafik 16: *Rexneyên bîneran li zimanê filmên agahîderan (bi %)*

Bi merema ronîkirina rexneyên bînerên filmên kurdî, me ji agahîderan pirsyar kir ku, ka derbarê zimanê filmên wan da çi rexne hene yan na? Di encama vê pirsê da, ji 40 agahîderan 35 (%88) agahîderan bersiva **na**, 5 (%12) agahîderan jî bersiva **erê** daye. Ji van 5 agahîderan, agahîderek wekî zayend jin, 4 agahîderên din jî mêt in.


Ji bo aşkerekirina peywendiya agahîderan ligel zimanê kurdî, me derbarê yarmetî-xwestina agahîderan ji pisporekî zimanê kurdî pirsyarek ji wan kir ka agahîder di proseya berhemînana kurtefilmên kurdî da, ji bo bikaranîna zimanê kurdî, bi rengekî profesyonel



Grafîk 17: Rêjeya agahîderan ya daxwaza alîkariyê ji pisporekî zimanê kurdî (bi %)


yarmetiyê ji pisporekî an jî kesekî şarezayê zimanê kurdî werdigirin yan na? Di encama pirsyara me da hemî agahîderan fikrên xwe yê derbarê vê babetê da beyan kirine. Herwekî ji grafîk 17ê jî diyar e, zêdetirî agahîderan ji pisporekî an jî kesekî şarezayê zimanê kurdî yarmetî wernegirtine. Ji 40 agahîderan, 22 (%55) agahîderan bersiva **na**, 18 (%45) agahîderan jî bersiva **erê** dane.

Bi rêya bikaranîna zimanê kurdî ya agahîderan, di navbera filmên kurdî û muzîka kurdî da peywendiyeka çawa durist dibe? Agahîder, bi giştî ji bo filmên xwe muzîkên kîjan zimanî tercîh dikin? Bikaranîna muzîka bi kurdî wekî pratîkeka bikaranîna zimanê kurdî roleka çawa digêre di geşedana zimanê kurdî da?



Grafîk 18: Zimanên muzîkên filmên agahîderan (bi %)

Daneyên grafîk 18ê, bi beyanata agahîderan hatiye dariştin û bi nezereka giştî, meyla zorîneya agahîderan li ser muzîkên kurdî heye. Bi gotineka din, pitirê agahîderan bo filmên xwe muzîkên kurdî tercîh dikin. Li gorî vê yekê, 20 (%50) agahîderan jî bo filmên xwe **muzîka kurdî ya resen**, 5 (%13) agahîderan **muzîka kurdî ya adîsyonel**, 12 (%30) agahîderan beyan kiriye ku **bo filmên xwe muzîkê bi kar naînin**, 1 (%2) agahîderî **fransî**, 1 (%2) agahîderî **muzîka bêtelîf** (nehatiye beyankirin ka bi kîjan zimanî ye, lê di filmê da muzîka kurdî derbas dibe) û 1(%3) agahîderî jî beyan kiriye ku muzîk **li gorî çîroka filma wî diguhere**.



Grafîk 19: Li ser meydyaya civakî tercîhên agahîderan yê ziman ji bo danasîna kurtefilmên (bi %)

Aliyekî din yê bikaranîna pratîka zimanê kurdî ji aliyê agahîderan ve, tercîhên agahîderan yê zimanî ne ji bo danasîna kurtefilmên wan li ser platformên medyaya civakî. Ji bo têgihiştina temasa pratîk ya di navbera zimanê kurdî û agahîderan da, me xwest bizanin ka heta çî radeyê agahîder bi awayekî çalak di karûbarên xwe yê hunerî da zimanê kurdî bi kar tînin. Herwiha, em bizanin ka li ber kêleka zimanê kurdî kîjan zimanên din pitir têne bikaranîn. Lewma, bersivên vê pirsê eleqedar tabloyeka ciyawaz pêşkêşî me dike. Bi temamî 38 agahîderan bersiva vê pirsê dane. Li gorî bersivên agahîderan, rêjeya bikaranîna ziman/zimanan ji bo danasîna kurtefilmên xwe, herwekî ew bi xwe beyan dikin û li gorî rêjeya bikaranîna wan hatiye rêzkirin ku bi vî rengî ye: Ji 38 agahîderan, 13 (%34) agahîder **kurdî-tirkî**, 1 (%3) agahîder **îngilîzî-flemenkî-tirkî**, 1 (%3) agahîder **tirkî-kurdiya zazakî**, 14 (%37) agahîder **kurdî-îngilîzî**, 1(%3) agahîder kurdiya zazakî-tirkî-îngilîzî, 4 (%10) agahîder tirkî-îngilîzî, 1 (%3) agahîder **kurdî-tirkî-almanî-îngilîzî**, 2 (%5) agahîder **kurdî** û 1(%2) agahîder jî bi **tirkî** danasîna kurtefilmên xwe dike li ser platformên medyaya civakî.

3.4. Analîza Tematîk ya Kurtefilmên Nimûne

Di bin vî sernavî da, em ê behsa hevsengî û babeta kurtefilman, hevsengiya diyalogên kurdî û jêrenivîsên zimanê biyanî, bikaranîna zimanê kurdî wekî elementeka folklorî û bikaranîna zimanê kurdî wekî nîşaneyê afdiyeta polîtîk bikin.

3.4.1. Hevsengiya Ziman û Babeta Fîlman

Di çarçoveya hevsengiya ziman û babeta filman da me şeş kurtefilmên agahîderan tehlîl kirine. Li gorî zimanê filmên agahîderan, wekî filmên nîmûne me filma *Arîn* (Mizgîn Mûjde Arslan, 2017, kurdî-îngilîzî), *Mavera* (Veday Oyan, 2016, fransî-tirkî), *Bêziman* (Adar Bozbay, 2012, kurdî-tirkî), *Mast* (Tahsin Özmen, 2015, bêdiyalog), *Musa* (Serhat Karaaslan, 2012, tirkî) û *Hazirîyek Bo Derengmayîne* (Aram Dildar, 2018, kurdîya kurmancî) tehlîl kirine. Ev filmên nimûne, hem li gorî hevkeşeya zayenda agahîderan hem jî li gorî zimanê filman hatine hilbijartin.

Di van kurtefilmên navhatî da, di navbera babeta filmê, mekanê filmê û zimanê filmê da peywendiyeka rasterast durist bûye. Di kurtefilma *Arîn* da ku behsa çîroka malbateka kurd li Îngilîstanê dike, zimanê kurdî û îngilîzî cih girtiye. Bicihkirina zimanê îngilîzî di filma *Arîn* da, encama koçberiya kurdan e bo ewrûpayê. Bi merema pêkanîna peywendiya heqîqeta civakî û mekanî (Îngilîstan), wekî zimanê duyem yê filmê îngilîzî ligel zimanê kurdî hatiye bikaranîn. Fîlmeka din ya ku ji aliyê derhêner ve wekî filmeka kurdî hatiye pênasêkirin, *Mavera/Failî Meçhul* e. Vedat Oyan, peywendiya çêkirina erebeya Renault Torosê li Fransayê û encamên bikaranîn û fonksiyonên wê yê li Tirkîyeyê berawird dike û çîroka filma xwe *Maverayê* li ser vê berawirdiyê dihûne. Digel ku di vê filmê da kurdî nehatiye bikaranîn, ji ber ku peywendiya filmê ligel meseleya kurdî ya salên 1990î -failî meçhûlan- heye, li şûna zimanê kurdî, wekî ziman fransî-tirkî hatiye bikaranîn. Di *Maverayê* da, ji ber peywendiya şirketa Renault Torosê ya fransî û bikaranîna vê Torosê wekî temsîla failên meçhûl di salên 199î da li Tirkîyeyê, di filmê da tirkî hatiye bikaranîn.

Hindek kurtefilmên kurdî ji aliyê navên xwe ve, digel ku di van filman da du ziman hene, naveroka filmên xwe didine dest. Yek ji van kurtefilman jî *Bêziman* e ku çîroka filmê li ser nezanîna tirkî ya pîrejinekê hatiye hûnandin. Di filma *Bêziman* da, ji ber nezanîna tirkî ya

pîrejinê, wekî elementeka li dijî zimanê tirkî, zimanê kurdî hatiye bicihkirin. Çîroka filmê temsîla rewşa bikarneanîna zimanê kurdî ye li saziyên fermî yên li Tirkiyeyê.

Ne tenê di navbera bikaranîna ziman û babeta filman da, hemkat di navbera bikaraneanîna zimanê kurdî/bêdiyalogî û babeta hindêk filmên kurdî da jî hevterîbiyek heye. Kurtefilma *Mast*, ji bo vê yekê nimûneyeka balkêş e. *Mast*, behsa qedexeya guhdarîkirina muzîka kurdî di salên 1990î da li Cizîrê dike. Sebebê serekî yê bikarneanîna zimanê kurdî di vê filmê da, nîşaneyên qedexeya zimanê kurdî ya wan salan e. Lewma kurdî wekî zimanê karekteran nehatiye bikaranîn. Bikarneanîna zimanê kurdî, bi gotineka din qedexeya zimanê kurdî rasterast naveroka filma *Mastê* diyar kiriye.

Kurtefilmeka din ya ku peywendiya zimanê wê ligel naveroka wê heye, kurtefilma *Serhat Karaaslan* ya bi navê *Musa* ye. *Musa*, filmeka derhênerê kurd ya tirkî-ziman e. Di vê filmê da Musayê filmfiroş (Aram Dildar) gava ku li ser peyaboreka li Stenbolê filman difiroşe, Zeki Demirkubuz tê û daxwaza leyîstina wî di filma xwe da jê dike. Musayê ku li benda telefona Zeki Demirkubuz e, tê xapandin û li şûna wî yekî din dileyîze di filmê da. Filma ku bo Zeki Demirkubuz hatiye îthafkirin, bi zimanê tirkî û li Stenbolê derbas dibe. Hem mekanê filmê hem jî zimanê filmê du faktorên serekî ne di diyarbûna babeta vê filmê da. Lewma, çîroka ku li Stenbolê û li dor Zeki Demirkubuz tê vegêran ji bo hevahengiya filmê ya ligel rastiya civakî, tirkî wekî zimanê filmîk hatiye bicihkirin.

Kurtefilma *Hazirîyek bo Derengmayîne*, nimûneyeka baş e bo hevsengiya zimanê kurdî û babeta filmê. Aram Dildar, bi vê filma xwe da çîroka şofêrê teksiyê ya Selim (Salih Ekinci) vedigêre ku di nav zehmetiyên ekonomîk da dixwaze jiyana xwe çak bike. Filma ku zimanê wê bi temamî kurdî ye, li Batmanê derbas dibe. Dildar, bi bikaranîna muzîkên kurdî yên ciyawaz, rengêkî kurdî daye filma xwe. Hem bi muzîkan, hem bi mekanê filmê hem jî bi çîroka xwe, di navbera ziman û babeta filmê da hevsengiyeka berbiçav pêk hatiye.

3.4.2. Hevsengiya Diyalogên Kurdî û Jêrenivîsên Zimanên Biyanî

Girêdayî zêdebûna filmên kurdîziman, hewcedariya tercûmanîya zimanê kurdî bo zimanên wekî tirkî, îngilîzî û hwd. pêk hat. Hem festîvalên li Tirkiyeyê, hem jî festîvalên derveyî Tirkiyeyê ji bo baştir têgehiştina filmên kurdî, ji derhêneran daxwaza kopyayên filman yên bi

jêrenivîsên biyanî dikin. Ev daxwaza festîvalan, jêrenivîsa zimanên biyanî li ser derhêneran ferz dike. Di vê çarçoveyê da diyalogên filmên kurdîziman bo zimanên din têne tercûmekirin û jêrenivîsên biyanî tên danîn. Di kurtefilmên kurdî da zor caran diyalogên kurdî û tercûmeya jêrenivîsên zimanê biyanî ji hev nagirin û ev yek ji muşkîleya hevahengiya diyalogên zimanê filmê û tercûmeya jêrenivîsan der dibe. Neahengiya diyalogên filmên kurdîziman û tercûmeya jêrenivîsên zimanên biyanî, hem ji ber ne-şarezatiya hindêk derhênerên kurd yê derbarê şiyânên zimanê kurdî da hem jî ji ber ne-pisporiya tercûmaniya kurdî pêk tê. Hevsengiya diyalogên kurdî û jêrenivîsên zimanî li gorî kategoriyên sansûrkirina diyalogên kurdî bi rêya jêrenivîsê û tercûmeya xelet ya ji kurdî bo zimanê biyanî, hatiye dabeşkirin. Di çarçoveya diyalogên kurdî û jêrenivîsên zimanê biyanî da kurtefilmên *Hêk* (Muaz Güneş, 2016) û *Hazirîyek bo Derengmayîne* ji ber sansûra zimanî; *Bêdeng* (Rezan Yeşilbaş, 2012) û *Guneh* (Muhammed Seyyid Yıldız, 2017) ji ber neahengiya diyalogên kurdî û jêrenivîsên zimanê biyanî, hatine hilibjartin. Wekî jêrenivîsa biyanî ya van filman tirkî hatiye hilibjartin.

Di filmên *Hêk* û *Hazirîyek bo Derengmayîne* da, me'neyên hevok û gotinên zimanê jêder (kaynak dil-kurdî) gava bo zimanê wergir (tercûme edilen dil- tirkî) tê tercûmekirin -dibe ku teserrûfa derhênerî yan jî xeletiya tercûmanî be- sansûreka zimanî heye. Ev sansûr yan jî otosansûr, zor caran ji bo veşartina dijûn û gotinên xirab tê kirin. Bo nimûne di filma *Hêkê* da, gava ku dayîka (Adule Gündüz) Ali (Ömer Çelik) lê dixê, dijûnan lê dike. Ev dijûna kurdî “*kurrê babê qehbmezî, erê welleh*” wekî “*babanın başını yesin hediye!*” hatiye tercûmekirin. Ku ev hevoka bo tirkî hafî tercûmekirin ji qaliba kurdî ya “*bila diyariya babê te serê te bixwe*” hatiye qerzkirin. Diyar e, şiyana tercûmanî ya kurdî zaltir e nisbet bi şiyana tirkî, ku ev yek wekî termeka sosyolenguîstîkê wekî *duzîmaniya zal* tê binavkirin (Öpengin, 2011: 212). Dîsa, di sehneyeka dûmahika filmê da, birayê Ali, Hasan (Mevlüt Kulat) xeber û dijûnekê lê dike û dibêjê “*ez te bigrim, ez ê kutme te de, hêdee...*”. Ev dijûn wekî “*seni bir yakalarsam kafanı kıracağım.*” (*destê min ji te bigire, ez ê serê te bişkînim*) hatiye tercûmekirin. Di filma *Hazirîyek bo Derengmayîne* da jî em dijûn/xebereka bi vî rengî dibînin ku bi rêya tercûmeya tirkî hatiye sansûrkirin. Di filma *Hazirîyek bo Derengmayîne* da, wextê ku Selim (Salih Ekinci) teksiya xwe bo te'mîrkirinê dibe servîsê, te'mîrkar (Serdar Biçimli) derbarê bikaranîna xirab ya teksiyê da bo Selim dibêje “*Selîm, te kiriye vê erebê law!*”. Ev hevoka argoyê ku ji aliyê semantîka kurmancî ve teqabûlî dijûnekê dike, bi tercûmeya tirkî ya “*sen resmen içine etmişsin bu arabanın.*” (*te bi*

'erebeyê mîz kiriye) hatiye sansûrkin. Ev tercûmeya bo tirkî hatî kirin, ji xeletiyeka tercûmeyê zêdetir wekî teserrûfa derhênerî diyar dike.

Neahengiya diyalogên kurdî û jêrenivîsên biyanî ne tenê bi rêya sansûrkinê, di heman demê da bi rêya diyalogên kurdî yên “xelet” û tercûmeya van diyalogan bo zimanê biyanî jî hatine kirin. Kurtefilmên *Bêdeng* û *Guneh* ji bo vê yekê dibin du nimûne, ku ev yek di heman demê da bi şiyana axiftina karekteran ve girêdayî ye. Di van her du filman da jî karekterên ku bi kurdiyeka “şikestî”²⁰ diaxivin, karekterên jin in. Di filma *Bêdeng* da, hem ji ber ne-pisporiya derhênerî û hem jî ne-şarezahiya karektera Belçim Bilginê ya derbarê kurdî da, diyalogeka xelet pêk hatiye û ev diyalog di tercûmeya tirkî da bi rengekî cuda derdikeve pêş. Beriya ku Belçim Bilgin biçe zindana Diyarbekirê bo serdana mêrê xwe yê zindanî, dibêje “...ez nizanim ewê çawa bibe. Gerek ez tiştêk bînim jê ra. Car car dibêjim ewê jî derbas bibe yek roj”. Ji ber ku mêrê Belçim Bilginê di zindanê da ye, li şûna ku bibêje ez ê jê ra “tiştêkî bibem”, dibêje “tiştêkî bînim”. Jixwe di tercûmeya tirkî ya vê diyalogê da wisa hatiye nivîsîn ku neahengiya di navbera diyaloga kurdî û jêrenivîsa tirkî da destnîşan dike. Diyaloga tirkî bi vî rengî hatiye tercûmekirin: “... ona birşeyler götürmem lazım” (... divê ez tiştêkî jê ra bibem).

Fîlmeka din ya ku neahengiyek heye di navbera diyalogên kurdî û jêrenivîsên tirkî da, filma *Guman* e. Di vê filmê da, bi giştî her sê karekter, bi taybet karektera jin Gulê (Şükran Aktî) bi kurdiyeka şikestî diaxivin û ev kurdiya şikestî zor caran li jêrenivîsên tirkî nayê û ji aliyê semantîka herdu zimanan ve muşkîleyekê durist dike. Bo nimûne, Gulê gava ku behsa plana xwe ya çûna bo ewrûpayê dike, dibêje “... gava ku em derbasî awrûpayê bûn, em ê her tiştî bêxin rêya xwe”. Ev hevoka ku ji hiş û mantiqeka tirkî hatiye qerzkin, di nav sentaksa kurdî da hatiye bicihkirin û bûye sebebê têkçûna me'neya hevoka kurdî. Gava ev hevoka kurdî ligel tercûmeya jêrenivîsa wê ya tirkî tê berawirdkirin, bicihbûna hiş û mantiqa tirkî di nav sentaksa kurdî da zêdetir diyar dibe. Çunkî wisan diyar e ku ev hevoka kurdî ya li jorê ji vê hevoka tirkî hatiye dariştin: “Avrupa'ya geçtiğimizde her şeyi yoluna koyarız”. Ne tenê karektera Gulê, herwiha karekterê Alan (Eyüp Kan) jî bi heman kurdiya şikestî diaxive. Gava ku Alan behsa serdegirtina polîsan dike, derbarê guleberdana polîsan da viha dibêje: “Ez û welat li pêş bûn, dema vekirina deriyê duyem agir berdan”. Alan, li şûna ku bixwaze bibêje polîsan “gule/fişek berdane me”,

²⁰. Qesta me ji “kurdiya şikestî”, axiftina kurdî ya dûrî fonetîka kurdî ye.

dibêje ku “agir berdane me”, ku ev mantiq ji “ateş açtılar”a tirkî hatiye wergirtin û di nav diyaloga kurdî da hatiye bicihkirin. Ev qerzkirina mantiqa tirkî, encamên zalbûna zimanê tirkî ye li ser kurdî.

3.4.3. Bikaranîna Zimanê Kurdî Wekî Elementeka Folklorî

Pênaseya têgeha *folklorîzekirinê*, ku hem wekî têgeheka sosyolenguîstîkê hem jî wekî têgeheka lêkolînê çandî tê bikaranîn, mirov dikare wekî “pêşxistina bi tenê layenên folklorî yên çandekê; nimandina çandekê wek objeyeke mûzexaneyê, ne wek çandekê xwedanê tradîsyon û realîteyeke civakî û tarîxî” (Öpengin, 2011: 213) pênase bike. Bi gotineka din mîstîfeyekirina aliyên çandekê û veşartina sînorên polîtîk û tarîxî yên wê çandê ye. Di vê çarçoveyê da, zimanê kurdî di çendîn kurtefilmên kurdî da, bi rêya muzîkê ji aliyê derhêneran ve hatiye folklorîzekirin ku mirov dikare vê kiryarê wekî “oto-folklorîzasyon” pênase bike. Girêdayî tecrûbe û boçûnên derhênerên kurd yên zimanê kurdî, bikaranîna zimanê kurdî bi formeka muzîkî di filman, dibe sebebê berevajîbûna boçûna wan ya zimanê kurdî. Lewma di hindek kurtefilmên kurdî da bikaranîna zimanê kurdî bi rêya muzîkê bêfonksiyonel xuya dibe û di navbera babeta filman û muzîka filmê da çî peywendî durist nabe. Me ev mînaqêşeya folklorîzekirina zimanê kurdî, bi gotineka din, bikaranîna zimanê kurdî wekî elementeka folklorî, li ser kurtefilmên *Biyani* (Eylem Onat û Helin Yıldırım, 2016) û *Zarokên Mirî* (Bilal Çakay, 2012) ra tehlîl kir.

Girêdayî geşedanên sosyo-polîtîk yên li Tirkiyeyê, bilindbûna populerîte û rewaca zimanê kurdî, bû wesîleya bikaranîna zimanê kurdî li ser platformên medyaya civakî. Bi taybet ji aliyê nîfşê nû/ciwan yê sînemakarên kurd ve bû wesîleya bikaranîna kurdî di sînemaya kurdî da. Digel ku di navbera gotinên muzîka filmê û babeta filmê da çî peywendî nebe jî, hin caran, bes ji bo bikaranîna zimanê kurdî derhêneran cih dane muzîkên folklorî yên kurdî. Bikaranîna muzîkên folklorî yên bi zimanê kurdî ji aliyê hindek derhênerên kurd ve bi armanca kurdîfîyekirina filmên xwe, wekî tercîheka aîdiyeta nasnameyî derdikeve pêş. Bes, ev tercîh zor caran ji merema nîşandan û îqamekirina zimanê kurdî zêdetir -bêyî ku haya van derhêneran jê hebe- dibe sedem ku zimanê kurdî wekî parçeyeka folklorî û mîstîk bê nîşandan.

Xala muşterek ya kurtefilmên *Biyani* û *Zarokên Mirî* ew e ku çîroka her du filman li ser bûyerên polîtîk yên li Tirkiyeyê hatine raçandin û bêyî ku di navbera van bûyerên aktuel/polîtîk û muzîka filman da peywendiyek durist bibe, bi armanca nîşandan û kurdîfîyekirina zimanê kurdî li ser muzîka dengbêjî/folklorî ya kurdî ra, zimanê kurdî di filman da hatiye îqamekirin. Bo nimûne,

di filma *Biyani* da -ku behsa qedexeya derketina kolanan dike- bêyî ku muzîka filmê wekî parçeyeka filmîk bête îqamekirin û bi babeta filmê ve bête eleqedarkirin, muzîka dengbêjiyê ya Fatma Îsa *Lo Lo Miho* di hengameya şer û pevçûnê da têtê guhdarîkirin û nostaljiyek bo Radyoya Yerîvanê têtê avakirin. Bes gava paşxaneya kurdî ya tebi'î ya derhênerên filmê û bicihkirina muzîka dengbêjiya kurdî têtê raçavkirin, neahengiya babeta filmîk û zimanê kurdî derdikeve pêş. Ev bikaranîna zimanê kurdî a wekî folklorîzekirina zimanê kurdî bi rêya muzîka dengbêjiyê, di filmê da hatiye îqamekirin. Bi gotineka din, zimanê kurdî ji muzîka filmê zêdetir, wekî elementeka folklorî hatiye pêşkêşkirin.

Kurtefilmeka din ya ku zimanê kurdî wekî elementeka folklorî hatiye bikaranîn, kurtefilma Bilal Çakay ya bi navê *Zarokên Mirî* ye. Tevî ku ev kurtefilm çîrokeka zor polîtîk ya şerê li Tirkîyeyê vedigêre, ji aliyê Wezaretê Çandê ve hatiye finanskirin. Dîsa bi heman awayî, ji bo kurdîfîyekirina kurtefilma xwe derhênerî cih daye bikaranîna strana dengbêjiyê ya Fadilê Cizîrî ya bi navê *Heyran Jaro*. Derhênerî, di despêka filma xwe da, bêyî ku peywendiyeka rasterast girê bide di navbera babeta filmê û vê muzîka stranbêjiyê da; qismen jî ji ber meşhûrbûn û dramatikbûna wê, bi rêya muzîka dengbêjiyê zimanê kurdî wekî elementeka folklorî pêşkêş kiriye.

3.4.4. Bikaranîna Zimanê Kurdî Wekî Nîşaneyê Aîdiyeteka Polîtîk

Ji ber peywendiya polîtîk ya çand û zimanê kurdî, zorîneya kurtefilmên kurdîziman bi nezereka “polîtîk” û armanca nîşandana çand û zimanê kurdî hatine berhemînan. Lewma zor caran çîrok û babeta van kurtefilmên kurdîziman li ser vê bingehe tên raçandin. Ligel vê yekê, carinan jî babeta hindê kurtefilmên kurdîziman li ser rewşa zimanê kurdî ya tarîxî û aktuel têtê raçandin. Di van kurtefilman da, babet û armanca serekî ya filman dibe nîşandana rewş û statûya zimanê kurdî li qadên civakî û fermî. Ev nîşandan û jinûve-avakirina rewşa zimanê kurdî bi rêya sînemayê, bi paşxaneya hizrî ya derhêneran ve girêdayî ye û bikaranîna zimanê kurdî di van kurtefilman da wekî aîdiyeta polîtîk ya derhêneran derdikeve pêş. Di vê çarçoveyê da, ji bo bikaranîna zimanê kurdî wekî nîşaneyê aîdiyeteka polîtîk ya derhêneran, em ê kurtefilmên *Bêdeng* (Rezan Yeşilbaş, 2012) û *Xewnerêşk* (Mustafa Yeşil, 2014) tehlîl bikin.

Herwekî li jorê hatiye beyankirin (bnr. grafîk 13), motîvasyonên bikaranîna zimanê kurdî ji aliyê derhêneran ve zêdetir bi endîşeyên kolektîf û polîtîk ve girêdayî ne. Bi gotineka din, bikaranîna zimanê kurdî di kurtefilman da carinan ji amrazekê zêdetir dibe armanca derhêneran

ku vegêrana çîroka filmê yan jî estetîka filmên kurdîziman di bin armanca derhêneran ya bikaranîna zimanê kurdî da difetise. Bo nimûne, kurtefilma *Xewnerêşkê* ya Mustafa Yeşil, ku çîroka filmê li ser xewna kesekî biyanî yê li welatekî kurdîziman hatiye raçandin, meseleya satatû û narehetiya hebûna zimanê kurdî li Tirkîyeyê pêşkêş dike. Di kurtefilma *Xewnerêşk* da, derhêner li karakterê xwe yê serekî (Kadir Demirörs) xewnekê dide dîtin ku li cihekî wisa dijî ku herkes kurdî diaxive û ev karakter xwe biyanî dihesibîne; gava tirkî diaxive kes jê fêhm nake û çî kes jî ji zimanê wî fêhm nake. Derhêner, girêdayî paşxaneyê xwe ya îdeolojîk, hewl dide ku statû û rewşa zimanê kurdî li Tirkîyeyê daxilî rojevê bike û bi rêya sînemayê statûya zimanê kurdî li Tirkîyeyê minaqeşe bike.

Salên 1980yî yê zindana Diyarbekirê, babeteka sînematîk ya hindêk filmên kurdî ye. Zorîneya van filman, zêdetir bi nezereka nîşandana polîtîkayên sext yê dewletê hatine berhemînan. Digel ku qedexeya axiftina zimanê kurdî li zindana Diyarbekirê encama van polîtîkayan bû, ev encam bûye babeta kêma filmên kurdî. Bes, kurtefilma *Bêdeng* ya Rezan Yeşilbaş yek ji wan kurtefilman e ku çîroka wê li ser qedexeya axiftina bi zimanê kurdî li zindana Diyarbekirê ya di salên 1980yî ye. Wekî gelek filmên kurdî yê din, *Bêdeng* jî mîsyon û armanca xwe ya şikandina *kodên polîtîk yê veşartina kurdîniyê* û nîşandan û avakirina tarîxa nêzîk ya kurdan heye. Girêdayî vê yekê, wekî kodeka polîtîk ya kurdîniyê qedexeya axiftina bi zimanê kurdî; derhêner bi destnîşankirina vê kodê di sînemayê da, hewl dide ku vê koda polîtîk ya veşartina kurdîniyê bişikîne. Bi rêya destnîşankirina qedexeya bikarneanîn/bikaranîna zimanê kurdî li Tirkîyeyê wekî yek ji kodên kurdîniyê di sînemayê da, dibe nîşaneyê aîdiyeta polîtîk ya derhênerê filmê.

ENCAM

Ji ber şert û mercên polîtîk û tarîxî yê Tirkîyeyê, nisbet bi sînemaya cîhanê, bi giştî sînemaya kurdî, bi taybet berhemînana kurtefilmên kurdîziman dereng dest pê kir. Tevî ku yekem kurtefilma kurdîziman û honakî li Tirkîyeyê di sala 1999an da hatibe berhemînan jî (Ax, Kazım Öz), hem bi veguherîna şert û mercên polîtîk û hem jî ji ber gihiştina nîfşekî nû yê perwerdebûyî di nav sînemakarên kurd da, hejmara kurtefilmên kurdîziman bi taybet piştî sala 2010an zêde dibin.

